Arşîva Bîra Kurdan: Ji Michel Verrier gotara bi serenavê "Şer derbasî Kurdistanê dibe" (1993) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Kanûn 2011 - Hejmar 25 www.lemonde-kurdi.com • info@lemonde-kurdi.com 24 Rûpel

Hoşeng Sebrî
Îsmet Serîf Wanlî jîyana xwe, xebat û karên xwe bi tevgera azadîya kurd ve girêdabû û heta koça xwe ya dawî bi dil û can bendewarê tekoşîna kurd û hemû parçeyên Kurdistanê bû…
▶ R. 2

Noëlle Burgi
Li Yewnanistanê, xemxwirîya ji bo siberojê herkesî dixe nav xumameke civakî û takekesî. Welatê xwedî dîrokeke qedîm, gelo dê çawa bikaribe xwe ji vê qeyrana aborî û alozîyê rizgar bike?
▶ R. 6

J. Burbank - F. Cooper
Em îro piştî hilweşîna împaratorîyan di serdema netewe-dewletan de ne ku hejmara wan ji dusedî zêdetir in. Lê dîsa jî netewe-dewlet îdealeke demên nû ye û siberoja wê jî nedîyar e…
▶ R. 10

Nina Bachkatov
Rûsya li namzetîya Putin ya ji bo hilbijartina serokatîyê ya adara 2012ê çawa dinêre? Putîn dilxwaz e ku hilbijartinan qezenc bike, lê belê îmaja wî ya mirovekî xurt hîn maye gelo?
▶ R. 14

Pierre Musso
Silvio Berlusconi neçar ma ku dev ji wezîfeyê berde; lê belê wî dîsa jî mohreke kûr li civakê xist. Gelo dê Îtalya bikaribe bi Mario Monti û planên kemerşidandinê birînên xwe bikewîne?
▶ R. 17

Dêrsim, komkujîyek li ser esasê nijadkujîyê ye

Hîmên îdeolojîk ên nîjadkujîya Dêrsimê

Mehmet Bayrak *

Da ku em bikaribin hîmên îdeolojîk ên nîjadkujîya (jenosîd) Dêrsimê, ku di salên 1937-38ê de pêk hatibû, rast binirxînin, divê em rewşa xas a Dêrsimê ya bi nasnameya Qizilbaş-Kurd, statuya wê ya nîv-xweser û awayê jîyana wê ya civakî bizanin.

Bi rastî jî, Dêrsim di wê demê de eyaleteke gelek berfireh bû, ku wîlayetên îro ên dora xwe jî dihewandin. Dêrsim heta naverasta sedsala 17emîn an ku heta ku di navbera osmanî û sefewîyan de peymana **Qesr-î Şirîn** hat girêdan, bi piranî bi ser safewîyan de bû. Piştî wê peymanê, ku çi bigire sînorên îro dîyar kiriye, Dêrsim bi giştî bi osmanîyan ve hatîye girêdan. Li dû vê pêvajoyê, Dêrsim bi nasnameya xwe ya Qizilbaş- Kurd heta serdemên nêzîk jî bi awayekî nîv-xweser jîyaye. Dêrsim, ku çendîn Ocaxên Kurd-Elewî di nav xwe de dihewîne, di çarçoveya vê tewra jîyanê de pirsgirêkên xwe li gor hiqûqa Qizilbaş/Elewî bi destê serekên xwe yên olî û siyasî çareser kirine.

Hîna ji destpêka salên 19emîn û pê ve îdareya osmanî, da ku Dêrsimê bi xwe ve girê bide, di fermandarîya sadrazam û seresker **Yusuf Ziyaeddin Paşayê Kor**, ku bi eslê xwe gurcî ye, bi ser Dêrsimê de kiryareke leşkerî da dest pê kirin û di şevekê de bi bêbextî serê gelek serokeşîran jê kirin û çendîn kesên din kuştin û gelek gund şewitandin.

Di serdemên dawîyê de jî li dij Dêrsimê harekat hatin bi rê ve birin û ev yek bû sedem ku di nîvê duyem a sedsala 19emîn de kurd û ermenî bi hev re xwe bi rêk bixin. Jixwe, paşê di 1864ê de bi pêşengîya rewşenbîrên kurd û ermenîyan, ku di nav wan de bavê Seyîd Riza, **Seyîd Îbrahîm** jî hebû, rêxistinek bi navê ***"Ji bo Rizgarîya Neteweyî Komîteya Ermenî û Kurd"*** hat damezirandin. Endamên lijneyê, ku daxwazên nîv-xweserîyê yên rêxistinê ragihandin ***Seraya li Stebolê***; li wê derê tên girtin, lê belê piştî du salan an ku di 1867ê de tên berdan.

Piştî wê, îdareyên osmanî û Îttîhad-Terakkî digel kemalîstan da ku Dêrsimê "te'dib" (bi edep/terbîye kirin) bikin û bînin rê, gelek rê û metod bi kar anîn. Bi pêşengîya birêvebirina ***Îttîhad û Terakkîyê***, ku hema bi giştî ji "tirkperestên" ji Balkanan û Qafqasan pêk dihatin, ji sala 1912ê û pê ve harekateke ***"Paqijîya nijadî-olî, yektîpkirin û tirk-musulmankirinê"*** hat dest pê kirin û piştî qirkirina mezin a ermenî û suryanîyan a sala 1915ê, di 1921ê de bi ser Koçgîrîyê re wan berê xwe da Dêrsimê. Jixwe, cihê ku jê re Koçgîrî dihat gotin di rastîyê de Dêrsima Rojava bû.

Mustafa Kemal: Min kurd bi lepekî hesinî perçiqandin. Min 60 serokên wan ber destê sibê bi carekê de bi dar ve kirin

Bi Peymana Lozanê re paqijîya nijadî-olî bêhtir li ser rûman hat zêde kirin; kurdan dît ku di siyaseta red û înkarê de dor tê wan, bi pêşengîya ***Rêxistina Azadî ya Kurdanê*** dest bi birêxistinkirina tevgereke berxwedanê kir. Rojnameyên îdareya kemalîst, ku Peymanê Lozanê îmze kiribû û mubadeleya rûman pêk anî bû, cih didan gef û sloganên tahrîkkar ên wekî *"li wî cihê ku sungîyên tirkan dîyar dibin, kurdîtî bi dawî dibe"*. Jixwe, destûra sala 1924ê, berevajî ya sala 1921ê "tirkbûn û îslambûn" dida pêş. Belê, di rewşeke weha de, di 1925ê de, ji ber serhildana pêşwext, hejmara kurdên qetlkirî gihîştibû 15 hezaran.

Mustafa Kemal, di 1926ê de ji hunermend û rojnamegera swîsreyî **Emile Hüderbrand** re weha peyivîbû: *"Di rabihurîyê de di gelek rewşan de li Kurdistanê û warên din ên Anatolyayê dema meyleke li dij komarê rû dida, min ew bi **lepekî hesinî** diperçiqandin. Wekî mînak, carekê min şêst serokên wan ber destê sibê bi carekê da bi dar ve kirin. Van unsuran (kurd) dersa xwe stendiye û careke din nikarin li hember min serê xwe rakin."*

▶ R. 3

Almanya: 4,50 €
Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda: 5,00 €
Brîtanya: 4 £, **Danîmarka:** 40 DKK, **Norweç:** 40 NOK,
Swêd: 50 SEK, **Swîsre:** 6,50 CHF, **Tirkiye:** 7 TL

Îraq: Serbest, serwer û rageşî

Piştî dagîrkirina neh salan DYA welatekî çawa li paş xwe dihêle?

Birgit Cerha

Lêşkerên Amerîka yên dawîyê dê bi serbilindî ji sînoran derbas bibin, şanaz li ser serfirazîya xwe… hewldanên leşkerî yên DYAyê dê bi vî awayî li Îraqê bi dawî bibin."

Serokê DYAyê Obama bi serokwezîrê Îraqê **Malikî** re, vekişandina dawî ya hêzên dagîrker ên DYA ji Îraqê wek "serfirazî" rave dike û desthilatdarên li qiraxa Dîjleyê xwe bi şanazî wek "rizgarker"ê serwerîya Îraqê berpêş dikin.

Lê tiştê ku her du serok dixwazin bidin zanîn, ne rast e. Ji ber ku Malikî ku ji alîyê siyaseta hundir ve li ser zemînên lerzîn e, nikare hebûna hêzên leşkerî yên DYAyê ji roja kifşkirî ya 31ê Kanûna 2011ê, tarîxa ku bi kevneserokê DYAyê **Bush** re di 2008ê de li hev hatibû wêdetir, di parlamentoyê de dirêj bike; hêza super hebûna xwe di vê dewleta petrolê de ya ku ji alîyê stratejîk ve gelek girîng e, piçkole dike. Çend sed leşker dê bimînin da ku balyozxaneya DYAyê li Bexdayê ya ku di hemû cîhanê de herî mezin e, ewle bikin –ev yek bi tena serê xwe serneketina amerîkîyan dide der ku goya ew Îraqê zexim dikin û ber bi ewlekarîyê ve dibin. Herwiha ji ber sedemên ewlekarîyê Washington plana xwe ya vekirina hejmareke konsolosxaneyan li wî welatî rakir û peyva baregehên leşkerî ku bi salan e li ser hewldan dihatin kirin, hew tê zimên. Çend sed û -ne wek hêvî dihat kirin bi hezaran- şêwirmendên leşkerî û ewlekarîyê- divê hîn di diwarojê de jî, li tenişta yekîneyên îraqî alîkar bin.

Xewnên berzefir ên qêrîna şer ku **Bush** 2003yê li dijî diktatorê îraqî **Sedam** derdixistin, belawela bûn: Divê "Swîsreyeke Rojhilat" a nû ji Îraqa ku ji despotekî herî xwînxwar ê sedsala çû hatiye rizgar kirin, çêbibûya. Divê pîrozîyên demokrasîyê xwe "wek alava qeselê" ji perava Ferat û Dîjleyê ber bi hemû Rojhilatê Navîn ve belav bikirana. Piştî heşt salan derket holê ku ev dîtin leylan in. Rastîya jîyanê dihêle ku tirsa pêşketineke dijber serdest be. Ji alîyekî "bihara erebî" bê ku di bin tesîra bûyerên li Îraqê diqewimîn, bimîne dîktatorên Afrîkaya Bakur paqij dike û yên

▶ R. 4

Yehya Al Selo: **Dîlana kurdî**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 60 x 40 cm

EDITO

Cûntayên sîvîl

Serge Halimi

Bi bikaranîna şantaja îflasê û tirsa buhranê, du bankavanên berê **Lucas Papademos** û **Mario Montî**, berî çendekê li Atîna û Romayê desthilatê girtin ser xwe. Ew ne "teknîsyenên" apolîtîk, berevajî, du zilamên rastê û endamên *Komîsyona Sêber* in û vê komîsyonê bi tengezarîya xwe ya ji zêdebûna demokrasîya di nav civakên rojavayê navûdeng daye.

Di meha mijdarê ya dawî de, gava ku serokwezîrê yewnan **George Papandreou** da zanîn ku ew ê li welatê xwe referandûmekê pêk bîne, "gerînendeyîya" fransî-alman a Yekîtîya Ewropî, Bankaya Navendî ya Ewropî û Fona Pereyan a Navneteweyî -"***troïka***"- hêrs û acizîya xwe dane der. Li gor wan vê yekê dê peymaneke berî mehekê pêkhatî, bixista ber lêpirsînê; vê peymanê şidandineke nû siyaseta aborîyê ya serî li Yewnanîstanê tewandî pêş didît. **Papendreou** tevî ku bo Cannesê hatibû vexwendin jî, -welatê wî yê pir biçûk ê di nav du civînên bilind de-, nikaribû beşdar bibe û li oda payînê dihat rawestandin; li ber çavên herkesî **Angela Merkel** û **Nikolas Sarkozy** ên ku ew bi xwe jî hev-berpirsîyarên dijwarbûna buhranê bûn rûmeta wî şikandin. Ew neçar ma dev ji lidarxistina referandûmê berde û bi xwe jî îstîfa bike. Xelefê wî, alîkarê berê yê serokê Bankaya Navendî ya Ewropî, yekser kete nav hewldana berfirehkirina hukûmetê bi tevlîkirina partîya rastgir a tundrew a ku ji dema hilweşîna deshilatîya albayan, 1974ê û vir ve deshilatdarî lê hatibû qedexe kirin. Û "***troïka***" li hemberî vê yekê qet nakeve nav heyecaneke taybet.

Projeya ewropî diviyabû xweşî û rihetî bianîya; li dewletên ku berê ji alîyê cûntayên eskerî ve (Yewnanistan, Spanya, Portugal) hatibûn bi rê ve birin, demokrasî xurt bikira û pêşî li "netewperestên ku bûn sedemê şer" bigirta. Lê belê em dibînin ku projeya ewropî berevajîya wan armancan bi encam dibe: Giranîyê dide tesfiyebûna dijberan, hukûmetan vediguherîne

▶ R. 3

www.lemonde-kurdi.org
arşîva kurdî

Îsmet Şerîf Wanlî…

HOŞENG SEBRÎ *

Di roja 9ê mijdara 2011ê de heval û dostê hêja, rewşenbîr, xebatkar, nivîskar û ronakbîr **Îsmet Şerif Wanlî** çû ser dilovanîya xwe. Helbet cangorîya wî ji bo malbata wî, heval û dostên wî û ji bo tevahîya civaka kurd zîyaneke dilêşîyê ye.

Îsmet Şerîf Wanlî jîyana xwe, xebat û karên xwe bi tevgera azadîya kurd ve girêdabû û heta koça xwe ya dawî bendewarê tekoşîna kurd û Kurdistanê bû. Ew bi dil û can ket nav tevgera neteweyî û kar û xebatên xwe ji bo hemû parçeyên Kurdistanê kir. **Îsmet** di sala 1924ê de li taxa kurdan ya li bajarê Şamê hat dunyayê. Navê bavê wî Mihemed Şerîf Wanlî û navê diya wî Xeyrîye Alereşî ye. Kalê wî Şerîf di dawîya sedsala 19ê de ji gundê Zîrik ya ku li ser gola Wanê ye, tê Şamê û li wê derê bi cîh dibe.

Di sala 1944ê de xwendina dibistanê tewa dike û di sala 1946ê de li gel Dr. Nûredîn Zaza li Beyrûdê du salan xwendina zanistîyên siyasî bi dawî tîne. Di xortanîya xwe de li Şamê bûbû endamê ***Lijneya Kurdistanê***. Di warê çand û sporê de têkilîyên xwe ligel welatparêzên kurd ên mîna **Celadet Elî Bedirxan, Osman Sebrî, Memduh Selîm Beg, Qedrî Cemîl Paşa** û **Ekrem Cemîl Paşa** xurt kirin.

Di sala 1948ê de diçe Swisreyê û li bajarê Lozanê dest bi xwendina hiqûqê dike; xwendina xwe di sala 1952yê de diqedîne. Piştre xwendina zanistên siyasî dimeşîne û dikeve nav tevgera kurd, sala 1970yê nişana doktorayê werdigire.

Sala 1957ê **Komeleya Xwendekarên Kurd li Ewropayê** (KSSE) bi xebat û pêşengîya Dr. Zaza tê damezirandin û Îsmet Şerîf wek serokê yekemîn tê hilbijartin. Wek serokê komeleyê Îsmet çalak û jêhatî bû, wî pêwendîyên komeleyê digel gelek welat, komel û alîyên siyasî xurt kirin.

Ji sala 1958ê ta 1961ê di ***Zanîngeha Sorbonê*** de wek mamosteyê dersa ***Şaristanîya Kurdistanê*** xebitî. Sala 1953yê li bajarê Lozanê bi hevala xwe **Karmen** re zewicî û sala 1957ê kurê wî Sîyamend hat dunyayê.

Piştî rabûna şoreşa Îlonê di sala1961ê de, di bin serokatîya nemir **Mistefa Barzanî** de, **Îsmet Şerîf** ***Komîteya Parastina Mafên Gelê Kurd*** damezirand û bi navê nûnerê Mistefa Barzanî pêwendîyên siyasî bi gelek dewlet û partîyan re danî.

Di navbera salên 1960 û 1975ê de **Îsmet Şerîf** beşdarî gelek kongre, civînên siyasî û çandî bû û pirsa gelê kurd hem pêşkeş kir û hem jî parast. Sala 1975ê mêrkujên **Sedam Huseyn** hewl dan Îsmet Şerîf li mala wî bikujin û du gule berdan serê wî, lê ew hewildan bi ser neket û **Îsmet Şerîf Wanlî** ji mirinê filitî. Sala 1999ê Îsmet Şerîf wek serokê ***Kongreya Netewî ya Kurdistanê*** (KNK) hat hilbijartin û vê xebatê heta sala 2004ê berdewam kir, di sala 2004ê de xwe jê vekişand.

Di van salên dawîyê de têkilîyên Îsmet Şerîf digel partîyên kurd kêm bûn. Îsmet Şerîf di sala 2005ê de bîranên xwe bi kurtî nivîsiye û xwestiye ku ew piştî mirina wî bên belavkirin.

Bi Mamoste Îsmet re dostanîyeke me ya dûredirêj hebû. Ew li hember dostên xwe gelek rêzdar bû, çawa rûmet dida azadîya xebat û ramana xwe, herwiha rêza azadîya ramana kesên din jî digirt. Bi dost û hevalên xwe yên kurd re nediket dijberîyên siyaseta rojane; sînorê dostanîyê, hevaltîyê û siyaseta rojane baş dest nîşan dikir. Di kîjan rêxistinê de bixebitiya, kîjan ramanê biparasta û xwedîyê çi helwêsta siyasî bûya, dîsa jî, helwêsta xwe nedixist pêşîya dostanîyê, ramana xwe nedida ber dostên xwe û hewl nedida ku wan bibe ser ramana xwe. Rêz û rûmeta ramanên cuda, helwestên cuda digirt. Di pirsa kurdewarîyê de ji ramanên xwe tawîz nedida, lê ji dostên xwe jî tiştekî wiha hêvî nedikir. Li hember dijminên xwe hertim serbilind û piştrast bû, ji ramana xwe gav bi paş ve nediavêt, ji bo mafên rojane siyaset û dîplomasîya guhêrbar nedikir. Siyasetmedar û dîplometekî nazenîn bû, lê di pirsa netewî de helwêsta xwe ya stratejîk ya ***serxwebûna Kurdistanê*** li ser her tiştî digirt; di siyaset û dîplomasîyê de nediket hesabên piçûk û rojane.

Ne bi tenê di dostanîya xwe ya şexsî de durist bû, herwiha li hember hevalên xwe yên hevxebatên sazî û dezgehan jî vekirî bû, rûmet dida zelalîya têkilîyan, gotina xwe li meydanê digot, gava bixwasta ji kesekî re tiştekî bibêje, xwe nedispart quncikên nepend.

Em ji alîyê dostanîyê ve bê Îsmet hejartir in, siyaset û zanistîya kurdî bê Wanlî ziwatir e. Ew li Ewropayê yek ji arîstokratên kurd ê dema berê bû, mîna ***Kamûran Bedirxan, Tewfîq Wehbî, Nûredîn Zaza, Hemreş Reşo*** û hin kesên ku hîn li jîyanê ne; mîna **Cemal Nebez**.

* Dostê Îsmet Şerîf Wanlî

JI ÇAPEMENÎYÊ

Tirkîye li Sûrîyeyê cihê xwe xweş dike

Rojnameya brîtanî ***The Guardian*** di 16ê sermawezê de gotarek li ser biryara rawestandina endametîya Sûrîyeyê ya ***Cem'ata Ereban*** û rista Tirkîyeyê weşand. Di gotarê de, ku ji alîyê **Simon Tisdall** ve hatiye nivîsandin, tê dîyar kirin ku *"Digel karbidestên Sûudî û piştgirîya aşkere ya melikê Urdunê ji bo raperînan,* ***Erdoğan*** *û wezîrê wî yê kar û barên derve* ***Ahmet Davutoğlu****, ku ev demeke dirêj e xwedî arezûyên serokatîya herêmî ne, weha xuya dike ku ji bo serdema* ***piştî-Esed*** *cihê xwe çêdikin."*

Rojname herweha balê dikişîne ser komployeke gumankirî ya Amerîkayê ji bo hilweşîna bi darê zorê ya rejîma Sûrîyeyê, sedema dijberîya ku niha Tirkîye li dij Sûrîyeyê nîşan dide, ew e ku Enqere dixwaze di vê krîzê de rola serokatîyê bilîze. Rojname wekî din gotinên serokwezîrê tirk **Erdoğan** ên li dij rejîma Sûrîyeyê bi bîr tîne ku Erdoğan, **Esed** bi gotinên "*xwe bi xwînê têr dike û li ser xwîn û zextê dahatûyek nikare were ava kirin"* tewanbar dikir.

Her weha, gotar dîyar dike, ku li dij welatên wekî Rûsya ku piştgirîya rejîma Sûrîyeyê dike, Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê jî di dijberîyê de piştgirîyê dide Tirkîyeyê, herçend Tirkîye û Amerîka di meseleyên pevçûna Îsraîl-Filistîn û şerê Iraqê de bi hev nekirin jî. Di dawîya gotarê de tê îdîa kirin, ku Tirkîyeyê berê xwe dayê Rojava û hevgira NATOyê ye û piranîya xelkê Sûrîyeyê, ku musulmanên sunnî ne, Tirkîye ji xwe re wekî modelekê dibînin.

Petrola Başûrê Kurdistanê

Rojnameya amerîkî ***The New York Times*** di 16ê sermawezê de ragihand ku cîgirê serokwezîrê Iraqê, ji nefta welêt berpirsîyar e, rexne li şirketa neftê ya amerîkî ya bi navê ***Exxon Mobil*** girt, ji ber ku wê şirketê digel Hikûmeta Herêmî ya Kurdistanê peymaneke lêgerîna neftê danîye. Rojname ji devê wezîrê enerjîyê yê Herêma Kurdistanê **Aştî Hewramî** radigihîne, ku destûr bo ***Exxon***ê hatiye dayîn ku li Kurdistanê li şeş cihan, li petrolê bigere. Şirove tê kirin ku ***Exxon*** guh nade gefên cezakirinê yên hikûmeta Iraqê, ji ber ku ew dizane ku projeyên wan ên din ên li seranserî welêt ji bo Iraqê gelek girîng in. Her weha, rojname balê dikişîne ser wê yekê; tevî gefan jî hikûmeta Iraqê heta niha serî li tu mueyyîdeyan nedaye.

Nûçe weha bi dawî tê: *"Amerîka û artêşa wê hewlê dide ku dijmintîya di navbera Kurdistan û hikûmeta navendî de bi dawî bîne. Leşkerên amerîkî di parastina sînorê navxweyî yê welêt de canê xwe dane. Fikar tê kirin ku piştî vekişîna Amerîkayê, tengezarîyên etnîkî dikarin seqemgîrîya li welêt xerab bikin."*

Gelo Erdogan ji ber Dêrsimê daxwaza lêborînê kir?

Piştî ku serokwezîrê tirk **Erdoğan** û serokê partîya muxalefetê ya sereke **Kılıçdaroğlu** ji ber kuştina bi hezaran kurdan li Dêrsimê di navbera 1936 û 1939ê de, avêtin hev dû û talîyê Erdoğan got: *"Heger hewce be ez dê li ser navê dewletê lêborînê bixwazim, û dixwazim jî."* Rojnameya ***The New York Times*** di 23ê sermawezê de piştî ku ew gotinên serokwezîrê tirk ragihandin, weha berdewam kir: *"Piştî daxuyanîya Erdoğan a li ser televîzyonê bi hezaran çalakvanên kurd hatin destgîr kirin, ku di nav wan de akademîsyen, nivîskar, parêzer, kesên navdar hene. Ev kes bi sûcên terorê tên tawanbar kirin û hikûmeta tirk dixwaze bi vî awayî hewlê bide ku serî bi raperîna kurdan derxe. Li Dêrsimê dora 14 hezar kurd di encama êrişên artêşê de hatibûn kuştin û navê bajêr niha bûye Tunceli."*

Erdogan û Mafên Mirovan Li Tirkîyeyê

Kovara navdar a amerîkî ***The Times*** vê mehê serokwezîrê tirk **Recep Tayyip** kir mijara berga xwe. ***The Times*** dîyar dike ku ji ber seredan û axaftinên xwe, Erdoğan di çavê ereban de bûye lehengek û weha dirêjahî pê dide: *"Rast e ku Erdoğan carna wekî otokratekî tevdigere, li dij raqîbên xwe yên siyasî bêrêzîyê dike, dijminên xwe dişîne zindanê û çapemenîyê diçewisîne. Gelek bisporên li Tirkîyeyê û li derveyî welêt guman dikin, ku li paş mebesta wî ya ji bo guherandina destûrê azwerîya wî heye, ku hêza hikûmeta xwe mezintir bike. Lê belê, li gor alîgirên wî ev tişt li hember serkeftinên wî ne tu tişt in. Tirkîye êdî welatekî demokratîk e, aborîya wê bi ser dikeve û di qada navneteweyî de pesnê wê tê dayîn. Li gor îslamîyên ereb Tirkîye isbata wî tiştî ye ku welatek dikare bêyî ku dev ji rehên xwe yên îslamî berde, bibe welatekî modern. Li gor hevdilên wî yên ewropî jî Tirkîye nîşan dide ku îslama siyasî ne dijmina modernîteyê ye."*

Sebaret bi mijara mafên mirovan ên li Tirkîyeyê jî kovara ***Financial Times*** di 26ê sermawezê de gotareke berfireh weşand. Kovar bi bîr dixe ku niha 76 rojnameger li Tirkîyeyê di zindanê de ne û ev hejmar ji ya Çînê jî bilindtir e û li Tirkîyeyê rojnameger bi sûcên terorê tên tewanbar kirin. Herweha 47 parêzer jî hatin girtin ku di nav wan de parêzerên serokê zindanîkirî yê PKKyê **Abdullah Öcalan** jî hene. Gotar weha berdewam dike: *"Her ku Edoğan pesnê reformên xwe dide, weha jî tundtir dibe. Wî şerê artêşê ya li dij PKKyê berfirehtir kir û bi hezaran hevdilên PKKyê jî da destgîr kirin."*

Gotar radigihîne ku hejmara destgîrkirên doza **KCK**yê gihiştiye 3.500 kesan û dibêje *"Qanûna li dij terorê ya Tirkîyeyê tije bi îfadeyên şolî ye, ku hin ji wan ne bi rêkûpêk in, hin ji wan jî tewş û nelirê ne."* Kovar wekî mînak tawanên li dij rojnamegerê kurd **Cengiz Doğan** nîşan dide, ku ji 2009ê û vir ve di girtîgehê de ye. Lê belê li dijî wî dozeke din hatiye vekirin ku **Doğan** di nîsana îsal de, an ku dema ku di zîndanê de bûye, di çalakîyeke PKKyê de cih girtiye.

Derbarê girtina akademîsyen **Büşra Ersanlı** de gotar dîyar dike, ku Ersanlı derbarê otonomîya ***Baskê*** de semîner dane endamên BDPyê, lê belê wezîrê karûbarên navxweyî yê tirk **İdris Naim**, pê bawer e ku xanim Ersanlı sûcdar e û di nav têkilîyên tarî de ye.

Gotar rexne li helwêsta cîhana rojava digire û weha bi dawî tê: *"Rojava guh nade binpêkirinên mafên mirovan ên li Tirkîyeyê. Di şûna wê de wekî modelekê ji bo* ***Bihara Ereban*** *pesnê Tirkîyeyê dide.* Balyozekî ewropî yê li Enqereyê dibêje *'Ewropa niha ketiye derdê xwe û ji bo ewlekarîya herêmî hewcedarîya Amerîkayê bi Tirkîyeyê heye.'* Ev yek barek e li ser milên tirkan, ku doza mafên xwe bikin- helbet heger karibin nekevin *zindanê."*

YEHYA AL SELO: **Dayîkek**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 80 x 120 cm

Le Monde diplomatique kurdî
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

Lijneya Weşanê
Murad Satik
Riza Dînç

Le Monde diplomatique kurdî

Redaksiyona Zimanî
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

Alîkarên vê hejmarê
Yado Ciwan
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

Revîzyona Wergeran
Feryal Guladawîya
Luqman Guldivê

Berpirsê Hunerî
Hasan Huseyîn Devecî

Designer
Fabio Biasio

Web Developer
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

ABONETÎ
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

Abonetiya Salane:
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

Le Monde diplomatique

Damezrîner
Hubert Beuve-Méry

Birêveberê giştî
Serge Halimi

Sernivîskar
Maurice Lemoine

Cîgirên Sernivîskarî
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

Birêveberê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.lemondediplomatique-kurdi.org

Hîmên îdeolojîk ên nîjadkujîya Dêrsimê (Dewama rûpela 1)

Li dû van daxuyanîyên Mustafa Kemal, kurdên ku ji vê siyasetê bêzar, gav avêtin, lê piştî ku li Agirî û Zîlanê têk çûn, li gor nûçeyên rojnameyên tirkî dora 30 hezaran kuştî dan.

Dor tê Dêrsimê...

Sîxur û rojnamegerê kemalîst **Naşit Hakkı Uluğ,** ku di sala 1927ê de digel serokên hin êl û eşîrên Dêrsimê daxuyanîyên li dij serhildana Tevgera Berxwedana Neteweyî ya Kurd a sala 1925ê daxuyanî derxistibûn, di sala 1931ê de rapor-pirtûkek bi navê ***"Derebeyi ve Dersim"*** weşand, ku jê pêjna jenosîda Dêrsimê dihat. Bi ***Bernameya Islahatê ya Şerqê*** re, ku di 1925ê de bi awayekî dizî hatibû amade kirin û dest bi bicihanîna wê hatibû kirin, îdareya kemalîst biryara 'tehçîz' kirina feodal, eşraf û axayên hevkar yên kurd yên qaşo li dij 'feodalîzmê' şer dikirin, da. Bêguman, ev yek xwedê giravî weha bû, sedema rastîn **"paqijîya nijadî-olî û tirk-musulmankirin"** bû.

Jixwe, **Qanûna Tuncelîyê**, ku di rê û rêbazên Qanûna Îskanê ya sala 1934ê û ***"Rapora Kurd"*** a sala 1935ê ya **Îsmet Paşa** (Îsmet Înönü) de hatibû derxistin, wekî destpêka qetlîameke li ser esasê nijadkujîyê bû. Serokwezîr Îsmet Paşa di rapora xwe de ji awayê rêxistina wîlayeta nû, ku dê bihata damezirandin, heta walî-paşayê bi rutbeya korgeneral dê wekî birêveber bihataya tayîn kirin, her tişt dîyar kiribû. Herweha, serjimarî û berhevkirina çekan, vekirina rêyên sewqîyatê û avakirina avahîyên mezin ên hikûmetê jî hatibûn plan kirin. Îsmet Paşa bawer dikir ku heger ew Erzîncan û Elezîzê nekin "Navenda Tirkîtîyê", dê "Kurdistan" bivê-nevê hebûya. Ji ber vê yekê divîya ku ev plan bi nepenî û lezgînî bihataya bi cih anîn.

Hemû giregirên tirk li ser jenosîda Dêrsîmê li hev dikin

Ji bilî vê rapora Îsmet Paşa, Fermandarîya Giştî ya Cendermeyan jî rapor-pirtûkek bi navê ***"Dêrsim"*** amade dike, 100 nusxeyan jê çap dike û dide kesên têkildar. Di vê rapor-pirtûkê de esasên hareketa leşkerî ya li dij Dêrsimê dihatin dîyar kirin, herweha agahî dihat dayîn ku piştî ketina Dêrsimê dê kîjan eşîr bihatana surgun kirin û li Rojava bihatana bi cih kirin. yek ji planên hareketên leşkerî, ku di bêrîka pirtûkê de ne, ji alîyê Mustafa Kemal ve hatibû xêz kirin û ev plan niha li Koşka Atatürk a li Trabzonê tê nîşan kirin.

Wezîrê Aborîyê yê wê demê **Celal Bayar** jî, di rapora xwe ya nepenî ya bi navê "Rapora Şerqê" de ku di 1936ê de amade kiribû, bin xêz dikir ku harekateke leşkerî mecbûrî ye, lê belê herweha divîyabû ku hin tedbîrên darayî bihatana girtin.

Di vê pêvajoyê de, M. Kemal bi daxuyanîyeke xwe ya sala 1936ê, nîşaneyên aşkere yên qetlîama Dêrsimê radigihandin, ku dê piştî salekê dest pê bikiriya: *"Heger di kar û barên me yên navxweyî de merheleyeke girîng hebe, ew jî pirsgirêka Dêrsimê ye. Da ku ev birîn, ev kunêra ku di nav welêt de ye, ji kokê de were jê kirin û paqij kirin, her tiştê ku hewce be, bi çi buhayî be bila bibe, divê were kirin û di vî warî de, ji ber girtina biryarên lezgîn, divê destûreke temam û giştî ji hikûmetê re bê dan."* (Binihêrin: Nurî Dêrsimî, ***Kürdistan Tarihinde Dersim*** [Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim], rûpel: 259)

Meyla Mustafa Kemal, ku Dêrsim wekî "kunêrek" didît, digihîje heta rapora nepenî a bi navê ***"Dersim"*** a Mufettîşê Mulkîyeyê **Hamdî Beg**, ku di 2yê sibata 1926ê de nivisîbû. Hamdî Beg di rapora xwe de bal dikişand ser wê yekê ku Dêrsim her ku diçe dibe kurd û digot: *"Dêrsim, ji bo hikûmeta komarê wekî kunêrekê ye; gelek hewce ye ku divê ev kunêr bê amelîyat kirin."*

Êdî, *"esasên islahkirina Dêrsimê"* hatibûn dîyar kirin û dema gavavêtinê hatibû. Muhasebe û lêkolînên hewce hatibûn kirin, çek hatibûn ber hev kirin. Avakirina avahîyên hewce yên hikûmetî hatin qedandin û rêyên sewqîyata leşkerî jî hatibûn vekirin. Qirar bû ku ev avahî ku di lêkirina wan de dêrsîmî xebitîbûn, divîya ew şareza bikirina, lê belê di şûna wê de bi ser wan de bombe barîyan. Yek ji bombekaran jî keçika manewî ya Atatürk, **Sabiha Gökçen** e, ku bi eslê xwe ermenî ye. Gökçen, digot ku wê texsîr nekiriye û li dij her hedefa ku dilivîya, bombe barandine. Baytar **Dr. Nûrî Dêrsîmî** jî, ku li ser navê Seyîd Riza nameyek ji bo Sekreterîya Giştî ya Cemîyeta Milletan şandibû, ku bingehê wê li Cenevreyê bû û wezaretên derve yên dewletên mezin, agahdar dikir ku di vê qetlîama bi bombe de gelek jin û keçên bê parastin hatine kuştin û doza alîkarîyê kiribû.

Ma haya Atatürk ji jenosîdê tunebû?

Dema ku qetlîamê hîna dom dikir, Nûrî Dêrsîmî di 14ê îlona 1937ê de derketibû Sûrîyeyê û li vê derê bi mohrên gelek serokeşîrên Dêrsimê serî li heman rêxistina navneteweyî û wezaretên derve yên dewletan dabû. Lê belê ne ji dezgehên navneteweyî, ne jî ji dewletên din tu alîkarî nehat. Bi ser de jî, Îngîltere wezareta tirkî agahdar dike ku herçend bangek weha gihîştîye ber destê wan jî, wan alîkarî neşandiye. Belkî jî encama vê xemsarîyê ye, ku Seyîd Riza û hevalên wî di 1937ê de berî seredana Atatürk ji bo Dêrsimê, tên îdam kirin. Di 1938ê de jî, digel hêzên herêmî bi beşdarbûna sê kolorduyên bi tehçîzata bêkêmanî û du tumenên siwarî qetlîam, ya rastî "qirkirin" tê pêk anîn.

Di vê qonaxê de û piştî wê, hemî rê û rêbazên leşkerî yên wekî **te'dib** (bi edeb kirin, anîna ser rê), **tenkîl** (cezakirin), **taqtîl** (qetlkirin), **tehcîr** (surgunkirin), **temdîn** (medenî kirin), **temsîl** (bişavtin) ve **tasfiye** (îmha kirin) hatin bi kar anîn.

Ne bi tenê qelemşorên kemalîst, herweha gelek dêrsimî îro hîna jî îddîa dikin ku "hayê Atatürk ji qetlîamê tunebû, yan jî Atatürk qetlîam daye rawestandin". Ev yek dereweke trajî-komîk e. Ji ber ku di beşa herî dijwar a qetlîamê de jî serokkomar M. Kemal û Serfermandarê Giştî yê artêşê **Mareşal Fevzi Çakmak** telgrafên pîrozbahîyê ji hevdu re şandine. Hevdem M. Kemal bi tenê 9 rojan berî mirina xwe, roja 1ê sermaweza 1938ê de, bi rêya serokwezîr Celal Bayar ev peyam şandibû Meclisê: *"Bûyerên heydûtîya komî ya li Tuncelîyê, ku demeke dirêj berdewam kir û car caran dijwartir dibû, wekî encama xebatên çarçoveya bernameyekê, di demeke kurt de ji holê hatin rakirin, bûyerên bi vî rengî êdî ketin nav dîrokê, nema dikarin rû bidin."*

Helwêsta serokwezîr Erdoğan û Kılıçdaroğlu

Piştî qetlîamê, Dêrsim veguherî tabûyekê û her nivîs, yan jî weşaneke min a li ser vê qetlîamê li Tirkîyeyê tûşî darizan û cezakirinan bû.

İhsan Sabri Çağlayangilê bi eslê xwe çerkez, di salên 1930ê de, dema ku li Malatyayê li Muxaberata Millî kar dikir, digel walî û fermandarê Tunceliyê **Korgeneral Abdullah Alpdoğan** an ku "Qesabê Dêrsimê" derdikeve gereke lêkolînê. Çağlayangil di dawîya salên 1980yê de di rojnameya **Güneş** de serpêhatîyên xwe weşandin û bi ***"Hejmara taybet a sala 50emîn"*** a kovara **Nokta** mijara Dêrsimê careke din hat rojevê û wê demê gelek kes mat mayî hiştin. Serokê niha yê CHPyê **Kemal Kılıçdaroğlu,** ku wê demê di burokrasîyê de dixebitî, divê yek ji wan kesên heyirî be, ku bi rojnamegerekî re digel Çağlayangil hevpeyvînek li dar xistibû û bi rêya nasekî me yê hevpar ji min çavkanî xwestibûn. Min jî wê demê, hemû çavkanîyên li ser Dêrsimê ku li ba min bûn, jê re şandibûn û di nav wan de rapora nepenî ya Fermandarîya Giştî ya Cendermeyan a bi navê ***"Rapora Dêrsimê"*** û pirtûka Nûrî Dêrsimî ya ***"Hatiratim [Bîranînên Min]"***, ku cara pêşîn li Swêdê hatibû çap kirin, jî hebûn.

Dema ku ew hîna cîgirê serokê grupa CHPyê bû, ji partîya wî **Onur Öymen** di axaftina xwe ya li parlamentoyê, Dêrsim anîbû rojevê û ev yek derbirîna zihnîyeteke "nîjadperest" bû, lê belê herweha pêşî li dubare nîqaşkirina vê bûyera trajîk vekir.

Bêbextîya Kılıçdaroğlu û daxwaza lêborînê ya Erdoğan

Piştî ku Kılıçdaroğlu wekî serokê giştî yê CHPê hat hilbijartin, îcar jî serokwezîr Erdoğan ev mijar anî rojevê û cara pêşîn bi lixwemukirhatina serokwezîrekî, dihat gotin, ku li Dêrsimê 50 hezar kes hatine qetl kirin. Mebesta serokwezîr çi dibe bila bibe, bêguman gelek girîng e, ku ev yek hat gotin. Lê belê daxuyanîya Kılıçdaroğlu, ku tê de digot *"Ez wê demê hîna nehatibûm dinyayê"* bêbextîyeke gelek mezin bû. Ji ber ku ez bi xwe şahidê têkilîya rasterast a Kılıçdaroğlu ya bi vê bûyêrê re me.

Helbet, têrê nake ku serokwezîr wekî şexsekî daxwaza lêbûrînê kir, lê dîsa jî girîng e. Lê belê, ev yek bi rastîyê re li hev nake ku serokwezîr berpirsiyarîya qetlîamê diavêje bi tenê stûyê yek ji serokên giştî yên CHPyê **İsmet İnönü**. Ji ber ku di wê demê de rejîmeke yekpartîyî serdest bû û wekî ku li jorê jî hat dîyar kirin, hemû birêveber di vê yekê de xwedîyê berpirsiyarîyê ne.

Lê belê, bûyer ev cara pêşîn e ku weha bi berfirehî tê rojeva raya giştî û ji niha û pê ve jî gotûbêjên li ser wê dê her berdewam bin. Ên wekî **Kamer Genç** ku ji berê de bi tirkbûna xwe serbilind bû û ji nişkan ve qala zazabûna xwe dike, ji şolîkirina armancan pê ve nikarin tiştekî tev li vê mijarê bikin. Komên zazaperest, ku pişta xwe didin serpêhatîyên yên wekî **Karerli Mehmet Efendi,** ku him berî û him jî piştî qetlîamê digel dewletê hevkarî kir û ji ber qetlîamê Baytar **Dr. Nûrî Dêrsimî** berpirsîyar digirin, bi zanebûn, yan bi nezanî dikevin davika dewletê.

Dema ku Nûrî Dêrsimî, piştî ewqas jan û travmayê, pirtûkên xwe dinivîsandin, dibe ku bi hestiyarî tevgerîya be û jixwe ev yek car caran ji alîyê rewşenbîrên kurd ve hat dîyar kirin. Lê belê, heger wî ev berhemên xwe nenivîsandibûna, dê îro li ser seruvena Dêrsimê di destê me de tu tiştekî nivîskî nebûya. Her weha ka çima xelet e ku wî li ser navê Seyîd Riza û serokên Dêrsimê, ku bi tu zimanekî rojavayî nedizanîn, serî li dezgehên navneteweyî daye?

Heger di vî warî de çavkanîyên din ên dîplomatîk hebin, ku me nekariye xwe bigihînînê, mumkin e ku ji arşîvên dewletê derkevin.

Girîng e ku arşîv bên vekirin

Lewma, karê pêşîn, ku divê bê kirin, vekirina arşîvan e. Da ku mijar bi her awayî derkeve holê, serokwezîr di şûna dubarekirina hin belgeyan de -ku berê hatine aşkere kirin-, divê arşîvan ji lêkolîneran re veke. Mirov ne lazim e bibe kahîn, da ku bizanibe ku di vî warî de arşîva herî dewlemend a Serfermandarîya Giştî ye. Ji ber ku em pê dizanin, ku sindoq tije bi defter û pirtûkên **Alîşêrê Koçgîrî**, ku di şikeftekê de hatibû qetl kirin, şandine Serfermandarîyê. Kesê ku vê yekê radigihîne jî **Jnd. Alb. Nazmi Sevgen** e, ku wî bixwe kuştina Alîşêr û jina wî **Zerîfe** organîze kiriye. Bawer dikim heger ev arşîv bên vekirin, wê ji gotinên sala 1937ê ya **İsmet Paşa** ku digot *"Me li Dêrsimê planeke îmhayê bi rê ve bir"* wêdetir, delîlên *"nijadkujîyekê "* derkevin holê. Ji ber ku bîlançoyên ku me berê weşandibûn û bîlançoya 13 hezar kesî ya qetlîamê ku serokwezîr ragihandibû, bîlançoya mehekê ya sala 1938ê ye...

Herweha, ne dijwar e ku mirov bîra wî tiştî bike ka rejîmeke weha, ku li hember civakeke bêçekkirî harekateke 'îmhayê' bi rê ve biriye û ber bi dawîya qetlîamê, bi 40 hezar leşkeran li Xarpêtê meşa pozbilindîyê kiriye, qirkirineke çawa pêk aniye...

Her weha, divê dost û neyar herkes pê bizanibin ku di nav wan kesan de, ku rêûresmê roja 31ê tebaxa 1938ê temaşe kiriye, ne bi tenê orgeneralên wekî **Fevzi Çakmak, Kazım Orbay, İzzettin Çalışlar, Fahreddin Altay,** herweha korgeneralên wekî **A. Alpdoğan û Ergüder** gelek tumgeneral hebûn. Wekî din digel **ateşeyên bejayî û hewayî yên îngîlîz, yûnan û bulgar, ateşeyên leşkerî yên sovyet, fransiz, îtalyan, yûgoslav û romen** jî hebûn.

Bila ev yek jî ji bo kesên ku qetlîama Dêrsimê bi pirsgirêka Hatayê ve girê didin û di binî de li tilîka bîyanîyan digerin, bibe xizêma li ser pozê wan, bila guhar be, bi guhê wan ve be....

* Nivîskar, lêkolînvan

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya

Cûntayên sîvîl

(Dewama rûpela 1)

qeşmerên salonên bazarê, dibe sedemê pêldana hêrs û kîna gelên Parzemîna Qedîm. Ciwanekî spanyol ê ku sirf ji bo peydekirina kar, naxwaze koçî Berlîn an jî Hambûrgê bike, hêrsa xwe wiha dide der: *"Nabe ku ev rewşa me ya ku em tê de bûne koleyên Almanyayê, wisa bidome.* Îtalyan jî ji ber quretî û bêedebîya serokomarê fransî bi taybetî tengezar in û dest pê kirine ji xwe dipirsin ka ev bêedebî û quretî xwe dispêrin kîjan qabilîyeta wî ya taybet a mafdar. Hin yewnan jî ji niha ve gazina dikin ku *"hêzên dagîrker"* welatê wan xistiye bin destê xwe; karîkaturên ku ***Chansolier***a alman weke nazîyan nîşan didin jî êdî tên çêkirin…

Ji bo gelên ku bi siyasetên kemerşi-dandinê tên qurban kirin, dîroka Ewropayê gelek nimûneyên ku dişibin bêqanûnîyên berê pêşkêş dike. Lê belê herçendî ji alîyê asta rêjeyî ve cuda bin jî, bûyerên dawî yên li Atînayê bêhtir dişibin yên havîna 1968ê ên li Çekoslovakyayê, tevgera perçiqandina "Bihara Pragê" û lingşemitandina rêveberê komunîst **Alexandre Dubcek**. "Troïka"ya ku berî çendekê Yewnanistan veguherand mandatekê, rola berê ya ku para *Pakta Varşova* ketibû, girte ser xwe; **Papandreou,** kete rewşa Dubcekekî ku wê ti caran newêrîya li ber xwe bide. Di her du rewşan de jî, pêkanîna doktrîneke ku xwe dispêre "serwerîyeke sînorkirî" mijara gotinê ye. Rast e ku pêkanîna wê ji alîyê sê ajansên parametreyên aborîyê ve hatiye amade kirin, pêkanîna wê ji ya bi riya tankên sovyetê yên ku sînor diqelaştin, kêmtir kujer e.

Piştî perçiqandina Yewnanistan û binpêkirina Îtalyayê, Yekîtîya Ewropayê û IMF niha awirên xwe dizivirînin ser Macaristan û Spanyayê.

Wergera ji fransî: Baran Nebar

YEHYA AL SELO: **Bahoz**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 120 x 90 cm

www.arsivakurdi.org

Piştî dagîrkirina neh salan DYA welatekî çawa li paş xwe dihêle? (Dewama rûpela 1)

din dixe nav zehmetîyên siyasî yên mirinane, ji alîyê din serokatîya demokrasîya Îraqa nû xwe dispêre kevnemetodên ceribandî ji bo nefesên azadîyê asteng bike: Gava îraqîyên xeyalşikestî di meha adarê de mafên xwe yên hemwelatî yên nûbidestxistî bi kar anîn û li dijî xizmetên dewletê yên kurtekêm bêhêvî xwepêşandan kirin, hêzên ewlekarîyê yên **Malikî** bi mînaka ***sedamkî*** li wan xist. Kuştina rojnamevan û organîzetorekî navdar ê protestoyên heftane li dijî gendelîyê di îlona 2011ê de, tirsa gelek kesan zêde dike ku Malikî Îraqê cardin vegerîne dîktatorîyê.

"Belê" îraqî vekirî îtiraf dikin *"em dikarin îro hîn serbest serokên siyasî rexne bikin",* Sedam vê yekê bi mirinê ceza dikir. Lê dîsa jî, tirs ji dilên 30 milyon gel derneketiye, tenê xwe guhertiye.

Ji alîyekî encamên paşvekişandina DYAyê yên li ser Îraqê zelal dîyar nabin, ji alîyê din dîmena kurtekêm nehsalî ya "maceraya amerîkî" ya li welatê Mezopotamyayê gelek dîyar e: Şerekî ku yekser an neyekser jîyana zêdeyî 100.000 sîvîlên îraqî, nêzîkî 4.500 leşkerên DYAyê têk bir û ji yek bîlyon dolaran zêdetir ji kaseya dewletê ya Washingtonê daqurtand. Ji welatên cîhanê potansîyel hema bêje yekî herî dewlemend di nav tevlîhevîya paşdemayî û hejar de hişt, zerarên mezin ên derûnî bihêle, birîndar, endamên kesên qurban, zarok û dahatû jî têk birin.

Piştî sal û nîvekê bi şûn ve jî, jêrxaneyên ku ji alîyê şer û mieyîdeyên navnetewî yên jandar hatine xirab kirin, hîn jî ji nûve ava nebûne, qutbûnên ceryanê hîn parçeyek ji jîyana rojane ne û pêşketina aborîyê radiwestînin; hilberîn nikare bigihîje asta pêdivî. ***Thinktank*** (afirandêrên ramanan) ***"Carnegie Endowment"*** (Weqfa Karnegî) ku li Washingtonê bi cih e, kêmasîyeke dîyar a kordînasyonê di navbera hikumeta navendî li Bexdayê û meqamên herêmê şanî dide; pêşvebirina kalîteya karmendan têrê nake û berîya hertiştî xizmetên gelêrî wek "çekekî siyasî" bûne sedemên sereke ji bo xwedîderketina karesata gel ji alîyê dewlet û civakê ve.

Zêdeyî heft milyon îraqî di bin sinorê hejarîyê de rojê bi du dolaran dijîn. Tengasîya civakî, ji destpêka şeran ve (li dijî Îran û Kuweytê piştî salên 80yê) û mieyîdeyên navnetewî dramatîk in, hîn tirsnak girantir bûn. Di du dehsalên derbasbûyî de %20ê niştecîyên bajêr ên Îraqê li qiraxên bajaran dijiyan, îro yanzdeh milyon in, ev dike %53yê ji hejmara bi giştî 19 milyon niştecîyên bajêr. (UN-Habitat: State of the World´s Cities 2010, 2011).

Amerîka piştî vekişînê Îraqeke jihevketî û pir aloz li pey xwe dihêle

Heta 2008ê şer, şerê hundir û teror sedî 15ê niştecî ji cî û warên xwe hatin sirgun kirin. Nêzîkî du mîlyon kes hebûneke nedîyar di dewletên cîran de derbas dikin, 100.000 penaber piştî pêvajoya burokratîk a zehmet bi paş ve vegeriyan welatê xwe û Komîserîya Penaberîyê ya Bilind a NY(Neteweyên Yekgirtî) şîret dike ku bila hîn rawestin. Bi heman awayî ji du mîlyonan zêdetir koçberên hundirîn heta îro hîn nekarîne vegerin cî û warên xwe.

Piştî salên dijwar, endustrîya petrolê ya gelek hatiye piştguh kirin, dest pê kiriye ku xwe qewî bike. Hilberîneke ji 2.9 mîlyon warîl û hinardeyên (eksport) ji 2.1 mîlyonan serê rojê dê Îraq di vê salê de 74.76 milyar dolaran qezenc bike ku ev ji sedî 68ê hilberîna hundirîn a bruto ye. (*The Special Inspector General For Iraq Reconstruktion, SIGIR, 14.11.2011*). Wezareta Petrolê heta sala 2017ê kapasîteyeke hilberînê ji donzdeh mîlyon warîlan ji xwe re kiriye armanc. Ji ber kêmasîyên jêrxaneyê, bispor vê yekê dûrî rastîyê dibînin. Bi ser de jî rastîya ku Bexda heta îro jî hîn gihîştiye qanûneke petrolê ya neteweyî; ev yek ji bo kardarên bîyanî ji alîyê qanûnî ve faktora bêewlekarîyê ye.

Belê îraqî ji dema dagîrkirina DYAyê ve, di hilbijartinan de yên ku ji alîyê çavdêrên serbixwe ve gelek "azad û adil" pesinbar bûbûn, parlamenterên parlamentoyê û meclisên bajêr hilbijartibûn; rojname, ajansên nûçeyan û kanalên televîzyonan, NGO (Rêxistinên Nedewletî) û partîyên siyasî damezirandibûn, lêbelê dijberîyên navbera tevgerên siyasî û komên gel ên cûrbicûr ên dînî û etnîkî pêvajoya siyasî ecêbane asteng dikin. Ji alîyekî ve hema bêje du salan piştî hilbijartinên parlamentoyê yên adara 2010ê, **Malikî** hîn jî bi ser neketiye ku hikumeteke giştî ava bike, berpirsiyarîya ji bo rêveberîya girîng, beşên hundir û parastinê girtiye destê xwe û bi vî awayî hîn bêtir desthilatdarî di destê xwe de civandiye, li alîyê din jî parlamentoya kûredûr parçekirî hew dikare biryaran derbixe.

Di bin serokatîya Malikî û çavên hişyar ên DYAyê de Îraq di bidestxistina navê dudilî yê dewleteke herî gendelîparêz a cîhanê de serketî bû, di nav 178 welatan de cîyê 175ê digire. (*Transparency International: Coruption Perception Index 2010*).

Serokê parlamentoyê **Osama al-Nujaifi** di dema dawîyê de vekirî gilî kiribû ku gendelî *"wek heştpêyekê (axtapot) hemû Îraqê dixwe û komên mafya yên gendelîyê reformên siyasî û her pêşketinekê asteng dikin. (AFP, 5.10.2011)" DYA li gor kêfa dilê xwe dikare bikeve welatekî, hertiştî bi temamî ji cîyê xwe belawela bike, mirin û qirkirinê belav bike (bi zanîn yan bê qestî), di navbera cûrbicûr komên dînî û etnîkî komkujî bide çêkirin û paşê dîsa ji holê winda bibe –bê ku du cara li ser bifikire gelo çi li paş xwe hîştine"* şirovekarê lubnanî **Rami Khouri** bi vî awayî hêrsa xwe tîne ziman. (*The Daily Star, 9.11.2011*). Tiştê ku **Khouri** û kesên din Washingtonê bi taybetî rexne dikin, ew rastî ye ku wan di navbera sunî û şîîyan de dijminîyeke tundbar derxistiye holê ku Îraq heta 2003yê rewşeke wiha nas nekiriye. Ev yek êdî piştî vekişandina hêzên DYAyê jî hew dikare bê rawestandin û dikare hemû herêmê bi xwe re kaş bike.

Lê berîya hertiştî amerîkî avahîya dewletekê li pey xwe dihêlin ku li ser zemîneke gelek bê ewle ye. Piştî dema **Sedam** ya zêde xwîndar, ne tenê pêvajoya lihevanîna neteweyî bi taybetî di navbera kurd û ereban de çênebûye ku wê yekê dê pêşbingeha dahatûyeke aştîdar biafiranda. Ne bi tenê hêzên şer û ewlekarîyê dabeş bûne ser komên dînî –pêşketineke ku xwe wek *"Achillesferse (noqteya zeîf)"* a Îraqa nû derxistiye holê. Ne bi tenê hejmareke mezin a dijberîyên neçarbûyî li paş ve maye û bi vê yekê –wek pirsa metirs a ber teqînê di navbera kurdan de li alîyekê, hikumeta navend, sunîyên ereb, şîî û turkmen "herêmên bi pirsgirêk" – teqîneyên xeter in, bi taybetî ger leşkerên DYAyê hew bi navbeynkarîya cîyên vekêşebar aşt bikin û çekdarên her du alîyan hêriş bibin ser hev. Heta roja me jî sînorên hundirîn yên di navbera Kurdistana Federal û Îraqê de nehatine kifş kirin, li gor dîtinên leşkerîya DYAyê hîç pirseke wek vê pirsê xeter nîne ku aştîyê tehdîd dike. Ji ber ku pirs kanîyên petrolê yên li Kerkûkê û li cîyên dervayê herêma federal in ku bi giranî kurd tê de niştecî ne.

Destûra bingehîn û mafê federasyon û otonomîya herêman, nakokîya di navbera sunî û şîîyan û Malikî de

Avahîya dewletê heta îro ne zelal e. Qanûna bingehîn ya 2005ê federasyon, mafên otonomîyê dipejirîne ku heta niha bi tenê kurdan ev yek ji bo xwe anîne cî. Nivîsera qanûnê hewr(sûnger) e, dikare pircûre bê şirove kirin. Rastîya ku dabeşkirina hatinên petrolê hîn jî bi qanûnê nehatine saz kirin, serokwezîr vê yekê bi kar tîne ku herêman qels bike û desthilatdarîyê (ya aborî) li Bexdayê bicivîne. Dijberîyên nû yên ji bo teqînê amade ne ku dikarin yekîtîya dewletê têk bibin, derdikevin holê.

Çawa **Malikî** di sala 2008ê de hewldanên komên şîî ku dixwastin li bajarên başûrê Îraqê Besra û Wasitê otonomî damezirînin, asteng kir û ceribandinên nû piştguh kirin, niha jî sunîyên ereb bi daxwazên bi vî awayî Bexdayê tengav dikin. Dema meclisa birêveberîyê, herêma sunî Selahedînê ku 1.1 mîlyon nifûsa wê heye, bi yekdengî biryar da, wek di qanûna bingehîn de nivîsandiye, dibêje ku divê niştecî li ser damezirandina otonomîyekê biryarê bidin û bi vî awayî ji xwe re aborîya serbixwe ewle bikin, bû helhelan. Ma gelo sunîyên ereb ên Îraqê heta niha li dijî federalîzmê nebûn. Ev daxwaz divê ji alîyê serokê hikumetê hema bihata pejirandin, lê **Malikî** ku navendperest e vê yekê nayne bîra xwe. **Osama Al-Nujaifi** serokwezîr hişyar dike ku rêzê ji vîyana gel re bigire, ji ber ku xeyalşikestin ji sedema cudakirina sunîyan ji alîyê Malikî de derçûye. Di bin behaneya "paqijkirina " beesîyan de Malikî hertim hewl dide ku dijberên xwe yên siyasî bê tesîr bihêle. Ev yek di dereceya yekem de li ser sunîyên ereb wiha ye. Nêzîkî hezar kesan di meha mijdarê de, di pêla girtina seranserê welat de mexdûr bûn. Taqîbatên bi vî awayî bûn sedema bê tehemulîyê. Piştî Selahedînê niha jî bajarê sunîyan Enbar dest pê dike. Kurdên bakurê Îraqê vê bûyerê bi hestên geremol dişopînin. Ew bi tesîra mînaka modela herêma xwe ya serbixwe pesindar in ku tê de aramî, ewlekarî serdest e û dewlemendîya aborîya xwe ku li hîç devereke Îraqê nîne. Damezirandina herêmên din ên otonom li Îraqê, bê şik dê hêzê bide avahîya federal a dewletê û bi vê yekê dê hîn bêtir ewlekarîya bûnewerîya serbixwe ya kurdan bînin holê. Ji alîyê din hin mintiqayên nezelal di herêma Selahedîn de jî hene ku dikarin danûstandinên çareserîyê bi Bexdayê re bixin zorê.

Peymana hikûmeta Kurdistanê li gel Exxon Mobil, daxwaza Malikî ya pûçkirina peymanê û gefa Barzanî

Lê teqîn û peqîn ji paş ve hîn komî ser hev dibin. Yekemîn car şirketeke mezin a navneteweyî ya petrolê, ***Exxon-Mobil*** a amerîkî, guh neda tehdîdên Bexdayê û seranser bi hikumeta herêmî ya Kurdistanê re peymanek li ser mafên madenê girêda. Ji şeş sîteyên lêgerînê didu di herêmên "geremol" de ne. Malikîyê hêrsketî tehdîd dike ku mafên lêgerînê ji ***Exxon-Mobil*** li başûrê Îraqe bi paş ve vekişîne. Pirs li vê derê ne bi tenê mebesta hikumeta navendî ve girêdaye ku heta niha ji alîyê hiqûqî ve ewle nebûye, herwiha kontrola peymanên petrolê bi şirketên bîyanî re ye jî. Pirs, daxwazên kurdan ên derbarê "herêmên nezelal" in ku bi dayîna mafan bi ***Exxon-Mobil*** re jê re bingeh ava bûye. Niha **Malikî** vê yekê bipejirîne, şirketên din ên petrolê ku demeke dirêj e çavekî birçî berdane ser dewlemendîyên nekolandî yên bakurê Îraqê, dikarin mînaka ***Exxon-Mobil*** ji xwe re bişopînin û bi vî awayî hîn bêtir hêzê bidin serwerîya kurdan. Eger serokwezîr vê yekê nepejirîne û hewl bide ku peymana bi ***Exxon-Mobil*** re pûç bike, wê demê serokê Kurdistanê **Barzanî** dikare piştgirîya xwe ya ji bo wî girîngejîyan e bi paş ve bikişîne. *(CTC Sentinel, Tirmeh 2011)* Hemû ev dijberî di paşxaneya bêîstîqrarîya nezexim de dipeqin. Di Îraqa ku ji alîyê hêzên DYAyê hatiye terikandin de berjewendîyên tund ên siyaseta herêmî li hev diqelibin –ên tirkan li dijî kurdan, ên Îranê li dijî alîgirên rojava, ên siûdîyan li dijî yên şîî û Îranê. Her yek ji van hêzan dikarin ji dêvla xwe şerekî bi xwîn ji bo xwe bidin meşandin. El-Qaîdeya li Îraqê ku yekem car piştî têkçûna **Sedam Huseyn** bûyîna xwe pîroz kir û şerê xwîndar di navbera şîî û sunîyan de pîj kir, îro gelek hatiye qels kirin. Di şûna wê de ***Ceyş el-Raiq el Neqişbendî*** (JRTN) rêxistineke sofî bi rehên xurt di nav sunîyên Îraqê de ku şaxeke milîtanî pêş de xistiye û ji bin ve jî bi beesîyan re li hev hatiye, her diçe derdikeve holê. Ew li dijî leşkerîya DYAyê berpirsa hejmareke çalakîyên şidetê ye û ji xwe re kiriye armanc ku "her du dagîrkerên" Îraqê biqewitîne, piştî vekişîna amerîkîyan, paşvekişîna kurdan. Ji derdorên muxaberatên ereb nîşane hene ku cîranên sunî bi taybetî jî Urdun girêdanên bi JRTN re xurt dikin da ku tesîra Îranê di dewleta cîran de li paş bimîne.

Bi salan piştî dagîrkirina Amerîkayê, Îraq hîn jî ji îstîqrar, aştî û geşepêdana kamranî gelek dûr e.

Wergera ji almanî: Hüseyin Kartal

YEHYA AL SELO: **Kurdistan**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 60 x 40 cm

Berdewamkirina zêdetirî salekê ya xwepêşandanên li Misir, Sûrîye, Yemen, Bahreyn û li welatên din ên ereb dide xuyakirin ku serhildanên ku li tevahiya herêmê berbelav bûne, wê zû bi zû bi dawî nebin. Lê belê mirov nikare ji bîr bike ku demokratîzekirin jî li vê herêma veçiriyayî ji ber gelek nakokî û pêşveçûnan ketiye xeterê.

TEPEREPA POTÎNAN Û HÊRSA GEL

Erdheja jeopolîtîk li Rojhilatê Navîn

ALAIN GRESH

Şêr hez nake ku dagîrker bikevin mala wî. Şêr hez nake zarokên wî bi şevê werin hişyar kirin. Şêr wê destûrê nade were kirin. Divê ew nekevin mala şêrî." "Dagîrker" kî ne? Hemin, eskerên Hêza Navneteweyî ya Alîkarîya Ewlekarîyê (ISAF), yên ku bê destûr dikevin malan û gumanbaran digirin. Zilamê ku van peyvan li ber çepikên li holê bi lêv dike, tu devereke wî naşibe şêrekî: Serokdewletê Afganistanê **Hemîd Karzayî** yê ku sala 2001ê ji alîyê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ve li ser textê desthilatdarîyê hat bi cih kirin; bi xêra wesayeta wan ew li ser desthilatdarîyê dimîne; wî di hilbijartinên serokdewletîyê yên tebaxa 2009ê de bi alîkarîya "civaka navneteweyî" sextekarî kirin. (1) Bi vê axaftina neteweperest ew piştî 2014ê amade dike, lewra hingê divê para mezin a eskerên amerîkî û temamkerên wan vekişin. Dîsa jî kêm pêkan e ku şelafîyên bi vî rengî wî ji çarenivîsa ji hevkaran re veqetandî xilas bike.

Di heman demê de Dewletên Yekbûyî ketine nav operasyonên vegerandina welêt a alav (û eskeran) ên herî tevlîhev ên dîroka xwe. Di dawîya salê de ji bilî çend sed şêwirmendan pê ve wê kes li Iraqê nemîne. Heta bi deqîqeya dawîyê Washingtonê hewl da desteka Bexdayê bi dest bixe da ku çend dehhezar esker li Iraqê bimînin, lê belê muxalefeta gel ewqasî zêde bû ku hêzên siyasî yên hevgirên *Rêxistina Peymana Bakurê Atlantîkê* (***NATO***) bi xwe jî li ber vê daxwazê rabûn.

Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê wê Iraqeke ji dîktatorê xwe rizgarbûyî li dûv xwe bihêlin, lê belê zehmet e ku ew ji bo Rojhilatekî Nêzîk a demokratîk bibe mestere û model: Welatekî xirakirî û parçekirî, dewleteke jihevketî, bi dehhezaran jinebî û sêwî, wendakirî û seqetmayî, mezhebperestîyeke xurtkirî, gerîlayeke El-Qaîdeyê ya hê çalak –tevî ku ev gerîla di dema dagîrkirina welêt a sala 2003yê de nebû. Ji bo tevahîya van gunehan wê tu berpirsyarê amerîkî li ber Dadgeha Ceza ya Navneteweyî neyê dadgeh kirin.

Wekî din hukûmeta heyî ya li Bexdayê, bêguman girêdayî Dewletên Yekbûyî ye, bi awayekî nakokane têkilîyên ji dostanîyê wêdetir bi hêza îranî a cîran re datîne. Hem li Afganistanê û hem jî li Iraqê redda gelan a birêvebirina bi destê bîyanîyan hat piştrast kirin: Vegera li serdema kolonyal ne mumkin e. Ev herdu binketinên Dewletên Yekbûyî lawazbûna wê ya nisbî ya li herêmê nîşan didin, ev yek ji alîyê şoreşên ereb ve jî hate piştrast kirin, nexasim ji deshilatdarîyê dûrxistina **Zînel Abidîn Bin Elî** li Tûnisê û berî hertiştî ya **Husnî Mubarek** li Misirê ku di bin wesayeta wan de bû û stûna stratejîya wan a herêmî bû.

Ev jêçûn aktorên herêmî neçar dike li derdoreke neewle û bêîstîqrar bi roleke çalaktir rabin. Heta niha Rojhilatê Nêzîk li ser du qisman dabeş dibû: Bendek ya ku jê re benda "berxwedanê" dihat gotin ji Îran, Sûriye û hevgirên wan ên ***Hamas***a filistînî û ***Hizbullah***a libnanî û bendeke alîgirên Rojava yên ku Misr û Erebistana Suûdîyê serkêşîya wê dikir. Benda pêşî di serî de bihêztir bû: Xwepêşandanan du rejîmên hevalbendên Rojava ji holê rakirin, ya Tûnisê û ya Misirê û hinên din jî hejandin, ya Bahreyn û ya Yemenê. Urdun û Fasê bi xwe jî ber bi guhertinê ve gav avêtin, li alîyê din li Beyrûdê li gor wekhevîyê hukûmetek bi cih bûye ku Hizbullah û hevgirên wê yên xirîstîyan ên Tevgera Welatparêz a Azad a general **Michel Aoun** wê bi rê ve dibin.

Erebistana Suûdîyê ji ber "lawazîya" Washingtonê fikaran dike, ya ku ji tirsa îhtîmala li welatên din belavbûna şoreşan dev ji dostên xwe berda û heman Erebistana Suûdîyê biryar da dev ji pasîvbûneke dîyar berde û hêzên xwe bajo qada şerî. Pêşî di nav çend hefteyan de destpêka 2011ê 214 milyar dolar –bi qasî deynên Portekîzê ne– li welatîyên xwe belav kirin, bi awayekî ji bo bêçekkirina muxalefetê, ya ku ne bi tenê di nav hindikahîya şîî de, lê belê herweha di nav ciwanan de jî dengê xwe bilind dike; lewra ciwan li ser blog û medyaya civakî nerazîbûna xwe (%18ê bêkaran sala 2000ê xwedîya dîplomeyên zanîngehê bûn, sala 2009ê ev rêje %44 bû) derdibirin. (2) Damezirandina şêsthezar karan ji alîyê wezareta karê hundir ve weke hişyarkirina kesên serhişk û sernetewên xuya bû. Paşê tevî muxalefeta cografyayê bi pêşnîyazkirina hewandina Urdun û Fasê ya nav ***Konseya Hevkarîya Kendavê*** (CCG) (3) û fînanskirina monarşîyên wan û desthilatdarîya nû ya li Misirê da ku wan "di nav refan de" bigire. Jixwe di encamê de Riyadê serê hêzên eskerî yên CCGyê kişand, ên ku nîvê meha gulanê Bahreyn dagîr kir da ku raperîna demokratîk û daxwazên wê yên jirêderketî yên ji bo monarşîyeke li gor destûra bingehîn bitepisînin, bi vî rengî agirê pirsgirêkên di navbera şîî û sunîyan de li tevahîya herêmê gurtir kirin. Wekî din ev dagîrkirina ku ji dûreparêzîyên Dewletên Yekbûyî jî derbas bû, bi hênceta "tehlûkeya Îranê" hat kirin, ev tehlûkeya Îranê ji bo birêveberên Kendavê ji ya Îsraîlê bêtir endîşeyan peyda dike.

Gumanên li ser Îranê... ji 1984ê pê ve

Îran û Erebistana Suûdîyê berî şoreşa Îranê ya sala 1979ê bixwe jî dijber bûn, tevî ku hingê herdu welat jî hevgirên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bûn. Banga Ayetullah Rûhullah Xumeynî, suûdî li bin guhê erdê xistin û desteka suûdîyan dayî êrişkarîya Iraqê li dijî Îranê ya dema şerê di navbera 1980 û 1988ê de têkilîyên herdu welatan xirabtir kirin, heta ku di salên 1990ê de baştir bûn. Dagîrkirina Iraqê ji alîyê amerîkîyan ve ya sala 2003ê, li Bexdayê bicihkirina hukûmeteke ku weke şîî ango nêzî Tehranê tê dîtin, bûna hêzeke heremî ya Îranê, muxalefeta li Bahreynê hevrikîya di navbera herdu hêzên Kendavê ji nû ve zindî kir û ev yek jî li ser mijara Sûrîyeyê bi gewde û dîyar bû.

Biryara Lîga Ereb a betalkirina demî ya endametîya Şamê vê çirîya paşîn li Washingtonê û li paytextên ewropî bi kêfxweşî û pesindanê hat pêşwazî kirin. Rêxistina ku demeke ewqasî dirêj ji ber pasîfbûna xwe dihat rexne kirin, di dawîyê de gav avêt çalakîyê û mafên mirovan parastin, bi ser de jî ne bi daxuyanîyên pûç, belê bi kirinên xwe. Erê monarşîya Suûdîyê ya ku prensê nû yê welîaht **Nayif** ê ku ji sala 1975ê ve wezîrê karê hundir û hêzdar e û berpirsyarê zindîkirina çalakîyên polîsê dînî yê li welatê xwe deqa li dijî Sûrîyeyê mohr kir, lê belê ev yek çavdêrên şad û kêfxweş nerihet nake; dengê xanedanîya Bahreynê ya ku muxalifên xwe digire û êşkencê li wan dike, yan jî dengê serokdewletê Sûdanê yê ku ji alîyê Dadgeha Ceza ya Navneteweyî ve bi gunehên li dijî mirovatîyê û qirkirinê tê gunehbar kirin jî wan aciz nake: Wisa xuya ye ku Lîg bi "bihara erebî" re bûye yek.

Çawa întellektuelê libnanî **Esed Ebûxelîl** (4) digot, dibe ku "*sedemê ev tevlîbûna Lîga Ereb elaqedarî rewşa zehmet a serhildanên ereb bin. Ew di çarçoveya talîmatên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê de pêk hatin. Ew herweha bi îhtîrasên mezin dibin ên Mîrîtîya Qetarê tên rave kirin, Qetar dixwaze nîşanî Washingtonê bide ku ew dikare bi qasî Erebîstana Suûdîyê û Urdunê serê xwe li ber berjewendîyên emperyalîst ên amerîkî bitewîne û dilsoza wan be û bi vî rengî bikêrhatina xwe bi delîl nîşanî Dewletên Yekbûyî (û Îsraîlê) dide. Lîga Ereb piştrast kir ku dê destûra wê neyê dayîn ku bi rolekê rabe heke ew bi tevahî weke biryarên amerîkî tevnegere.*" Ew digihêje vê encamê, "*Di van hoy û mercan de çêtir e ku ev Lîg xwe dûrî her şêwazê rolan bike.*"

Lewra ya li Rojhilatê Nêzîk li ser tê lîstin ne bi tenê siberoja demokratîk e, belê herweha serxwebûna herêmê ye. Em dikarin bêyî ku pê re hemfikir bin, daxuyanîyên kevne-şêwirmendê **Cemal Ebdul Nasir** li vir binivîsin, ew behsa peymanên nû yên *Sykes-Picot* (5) yên parvekirina herêmê di navbera hêzên rojavayî (6) de dike û helbet behsa dewamkirina siyaseta tepisandina filistînîyan ji alîyê Îsraîlê ve –ya ku tu caran Lîga Ereb bersiveke cidî nedaye- jî dike. Ev alîyê serê hatî girtin, bêyî rewa bike rave dike ka ji bo çi Hizbullah destekê dide rejîma Sûrîyeyê; li gor daxuyanîyên sekreterê wê yê giştî Hesen Nasrellah, Hizbullah difikire ku saxî û silametîya rejîma Sûrîyeyê "*ji bo saxî û silametîya doza filistînîyan şertekî pêwîst e.*" (7)

Li Sûrîyeyê desthilatdarîyê biryar da hêza bi şid û şidet yekane bersiva "*bêbextîya ji derve*" ye. Wê artêşa xwe û milîsên xwe berdan qada şer, ji êşkencê heta bi kuştinê û girtinên girseyî xwe ji tu navgînan venade. Bingeheke wê li cem alewîyan û herweha li cem hindikahîyên din –xirîstîyan, durzî û hwd.– heye û çawa ku xwepêşandanên destekkirina serokdewlet **Beşar el-Esed** ên ku ne televizyonên rojavayî û ne jî el-Cezîre wan nîşan didin, piştrast dikin, heta li cem civaka sunî bixwe jî bingeheke wî heye. Tevî ku rejîm ji bo zexmkirina rewabûna xwe bi wan dilîze jî, tehlûkeyên şerekî navxweyî yê mezhebî rastî ne. Ev tehlûke cîranên wê dixe nav fikaran, li pêşîya hemûyan jî Enqerê.

Di navbera Tirkîye û Sûrîyeyê de sînorekî hevpar ê 900 kîlometreyan dirêj heye, ji ber vê Tirkîyeyê pêşîyê hewl da zorê li **Esed** bike da ku reforman bike. Lê belê redkirina serhişk a Esed kir ku serokwezîr **Tayip Erdogan** cihê xwe di nav benda dijmina Şamê de bigire. Tirkîyeya endama NATOyê ye hewlê dide li ser xeteke zirav bimîne; di navbera şermezarkirina tund a siyaseta Îsraîlê ya ku populartîya wê li Rojhilatê Nêzîk xurt kirî û ya Îranê kêm kirî û tirsa xwe ya ku bike ku Sûrîye ji nû ve karta xwe ya kurd bi kar bîne, çawa ku di salên 1990ê de bi piştgirîya ***Partîya Karkerên Kurdistanê*** (PKK) kirî. (8) Enqerê qebûl kir ku li ser erdên wê yekîneyên ***Artêşa Azad a Sûrîyeyê*** bi cih bibin û heke şer berfireh bibe, wê pê re rûbirû bibe, herêmên tampon ên ji bo parastina xelkê di nav erdê Sûrîyeyê de ava bike. Weke gelek aktorên li herêmê Tirkîye ditirse ku şerekî navxweyî yê mezhebî, dibe ku di encama reaksîyoneke zincîrwarî de belavî welatên cîran Libnan û Iraqê bibe û tevahîya herêmê bigire nav xwe; ev tehlûkeyek e ku gelekî ji "tehlûkeya nukleer" a Îranê cidîtir e.

Tevî xweşkirina bêqisûr a medyatîk, rapora ***Ajansa Enerjîya Atomî ya Navneteweyî*** (IAEA) ya meha çirîya paşîn weşandî bi ti awayî erê nedikir ku Îran bombeyeke nukleer ava dike –îdîayeke bi dehsalan e tê pirgêsinî kirin, îdîaya pêşî heta bi 24ê nîsana 1984ê diçe (9) –belê wê pirs derxistin pêş, pirsên ji rêxistinên ewlekarîyê yên rojavayî û îsraîlî tên û ev rêxistin hê jî red dikin ku çavkanîyên xwe yên "agahdarîyan" bidin IAEAyê. Û Tehranê jî bersiva wan pirsan neda.

Hevgirtina navbera welatên ereb û Îsraîlê?

Çawa ku ji zanîngeha Florîdayê **Hamid Seri** îşaret pê dike, ev mentiq bi awayekî ecêb bûyera iraqê ya destpêka salên 2000ê bi bîr dixe (10). Raporeke Komîsyona Kontrol, Rastandin û Teftîşê ya Neteweyên Yekbûyî ya ji alîyê **Hans Blix** ve hatî bi rê ve birin "*17ê adara 2003yê, sê rojan berîya şerî îdîa kir ku Iraq ji gunehbarîyên veşartina* sîlehên tinekirina girseyan *paqij nebûye.*" Ji bo çi ev "şaşîya" çor? "*Pirsgirêk ne agahdarîyên mufetişan bûn, lê belê pêşhukmên wan ên ku girtî û bendeyên teorîyeke nikare were 'derew derxistin' bûn,* (...), *lewma prensîpa wan jê dida rê ew bû ku mirov nikare bawerîyê bi Iraqê bîne. Ango nebûna delîlan tu tişt piştrast nedikir, lewra mirov nikare tu caran eşkere nîşan bide ku tu tiştî venaşêre.*" Bi vî awayî Îran jî wê weke Iraqa ber bi dawîya salên 1990ê ve bi "ne dildarîya" xwe bi pêvajoyeke gunehbarîyên bêdawî re rûbirû bimîne, ên ku armanca wan çawa ku wê rewabûna ne kontrolkirina bernameya nukleer a Îranê ye, lê belê ew e ku rejîmê misêwa di bin barê gunehbarîyên daîmî de bihêle. Û her dewam dike kirasê texrîbkirina atomî ya Îsraîlê li vê îdîayê dike, tevî ku wezîrê parastinê yê Îsraîlê **Ehûd Barak** bi xwe rave dike ku gelek sedemên Tehranê hene ku li herêmeke evqasî bêîstîqrar bixwaze xwe bi nukleerê gurçûpêç bike. (11)

Gelo sibe wê şer çêbe? Zehmet e mirov pêş bibîne, ewhinde ku encamên êrişeke li dijî vî welatî li gor tevahîya analîstan wê ji bo herêmê felaketek be. Lê belê Washington û Tel-Aviv di qismekî de bi ser ketin: Çêkirina dijminekê ku balê ji ser pirsgirêka Filistînê dide alî û ku bi ser de jî destûrê dide ku hevgirtineke *de fakto* di navbera welatên ereb ên nerm û Îsraîlê de pêk were, ev xewneke kevin a serokê amerîkî **Ronald Reagan** bû: Yekkirina ereb û îsraîlîyan li dijî "tehlûkeya sovyetî".

Şoreşên ereb dikarin alîyên jeopolîtîk yên şer û pevçûnên li herêmê veşêrin. Pêjna pêvajoya parçebûna Rojhilatê Nêzîk û heta ya Mexrebê hê berîya 2011ê dihat: Şerê navxweyî li Iraqê, bêîstîqrarîya Kurdistanê, şerê navxweyî yê bêdeng li Libnanê, parçebûna Filistînê, serxwebûna Başûrê Sûdanê û tevgerên cûdaxwaz li Sûdanê, bêîstîqrarîya li Saharayê, pirsgirêka Saharaya Rojava... Şerekî nû yê herêmî wê ne bi tenê li pêşîya tevgerên demokratîkbûnê bibe bend û asteng, lê belê ew ê herweha bibe nîşana ketina nav kaosê ya herêmeke cîrana Ewropayê.

YEHYA AL SELO: **Bajar**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 100 cm

1 Alissa J. Rubin, "Karzai Details Vision for Long-Term Partnership With U.S. (Karzayî kite bi kite vîzyona ji bo hevkarîyeke demdirêj a bi DYEyê re rave dike)", *International Herald Tribune*, Neuilly-sur-Seine, 16ê çirîya paşîn 2011

2 Edith Schlaffer û Ulrich Kropiunigg, "Saudi Youth: Unveiling the Force for Change (Ciwanên suûdî: eşkerekirina hêza guherînê)", Center for Strategic and International Studies, Gulf Analysis Paper, Washington, çirîya paşîn 2011

3 Ji şeş welatên peravên wan li Kendavê erebo-fars pêk tê: Erebîstana Suûdî, Yekîtîya Mîrîtîyên Ereb, Oman, Kuweyt, Qetar, Bahreyn

4 "Syria and the Arab League: the motives (Sûrî û Lîga Ereb: sedem)", Al-Akhbar bi Ingilîzî, 18ê çirîya paşîn a 2011ê, http://english.al-akhbar.com

5 Berîya dawîya Şerê Cîhanê yê Yekemîn fransî û brîtanîyan di nava xwe Împaratorîya Osmanî parve kir û nexasim jî herêmên ereb. Vê lihevkirinê xetên stûr û mezin ên sînorên heyî yên herêmê dîyar kirin

6 Isandr El Amrani, "In translation: Muhammad Hassanein Heykal on 'the new Sykes-Picot' (Di wergerê de: Muhammad Hassanein Heykal der barê 'Sykes-Picot a nû' de)", The Arabist, 13ê çirîya paşîn a 2011ê, www.arabist.net

7 Amal Saad-Ghorayeb, "Why Hezbollah supports the Syria regime (çima Hizbullah destekê dide rejîma Sûriyê)", Al-Akhbar bi Ingilîzî, 5ê çirîya paşîn a 2011ê

8 Wendy Kristianasen, "Le gouvernement turc face au défi kurde (hukûmeta tirk beramberî pirsgirêka kurd)", *Le Monde diplomatique*, çirîya paşîn 2011

9 Nima Shirazi, "The Phantom Menace: Fantasies, Falshoods, and Fear-Mongering about Iran's Nuclear Program (Tehlûkeya xeyalî: xeyal, derewînî û bazirganîya tirsê der barê bernameya nukleer a Îranê de)", Wide Asleep in America, 29ê kanûna 2010ê, www.wideassleeppinamerica.com

10 Hamid Seri, "Iran's UN Inspectors are Repeating the Iraq Mistakes (Mufettişên NYyê yên ji bo Îranê şaşîyên li Îraqê dugêsinî dikin)", Informed Comment, 18ê çirîya paşîn a 2011ê, www.juancole.com

11 MJ Rozenberg, "Iranian nuclear programme not about Israel (bernameya nukleer a Îranê ne der barê Îsraîlê de ye)", Al Jazeera English, 20ê çirîya paşîn a 2011ê, www.aljazeera.com

Wergera ji fransî: Luqman Guldive

www.arsivakurdi.org

Ji dijwarîyê ber bi bêlivbûnê ve

Yewnanistan wê ji alozîya îro çawa rizgar bibe?

Noëlle Burgi *

Bi hesabkirina hêza demê û giranîyê ya xwe berdana bi destê felekê ve, krîzên dirêj hêdî hêdî tiştên ne qebûlbar jî asayî nîşan didin. Ji ber vê yekê mirov bi her tiştê ku sermayedar bi hukûmeta didin kirin, razî dibin (edîtorîyala Serge Halimi ya di rûpela pêşî de), fêrî kêmbûna meaşan û qutkirina ji butçeya gelemperî dibin. Ev, li gor rêveberan, ji bo pêşîlêgirtina tiştên xirab-tir e. Lê belê gelo dema ku xeyaleta qutbûneke din li aborîya cîhanê rû dide, ew hê jî makîneyê kontrol dikin? Li bin zexta bazarên diravan û şaxên wan ên siyasî, şirketên ewropî dest pê kirin, ji hev ketin, weke li Yewnanistanê. Tevî gotinên pesindanê yên ji bo "sererastkirina zêdegavîyên pergalê" û rizgarkirina kapîta-lîzma (baş) ji ya (xirab) a finansê), her kesek wisa bawer dike ku qonaxek bi dawî tê.

Tu nizanî ka wê çi li benda te be, gava tu sibê ji xewê rabî" Li Atîna, Selanîk an jî li devereke din, kesek bi tenê jî tine ku carekê, hevoka li jor bi lêv nekiribe. Li Yewnanistanê, xemxurîya ji bo siberojê eynî weke girtîgeheke ku herkesekî di hundir de dixe nav xumama hebûna takekesî û herkesî, ya ku bi hilweşîneke kes nizane wê kengê rû bide, tê hîs kirin. Li gel vê yekê jî, ev welatê xwedî dîrokeke aloz, ne cara pêşî ye ku rastî rewşeke wisa tê. Yewnan hertim xwe weke gelekî xwedî zîrekîyeke taybet, xwuyekî pir zexim dibînin, bi taybetî jî di rojên teng û dijwar de. Gerînendeyeke şirketeke piçûk vê gazinê dike: *"Em hertim rastî vedor û serdemên dijwar hatine; me hertim kariye ji nav wan dijwarîyan xwe rizgar bikin. Lê belê niha, hêvîya me ji me standin."* Dema ku bernameyên kemberşidandinê tên pêk anîn, di ber re jî qanûn, pêşnîyar-qanûn, giştîname an jî biryarên siyasî adetên civakî, aborî û îdarî yên welêt dikin mijara guftûgoyê. Her tişt her roj diguhere.

"Gava tu bangî polîsan dikî, ew vê bersivê didin: 'li çareya serê xwe binêre!'"

Tiştê ku hê doh realîteyek bû îro êdî ne ew e; sibê, mirov nizane wê çi bibe. Welatî dibin mexdûrên burokrasîyeke roj bi roj tevlîhevtir, kafkayî ya ku xwe dispêre rêzikên netêgihîştbar û hertim guhêrbar. Karmendeke jin jî ji hevpîşeyên xwe yên li şaredarîyeke Cycladesê re rewşê wiha îzah dike: *"Mirov dixwazin li gor qanûnan tev bigerin. Lê belê yê me, em nizanin ji wan re çi bibêjin, em der barê detayên tedbîran de, ne xwedî agahîyan in!"* Zilamek neçar ma 200 ewro bide û sêzde belge û nasname pêşkêş bike ji bo ku karibe ehliyeta xwe ya ajovanîyê nû bike. Hin karmendên dezgehên gelemperî ketine nav berxwedana pasîf. Mihendisekî xanenişîn ê bazirganîya deryayî, pir hêrsbûyî, li dijî hukûmetê wiha diaxive: *"Meaşên wan qut dikin, ji ber vê yekê ew êdî naxebitin. Gava ji ber tiştekî ku tê serê te tu gazî polîs dikî, ew wiha bersivê dide te: "Ev pirsgirêka te ye, tu bi xwe li çara serê xwe binêre!""*. Rewş dijwar û aloz dibe. Niha tê ragihandin ku di şideta navmalbatî, dizî û kuştinan de zêdebûneke berbiçav heye. (1)

Ji alîyekî ve, meaş dadikevin –ji sedî 35 heta 40ê di nav sektoran de– li alîyê din, berdewam bacên nû tên afirandin, hin caran li gel encama xwe dispêre rewşa berê ya destpêka sala sîvîl, ku hin ji wan ji çavkanîyan tên qut kirin, hinên din na. Ango daketineke berbiçav a vehatinan a ku pir caran ji sedî 50yê derbas dibe. Di nav bacên ji havîna 2011ê û vir ve afirandî de baca piştgirîyê (ji sedî 1ê heta ji sedî 4 a vehatinên salane), baceke petrolê û gaza xwezayî yên ku divê li bacên xerckirinên enerjîyê bên zêde kirin, kêmkirina sînorê pêşî yê mîqdara hêjayî standina baca li ser vehatina ku salê ji 5 hezar ewroyan derbasî 2 hezar ewroyan dibe, baceke erdûzevîyan ya ji 0.5 ewro heta 20 ewro serê metrekareyekê bi fatûraya elektrîkê tê ragihandin û berdêla wê dikare di du an jî sê caran de bê dayîn, heke na xelk bi qutbûna elektrîkê an jî cezayên din ên qanûnî tên tehdîd kirin.

Destpêka mijdara 2011ê, ne xanenişînan, ne jî karmend û karkeran (çi yên gelemperî çi jî yên sazîyên taybet) nizanibûn ka di dawîya mehê de wê çiqasî meaş bistînin. Xebitîna bê pere mijara gotinê ye. Li şirket û dezgehên gelemperî ên ketine nav pêvajoya "başbûnê", bernameyeke tund û dijwar a kêmkirina xebatkaran tê pêk anîn. Ji niha heta 2015ê, sed û bîst hezar kedkarên temenê wan raserî 53yê divê bikevin rewşa "bendewar"an. Bendewarên xanenişînîyê karmendên 33 salên xwe yên xebatê dagirtine, ne ku yekser ji kar tên derxistin: Ev kesên di rewşa bendewarîyê de, êdî li malên xwe dimînin û tenê ji sedî 60ê meaşên xwe yên bingehîn werdigirin. Hejmareke têra xwe mezin a karmendên malnişînkirî piştî demeke nêz, wê bi tenê meaşekî têra qûtekî nemir bike, wergirin. Vê yekê yek ji kesên koma karkerên rêyên hesinî yên bêrê ku temenê wan 50 û di ser 50 salî re ne, ji me re tîne ziman. Ev kesên ku niha di çarçoveya prosedureke cihguhestina "bi dilê xwe" (2) de bi nobetdarîya muzeyê hatine wezîfedar kirin û berê her meh meaşekî di navbera 1 800 û 2 000 ewroyan de distandin, ku bi hatineke wisa li Yewnanistanê mirov dikare di nav xweşîyê de bijî; ji îro şûn ve meaşê wan wê dakeve navbera 1 100 û 1 300 ewroyan û ji bo "bendewaran" jî wê meaşê herî bilind ê mehane 600 ewro be. Tevî vê yekê, her yek ji wan dibe ku ji vî meaşê kêm jî bêpar bimîne, eger bikeve nav hewldana xwe rizgarkirina ji vê rewşê û li karekî din ê fermî bigere: Ev yek bi awayekî fermî li wan hatiye qedexekirin –rayedar li hemberî vê lêgerîna kar a qedexekirî bêdudilî cezayan li wan dibirin.

Niştecîyekî ji Selanîkê dilê xwe wiha vedike û dibêje: *"Kêmkirina meaşan rewşeke kambax diafirîne. Ez êdî nikarim pereyên fatûrayên xwe jî bidim, ez her diçe kêmtir tiştan dikirim, maxaza tên girtin, betalî zêde dibe..."* Di gulana 2011ê de, rêjeya betalîya fermî –muhtemelen pir kêmtirî rêjeya reel– ji sedî 16.6 (û di nav ciwanan de ji sedî 40) bû, ango ji ya sala 2008ê deh xal zêdetir. Rewşa tofanê ya ji ber buhrana aborî, civakî û siyasî bi xwe re ji bo tenduristîya civakê encamên tirsnak tîne. Butçeyên nexweşxaneyan û yên navendên din ên ji bo tenduristîya civakê ji sedî 40 hatin qut kirin. Lê belê pêşwazîkirinên li servîsên lezgîn û pê re jî, rêjeyên bikaranîna rêbazên derî-bijîjkîyê zêde dibin. Gelek kes didin zanîn ku derman êdî an jî piştî demeke nêz, wê nema bên belav kirin.. Rojnamevanek bi hêrs wiha dibêje: *"Bavê min, bi nexweşîya parkînsonê ketiye; her meh divê ew bi 500 ewroyan dermanan bistîne. Dermanfiroş pê da zanîn ku ew ê piştî demeke din êdî nikaribin dermanan bidinê, ji ber ku sîgorta, xwe ji navberê vedikişîne."*

Ji bo teserifa perê pansîyonê, dapîr û bapîran ji starmalan derdixin û dibin malên wan

Nexweşîyên laşî (nexasim jî yên dil) û gîyanî bi rêjeyeke tirsnak zêde dibin. Vekolîn û lêpirsînên li ser nexweşîyên vegir ên berî demeke nêz, nîşan didin ku dijwarîyeke sînornenas a jîyana rojane, ji ber deyndarî û betalîyê, dibe sedemê *"nexweşîyên gîyantengîyên mezin, xirabûna tenduristî û tengezarîya gîştî"* yên ku dikarin bibin îzahek ji bo zêdebûna wisa mezin a hejmara xwekuştinan. (3) Li gor hejmarên ne fermî yên ji alîyê parlementeran ve hatin ziman, rêjeya bûyerên xwekuştinê nisbet bi sala 2009ê di 2010ê de ji sedî 25 zêde bû û li gor wezareta tenduristîyê di yekemîn nîvsala 2011ê de ev rêje hilkişiyaye ji sedî 40ê, gava bi heman vedora sala berê re tê muqeyese kirin. Ev daneyên ji alîyê kovara *The Lancet* (4) ve hatin weşandin, balê dikşînin ser hilkişîneke hêjayî serêşandinê ya fuhûşê û herwiha zêdebûna nexweşîyên vegir bi rêya vîrusa (immuno-déficience humaine) HIVê û nexweşîyên din ên bi rêya têkilîyên cinsî mirov ji hevûdin digirin. (5) Hejmara kesên bêmal û bêstar ti caran ewçend bilind nebûbû û profîla kesên ji ber vê yekê şerpeze dibin, her diçe diguhere: *"Berê bêhtir kesên alkolîk, toksîman û nexweşên hişî bûn; niha, kesên bêmal û bêstar êdî zêdetir ji kes û malbatên ji sinifa navîn, ciwan û kesên hinek xizan pêk tên."* (6)

Ji qewlê xebatarekî civakî ve, mirov çawa dikare ji nav krîzeke wisa dijwar û hetta *"dirinde"* xwe rizgar bike? Civaka ku di nav halê xwe yê bi êşûazar de hatî hiştin, îro êdî bêpar e ji çavkanîyên têrker ên ku ji bo pêkanîna rola piştgirîya malbatî ku bi awayekî keveneşopî di rewşên wisa dijwar de dibû paldankeke parastina dewleta sîvîl. Pir kes dixwazin welatê xwe li cih bihêlin û yên dikarin jî diçin. Ji bo kesên din ên mayî jî rêyên cihêreng sînorkirî ne. Ew carna berê xwe didin hêla sêra ku destekê dide wan bi organîzekirina xwarinên girseyî û alîkarîyên pêwîst li xwecihan belav dike... Li Selanîkê, Chancelierê Métropola ortodoks, keşe **Stephanos Tolios**, her roj bi dehan kesên hêvîşikestî tên jê daxwaza kar dikin, pêşwazî dike. Ma ew dikare çareyeke çawa bibîne li hemberî ewçend dûvên direj ên dosyayên xwe jê re tînin û roj bi roj hejmara wan zêde dibe? Li gelek bajaran (Volos, Patras, Heraklion, Athènes, Corfou, Salonique), şênîyan bi afirandina pergalên xwecihî yên pevguhertina pêwistîyên xwe, ji xwe re aborîyeke derveyî pergala heyî ya aborî, pêk aniye. Lê belê ev hewldan jî nikarin xwe bigihînin asteke alternatîf. Rewş wisa dijwar e ku malbat êdî dapîr û bapîran ji nav dezgehên berê hatibûn bi cihkirin, dertînin dibin cem xwe û 300-400 ewro berdêla pansîyonên wan ên xanenişînîyê werdigirin ji bo ku karibin xwe pê xwedî bikin.

"Hovîtîya zanistî" ya hişkîya ji alîyê bijarteyên netewegir ve tên ferz kirin

Ti welat wê nikaribûya li hemberî şokeke wisa li ber xwe bida. Yewnanistan ji yên din kêmtir: Ew ne amade bû ji bo xwe bide ber encamên civakî û tenduristî yên dijwarîya aborî ya ku bijarteyên wêdetirî neteweyî û navneteweyî li ser ferz dikin. (7) Wê ne wext, ne jî derfet dîtin ji bo pêşvebirina pergaleke parastina civakî ya maqûl û derfetên heyî jî heba dibin. Di ser de jî, pergala mişterîgir, ku rûyê din ê dewleta ji mêj ve kapasîteyên wê qels in, veguherand kunêrekê, ev birîna ku wê berê başkirina wê mimkun bûya. Ji zanîngeha Arîstote a Selanîkê û herwiha berpirsyarê dezgeheke destwerdana dermanî, ronakbîr **Sotiris Laïnas**, vê çavdêrîyê parve dike: *"Niha êdî her tişt hildiweşe"*.

Alîkarê serokwezîrê berê –yê Georges Papandreou– bi hewldana teserûfkirina bi armanca bicihanîna daxwazên Troïka (Yekîtîya Ewropî, Fona Diravî ya Navneteweyî û Bankaya Navendî ya Ewropî), 210 xetên butçeyî yên wezareta tenduristîyê ji holê rakirin. Bi vê yekê, wî gelek dezgeh (mezin û piçûk) û bernameyên kolanê jî mehkûm dikirin. Bêyî li berçav girtina kalîteya wan a muhtemel, wî ew yek dikir û ew ji ber vê yekê xebata ekîbên bi rastî jî bi feyde û gelek caran jî zarûrî (di nava Federasyona Panhellenîk a Nexweşîya Alzheimer, bo nimûne) dixe nav xeterê. Desttêwerdana hêzên derve yên ku zêdetirî sî sal in, projeya jihevxistina dewleta civakî bi rê ve dibin, bi vî awayî ji alîyê aktorên ji mêj ve ye bûne beşeke girîng a pergala mişterîgir, bêtesîr û riziyayî ve di asta neteweyî de jî dikeve meriyetê.

Weke ku vê jî têrê nedikir, pêla mezin a êrişên li dijî sinca purîten a ku yewnan, ji ber wê yekê eynî mîna lîderên xwe, wê xwe sûcdar dîtibin, berpirsîyarîya buhranê dixe stûyê gel. Rêbaz dîsa ya berê ye: Bes e ku hin komên civakî bên reş kirin û mohr kirin û di nav raya giştî de teşhîr bikin. Bêyî cudahîyên piçûçik jî, karmend, bijîjk û bazirganên tên guman kirin ku ji bacê hinek direvînin, di rêza pêşî ya hedefê de ne. Halbû ku civak ne ku ne haydar e ji çavkanîya pirsgirêkê –berî her tiştî ji *"pergalê û rayedaran"*– tevî ku zêde nizane wê çi bike.

Rizîn û mişterîgirî xwedî rehên kûr ên dîrokî ne. Yewnanistan ti caran nebûye xwedî dewleteke nûjen a ku bi burokrasiyeke heta cihekî xweser çerxa wê tê zîvirandin a guh nade berjewendîyên taybet û welatîyên serdest. Welatê li kevîya pergala navneteweyî ya ku ji dîroka serxwebûna wê 1830ê ve dezgehên wî ji derve hatine wergirtin û ji alîyê hêzên bîyanî ve bicihbûna wan hatine ferz kirin, (8) serxwebûna wî jî hertim girêdayî têkilîyên hêzên navneteweyî ve maye û di nav aborîya sermayedar de ketiye rewşeke girêdayî. Serxwebûna wî bûye mîrasgira vê modela siyasî ya sûnî, hê ji destpêkê ve, dibe kerasekî nixumandina civakeke kevneşop û perçebûyî, sazkirî li derdora feraset û adetên xwecihî, malbata berfireh, gund û nirxên herêmî. Doh jî îro jî, pergala wî otorîter û pir navendkirî, hişk û reqkirî ye beramberî veqetîna hêzên deshilatê li hemberî daxwazên xweserîya xwecihî an jî demokrasîya têkûz û biserûber. (9) Mişterîgirî û rizîn tê de zevîyeke bi xêr û ber dibînin ji bo ku hertim karibin xwe mayînde bikin. Ew bi kêrî berjewendîyên bijarteyan tên û serdestîya wan zexim dikin. Welatî jî xwe radigirin li vê rewşa ku êdî wan jî xwe fêrî wê kiriye.

Yewnanîyên li hemberî xwe û welatê xwe rexnegir, herçendî bi vê yekê serbilind jî xwe dibînin, ti caran nebûn mîna kesên saf û kawik. Lê belê ew ji derfetan bêpar in. Ji qewlê **Cornelius Castoriadis**, şênîyeke ku heta îro *"bi qasî pêwîst nekariye civateke siyasî saz bike"*, (10) gelo dikare modeleke çawa ya civakê xeyal bike? Dîsa weke ku bi zimanekî pêkenokî **Lainas** dibêje, gelo ew ê bixwaze *"vegera berî krîzê, serdema ku mirov di nav derewan de dijîyan"*, ya ku ew ê nikaribe xwe lê ragire: Şok zêde dijwar e û – ev e ya herî bi tesîr – bi bangên hercar yên ji bo nîzam û pergalê, tê vegotin. Vekolînên alîgir ên dema sazkirina hukûmeta nû ya di bin serokatîya **Lucas Papademos** de, rêveberê berê yê Bankaya Yewnanistanê yê ku serê mijdarê li şûna **Papandreû** weke serokwezîr hat tayîn kirin, li cem beşeke civakê dibin sedemê peydebûna hestê ku wê baştir be ku şûna sinifeke klasîk a teknokrat a nefretkirî teknokrat li ser deshilatê bin. Ev yek bi ti awayî nayê wateya pejirandina bernameyên kemerşidandinê, lê belê bêhtir tê wateya daxwaza livûtevgereke ji bo guherîneke kokdar. *"Dîktatorekî bîyanî"* (*"podestà forestiero"*), (11) ev vegotina **Mario Monti** ya têkildarî daxwazên Bankaya Navendî ya Ewrûpî, berî ku ew bi xwe li Îtalyayê bibe serokê konseyê, ji bo hin kesan tê wateya temînateke hukûmeteke durist û jêhatî ya ku ji bo berjewendîyên welêt tevbigere.

Gelo ew ê bi rastî jî wisa tevbigere? Gelek sedem hene ji bo mirov ji vê yekê bikeve gumanê. Piştî ku bawer kirin ku wan xwe ji rêveberan rizgar kirine, dibe ku yewnan êdî nema bizanin ka ew ê li dijî kê serî hildin. **Laînas** vê tesbîtê dike: *"Dijmin tine. Hukûmet tiştekî ne li ber çavan e, ev bi xwe ye hêza wan. "FESF"*. (12) *Dibe ku dijmin tiştekî neberbiçav be, lê belê bedbextî tiştekî xuya û reel e. Ew jîyana te ji te didizin. Ew min ji paşerojê bêpar dihêlin."*

* Lêgerînerê Navenda Neteweyî ya Lêkolînên Zanistî, CNRS, li Navenda Ewropî ya Civaknasîyê û Zanista Siyasî ya Sorbonneê (CESSP)

1 "Bûyerên şideta navmalbatê sê qat zêde bûn", *I Simerini*, Chypre, 16 adar 2011; "Zêdebûna xirabtevgera li himberî zarokan û tehdîda xizanîyê li ser zarokan", www.tvxs.gr, 15 nîsan 2011

2 Di rêya arizîkirinê de, şirketa rêyên hesinî di çarçoveya planeke kêmkirina kedkaran de ev prosedur pêk anî

3 Lêkolîna hê neweşandî ya Enstîtuya Zanîngehî ya Tendu-ristîya Gîyanî, a ku di 2011an de ji meha sibatê heta nîsanê hate meşandin. Binêrin li *Eleftherotypia*, Atîna, 5 cotmeh 2011

4 Alexander Kentikelenis et *ali.*, "Health effects of financial crisis: omens of a Greek tragedy", *The Lancet*, Londres, 22 cotmeh 2011, cild. 378, hej. 9801, r. 1457-1458, li ser navnîşana www.lancet.com

5 *Cf.* "Risk of HIV outbreaks among drug injectors in the EU", European Monitoring Centre for Drugs and Drug Addiction, Lîsbon, 14 mijdar 2011, www.emcdda.europa.eu

6 Lêkolîna rêxistina der-hukûmetî (ONG) Klimaka, Athènes. Binêrin li nivîsa "Greek crisis creates thousands of middle-class homeless", www.monstersandcritics.com 9 cotmeh 2011

7 Vegotina Karl Polanyi, *La grande transformation*, Gallimard, Paris, 1983

8 Piştî şerê serxwebûnê (1821-1830), lihevhatina Londonê ya di 1832yê de qralîyetekê li Yewnanistanê ferz dike. Ji alîyê hêzên mezin ên ewropî ve weke qralê pêşî Otto de Wittelsbach, mîrê Bavière, tê hilbijartin. (Fransa, Rûsya, Gewre-Brîtanya). Ew dimînin weke hêza berdewam a desttêwerdanê

9 Binêrin li Nicols P. Mouzelis, *Modern Greece. Facets of Underdevelopment*, Macmillan, London, 1978

10 Cornelius Castoriadis, "Em ji dîroka xwe berpirsîyar in", di "tevgera yewnan a ji bo demokrasîya rasterast", *Collectif Lieux Communs*, n° 18, îlon 2011

11 Mario Monti, "Il podestà forestiero", *Corriere della Sera*, Milan, 7 tebax 2011

12 Ji bo "Fonên Ewropî ya Aramîya Diravî".

Wergera ji fransî: Baran Nebar

www.arsivkurdi.org

Konseya Neteweyî ya Derbasbûnê (CNT), a ku weke deshilata navendî ya Libyayê tevdigere, ji alîyê gel ve zêde nayê qebûl kirin. Konseya ku ne xwedîya rewatîya rêvebirina tevgera hilweşandina dîktatorîyê ye, ti hêza wê ya çekan jî tine, vê gavê çek hemû di destên mîlîsan de ne. Ji nû ve avakirina dewleteke hiqûqê bi mîlîtarîzasyona civakê, bi çeperên nasnameyên eşîrî û olî û herwiha bi desttêwerdanên hêzên bîyanî re rû bi rû dimîne.

ZÊDEBÛNA NAVENDÊN DESTHILATIYÊ

Li Lîbyayê di şer de kî bi ser ket?

PATRICK HAIMZADEH *

Di 5ê vê mijdarê, erefeya cejna El-Edha (Cejna Qurbanê) de, nîştecihên Trablûsê berî her tiştî bi lêgerîna li gor kevneşopîya îslamîyên wê bên qurban kirin ve mijûl in. Kîloyek bi 25 dînarên lîbyayî (nêzî 20 euroyan) e, ango du qatê fiyeta berî şer; ji ber vê yekê gelek malbatan karî ancax sewaleke ji Tirkiyeyê îtxalkirî ya zêde nayê ecibandin bi fiyeteke erzantir peyde bikin. Tevî ku rojane jîyan asayî xuya bike jî, ji ber bûyerên ku bênavber di nav komên çekdar de rû didin, bi şev hertişt pir bilivûtevgertir e.

Van rojên dawîyê, di navbera nîştecihên çekdar ên hin taxan û ***throuwar***ên (1) bajarê ***Zîntan***ê de şerûpevçûnên çekdarî rû didin. Hêjayî gotinê ye ku yekîneyên yên dawîyê, li tenişt yên Mîsrata, û bajarên din ên Rojavayê Lîbyayê (Yefren, Jadû, Rûjban) di "rizgarkirina" paytext de bi roleke dîyarker rabûne. Bi 1200 zilamên xwe yên çekdar li ***Trablûsê, Zîntanî*** –ji dema veguhestina yekîneyên ***Mîsrata*** li enîyên ***Benî Welîd*** (2) û Sîrteyê, û vegera yekîneyên din ên eskerî ber bi bajarên jê hatibûn– hêza eskerî ya herî girîng a paytext e. Zîntanîyên ku piştî sê rojên bi şer û pevçûnê, di meha tebaxê de avêtin ser derûdora balafirgeha navneteweyî ya Trablûsê û qesra herî fireh a **Mûemmer Qeddafî** û baregeha yekîneyên wî yên ewlekarîyê, ji alîyê *Konseya Neteweyî ya Derbasbûnê* ve hatin wezîfedar kirin da ku ewlekarîya herêmeke bi qasî 25 km derûdora balafirgehê dide ber xwe, pêk bînin.

Şefê wan, **Muxtar el-Exder**, kesayetîyeke manewî û pêşeng ê serhildana *Cebel Nefûsa* ye. Ji dawîya meha adarê ve wî di hemû şeran de cih girt. Ew, berî destpêkirina şer, di şirketeke piçûk a erebeyan a ji bo şirketên petrolê, midûr bû û ji bilî dema xizmeta xwe ya eskerî, ti tecrubeya wî ya şervanîyê tinebû. Di salên 1980ê de wî jî weke gelek ciwanên lîbyayî yên ji nifşê xwe li bakurê ***Çad***ê di nav yekîneyên eskerî de hatibûn bi cih kirin, wezîfa xwe ya eskerî bi cih anîbû. **El-Exder** wezîfa xwe ji dilûcan bi cih tîne û bi serbilindî îzah dike ku serokê *Konseya Neteweyî ya Derbasbûnê* ***CNT***ê **Mustefa Ebdulcelîl** ê ku berî çendekê li Trablûsê li nav taxên zanîngeha berê ya *Banga Îslamî* ya li herêma wî ya jê berpirsîyar e, bi cih bûye, ev wezîfa ewlekarîya derve ya vê wargehê spartiye wî.

Eger 7ê mijdarê ji bo wî rojeke girîng e, ji ber vekirina yekemîn xeta rêyên hewayî ya bazirganî, ku şirketa ***Turkish Airlines*** bû, yekemîn wergira rêwîyan ji bo firîneke ji ***Stenbolê*** bû. Bûyerên şeva berê jî ji bo wî têra xwe girîng bûn, ji bo ku bi wan ve mijûl bibe. Gengeşîyeke navbera ***thouwarên*** zîntanî û ciwanên taxa ***Hay el-Endelûs***, bi carekê ji kontrolê derket û hêzên her du alîyan bi desteka kamyonet û çekên giran ji bo şerekî mezin hatin pêşberî hev û dawîya dawî ji bo pêşîlêgirtina şerekî dijwar ew bi xwe neçar ma li cem berpirsyarên konseyên eskerî (3) yên taxê dest werde vê rewşê.

Gunehên xwe bi şkestîyan neynin

Bûyerên bi vî rengî ku hin ji wan bûn sedemên mirin û birîndarbûnê (bi taybetî di navbera mîlîsên fermandarê eskerî yê Trabslûsê û cîhadgerê berê Ebdulhekîm Bilhac de), di hefteyên dawîyê de pir zêdetir bûn. *Thouwar*ên Zîntanî êdî dibin sedemê tundbûna nerazîbûnên gelek Trablûsîyên ku wan weke diz û serserîyan dibînin û dixwazin ku ew bajêr terk bikin. **El-Exder** qebûl dike ku hin ji zilamên wî şaşîyan dikin: *"Thouwarên min ne melaîket in. Hin serserîyên ku zêde alkolê vedixwin jî, dibin sedemên hin bûyerên ne xweş ên ku li bajêr zêde bûne".* Ew dide zanîn, dike ku wî ferman daye fermandarên di bin emrê xwe de da ku cezayên pêwist bide sûcdaran û eger pêwist be hin ji serkêşên bûyeran ji yekîneyên xwe bavêjin.

Piştî çend saetên din, ew li parka mezin a ku qesr –ji alîyê NATOyê ve bombebarankirî– û konên Qeddafî dorpêç dike, diçe cejneke *Rêxistina Lihevhatina Neteweyî*, ya ku di dawîya tebaxê de ji alîyê eşrafekî bajêr ve hat ava kirin. (4) Jin û zarokên bi eslê xwe ji ***Tawurgha, Maşaşiya*** û ***Gawalîş*** a ku bi hilweşîna rejîmê re, neçar man ji bajar û gundên xwe yên ku destek dabûn **Qeddafî**, reviyan, ji bo çend seatên vehesîn û bêhnvedanê dawetî vê derê hatine kirin. Li derdora sifreyên xwarinên cejna kevneşop, nêrînên endamên rêxistina dilovanî û xêran, ên ji bajarên cihêreng ên peravan û yên *thouwar*an berevajîyên hev in. Yên pêşî destekê didin fikra ku êdî wext hatiye ku *thouwar* Trablûsê terk bikin û tevlî artêşa neteweyî bibin. Yên duyem jî difikirin ku *thouwar* ji bo "pêkanîna ewlekarîya" bajêr pir pêwist in û wisa bawer dikin ku propagandaya li dijî *thouwar*an ji alîyê **Ebdulhekîm Bilhac** ve tê meşandin.

Madem ku ew bixwe di şer de bi ser ketine, ti sedemê nabînin ka ew ê çima bikevin bin fermana generalên artêşa neteweyî ku generalên berê yên rejîma **Qeddafî**, an jî dijberên bîyanî ne. Li gor **El-Exder**, divê her tişt were guftugo kirin: Rutbe, heqdest, berdêla heşt mehên xizmetê, ji bo kesên ku naxwazin di nav artêşê de eskerîyê bikin kar an jî bûrsên perwerdê. Ew dixwaze bi parêzvanên berjewendîyên zilamên xwe û yên eşîra xwe ya ku ketiye nav pêşbazîya ji bo bidestxistina deshilatê; nav daxwaza zêdekirina tesîra xwe û bidestxistina çavkanîyên (nemaze petrolê) ku îro li welêt sedema dek û dolabên dijberan e.

Wekî din destberdana ji Trablûsê û spartina wê bo **Bilhac** (ê tê gotin ku hejmara mîlîsên wî ji sê sed kesan ne zêdetir e) ne mijara gotinê ye. Ev mijara dawîyê dibe xala lihevkirinê ji bo hemû vexwendîyan ku li gor wan **Bilhac** cîhadgerekî bengîyê deshilatîya siyasî ye û ji desteka hundir bi temamî bêpar e. Ew weke "zilamê mohrê" tê bi nav kirin, lewre tê gotin ku ew bêyî ku tevlî şerê li dijî rejîmê bibe, bi mohra xwe ya walîyê eskerî yê Trablûsê, li gel ekîba ***El-Cezîre*** hatiye Trablûsê. Ji nêrîna wî ya tûj a Îslamê, ya ku ji bo adet û kevneşopîyên bajêr pir bîyanî ye û ji hîmayekarê wî,

YEHYA AL SELO: **Reng**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 70 x 50 cm

Emîrê Qadarê yê ku bi desttêwerdana nav karûbarên navxweyî tê sûcbar kirin, ti kes ne razî ye. Beramberî wî, **Ebdulcelîl** bixwe bi serwextî, xweşbînî û vîna xwe ya ji bo parastina nasnameya kevneşopî û îslamî raxistiye pêş çavan, li gor nêrîna gelemperî, mirovekî adil e.

Li gel vê yekê jî lihevkirineke neteweyî ji bo demeke nêz xuya nake. Kêm kes serê xwe bi rewş û aqûbeta rûniştivanên gund û bajarên ku ji ber desteka dabûn rejîma niha hilweşiyayî, diêşînin û halêhazir bûne mexdûrên êrişên tolhildanê. Li ser rêyan, li nav bajaran, nêçîra erebeyên bi plakayên ***Sîrte*** an jî ***Benî Welîd***, bûye karûbarekî berdewam û birêkûpêk, rêwîyên di wan erebeyan de di kontroleke tund û dijwar re tên derbas kirin û carna tên şelandin û hemû tiştên wan tên desteser kirin. Penaberbûyî li ba hin xizmên xwe yên li taxeke Başûr-Rojhilatê Trablûsê ku nîştecihên wê bi piranî ji eşîra *Werfella* ne û li wê derê her şev li ser dîwarên xanîyan sloganên ji bo dilsozîya **Qeddafî** tên nivîsandin-, endamekî eşîra ***Werfella*** ya **Benî Welîd** di cotmehê de bûye şahidê talankirina mala xwe ji alîyê *thouwar*ên *Mîsrata ve* û wiha diaxive: *"Em ê ti caran ji bîr nekin. Em ji bo hildana tola xwe li benda fersend û wextê ne".* Bêyî liberçavgirtina êş û azarên têkçûyîyan û ne jî wergirtina tedbîrên ji bo parastina wan, pir zehmet e ku mirov bi pêkanîneke dema nêz a "lihevhatina neteweyî" bawerîyê bîne ya ku li ser zarê berpirsîyarên siyasî yên CNT bûye benişt, ku ti hêza wê ya kontrolkirinê li ser yekîneyên *thouwar* tineye.

Em ji hêla başûr ber bi ***Zîntanayê*** ve diçin. Yekemîn bajarê em tê re derbas dibin, ***El-Ezîziye,*** keleheke eşîra mezin *Werşefane* ye. *Werşefaneyîyên* kêm an jî zêde, bi awayekî aktîf heta nîvê meha tebaxê destek dan rejîma **Qeddafî**, ji ber vê yekê weke serhildêrên saeta dawîyê tên dîtin. (5) Li ***Cebel Nefûsa***, rê zêde ne dûrî du gundên *Riyayna*yê ye. Ev her du gund bi awayekî bûne sembola xeta jihevqutbûneke kûr a di dema şerê navxweyî de pêk hatiye: Gundê El-Riyayna El-Şerqiye (Riyayna Rojhilat) pir zû û hê ji destpêkê ve tevlî serhildanê bûye, gundê El-Riyayne El- Xerbiye (Riyayna Rojava) jî heta dawîyê destek daye **Qeddafî**. Ev gundê dawîyê îro êdî bûye mîna wargeheke xeyaletan -xanîyên şewitandî, derîyên şikandî, dikanên talankirî-, gundê cînar jî tam berevajîyê wî, ji niha ve vegeriyaye jîyana xwe ya asayî. Sloganên serbilindîyê yên zîntanîyan li her derê ne û bi lezûbez tên nivîsandin ji bo ku gelek caran sloganên serbilindîyê yên eşîrên îro êdî şkestî, binixumînin.

Bajarê Zîntan axirî weke bajarekî serdest ê herêmê xuya dike. Ew bûye wargeha biryargeha *Konseya Eskerî ya Herêma Rojava*, ku ji bo lidarxistina operasyonên li *Cebel Nefûsa* û amadekirina êrişên li hemberî paytext, bûye xwedî rola sereke. Ji bo nifûseke bi qasî 35 kesî, li bajêr 3 hezar *thouwar* hene. Bi hejmara *thouwar*an ev der bajarê herî eskerî yê Lîbyayê ye. Hûn ji **El-Exder** bipirsin, bi qasî 1 800 *thouwarên* zîntanîyî hene û li heft wargehên girîng ên petrolî yên herêmê û wekî din li ***Oubarî***, devera ku halêhazir ew bêçekkirina *Touaregs*ê guftugo dikin, hatine bi cih kirin. *"Em nikarin li hemberî Mîsratayê bikevin nav pêşbazîyê, ku bi 300 000 nîştecihên xwe, 12 hezar thouwarên wê hene, lê belê, karûbarên me yên cihêreng hene. Ji ber vê yekê me dil nekir ku em ji bo desthilatê hevalbendîya zilamên wî bikin û êrişê bibin ser* ***Benî Welîd.*** *Em dixwazin têkilîyên xwe yên baş li gel werfellayîyan biparêzin ku kevneşopîyeke demdirêj a hevalbendî û cîranîya baş me bi wan ve girê dide. Ji bo nîştecihên Mîsratayê, berî her tiştî, ya girîng ew bû ku tola bajarê xwe yê dorpêçkirî ji warfallayîyan hilînin; yên ku li himberî wan demeke dirêj e di nav reqabetê de ne. Her çi parastina bîrên petrolê ye, em yên herî baş bûn ji bo misogerkirina vê yekê, lewre em jî xwedî adet û kevneşopîyên bedewî ne û em herêmên çolter heta* ***Oubarîyê*** *baş nas dikin. Nîştecihên din ên* ***Trablûsê*** *van herêman nas nakin, li wir wê nekevin nav serpêhatîyan".*

Dema mirov van vegotinan dibihîse, bivê nevê dikeve nav fikirîna li ser kevneşopîya cihêkarîya ku dîrokzan **Îbn-Xaldûn** (1332–1406) di navbera nirxên *bedewî* (*badou*) û yên bajarîyan (*hedar*) de kiriye. Ji ber vê yekê zîntanîn trablûsîyan weke kesên îtaatkar, durû û firsetbaz (6) dibînin û xwe jî weke kesên azad, wêrek û dilsoz tarîf dikin. Her çi trablûsî ne, ew jî rêzê ji wêrekî û dilsozîya wan re digirin, lê belê wisa bawer dikin ku dema aştî vegere welêt, nirx û adetên wan wê li jîyana bajêr neguncin.

Herî hindik bi qasî liherderbûna çekan, mîlîtarîzekirina ferasetan û vegera li nasnameyên kevnare (7) jî çavkanîya zêdebûna şerûpevçûnên çekdarî ne. Berpirsîyarên xwecihî bêguman red dikin ku vê yekê weke pevçûnên eşîrî binirxînin û ew tercîh dikin ku rewşê bêhtir weke bûyerên takekesî bi nav bikin û wan bixin stûyê *"stûna pêncemîn"* a bi sir an jî *"şanên di xew re çûyî yên qeddafîgiran"* ên ku dixwazin tovê veqetînê (*fitne*) bixin nav "gelê libyayî". Vegotina fermî a di slogana *"ji eşîrîyê re na, ji herêmgirîyê re na"* bi awayê herî kurt hatiye gotin, ev demek e ku li ser gelek afîş û panoyên paytext xuya dikin, di eslê xwe de ji xwezîyeke xwexapandinê ya xeyalan bêhtir ne tiştekî din e. (8)

Parastina sîvîlan, wisa digotin

Li paytext Trablûsê, **Bilhacê** ku xwe dispêre Qatarê û destekê ji *El-Cezîreyê* werdigire û zilamên wî yên bi eslê xwe ji Trablûsê, di asta îdeolojîk de hatine perwerde kirin û dîsîplîne kirin, dibe ku hewlê bide xwe li hemberî ***bedewî***yên "bêdîsîplîn" weke alternatîfekê bide pêş û bibe sedemê nerazîbûna ***bedewî***yan û herwiha bigewdebûna pêleke şidetê. Daxwaza tolhildana eşîr û herêmên ji alîyê serhildêran ve têkçûyî û biçûkxistî, ji ber ku destek dabûn rejîma **Qeddafî**, dibe ku dîsa veguhere şerûpevçûnên gav bi gav dijwartir.

Piştî derbasbûna heşt mehên bi şer û pevçûnan, berpirsyarên rojavayî hê jî napejirînin ku şerekî navxweyî ne dûr e û "parastina gel", ku **NATO**yê weke sedema rewakirina desttêwerdana xwe ya li Lîbyayê dertîne pêş, hê jî pir dûrî misogerkirinê ye. Serxweşîya serkeftinê ya pêşengên koalîsyonê yên ku êvara têkşikandina *Sîrte* û mirina **Qeddafî** weke *"serkeftina xwe"* pîroz dikin, îşareteke berbiçav e ji bo xemsarîya wan a têkildarî vî "gelê libyayî" ku wan bênavber îdîa dikirin ku ew dixwazin bi bombeyên xwe biparêzin. Bêserûberbûna rewşa ewlekarîyê û zêdebûna pevçûnên çekdarî li Trablûsê, li gel vê yekê dikarin bi carekê bînîn bîra wan ku serkeftineke eskerî di şerekî navxweyî de bi serê xwe ne tiştekî pir bêwate ye û ji bo "parastina şênîyên sîvîl" bi ti awayî ti rewşeke misoger saz nake.

* Dîplomatê berê yê fransî li Trablûsê (2001-2004), nivîskarê berhema *Li Dilê Lîbyaya Qeddafî,* Jean-Claude Lattès, Paris, 2011.

1 *Thouwar* pirhejmara *thaïr*, a ku tê wateya "şoreşger" e. Ew hertiha tê wateya endamên yekîneya gundan *(katiba)* a ku li dijî rejîma Qeddafî şer kir

2 Bani Walid peyayekî eşîra Warfala ye. Vê êşîra herî mezin a Trablûsê, bi piranî destek da Qeddafî

3 Halêhazir bi awayekî fermî 53 şewirmendên eskerî yên taxan li Trablûsê hene

4 Ev weqîf ji niha ve xwedî zêdetirî 5 hezar endaman e

5 Ji 10 heta 12ê mijdarê, warşafanîyan û milîsên bajarê peravê Zawiye, bi çekên giran şerê hev kirin û di encamê de 17 kes mirin û bi dehan kes jî birîndar bûn

6 Peyva erebî ya hatiye bi kar anîn muhtemelen tê wateya "yê bi kesekî din ve dizeliqe û hildikşe" (*moutasalliq*)

7 Bajarên girîng ên şoreşê ji niha û şûn ve her yek ji wan xwedî rojname û kanalên xwe yên televîzyonê (14 kanal ji bo tevahîya welêt) ne. Herwiha eşîrên mezin jî, her yek ji wan rûpeleke wan a Facebookê heye

8 Yek ji armancên sereke ya sûbayên ciwan ên azad ku piştî şoreşa 1969ê ji alîyê Qeddafî ve dihatin bi rê ve birin, jiholêrakirina fermî ya eşîrtîyê bû. Tedbîrên berbiçav ji bo wê yekê hatibûn wergirtin. Ji ber ku pir ne bi tesîr bûn, tenê çend salan berdewam bûn, berî ku Qeddafî ji nû ve eşîran ji bo deshilata xwe bike paldank. Nivîsa bi sernavê "Lîbya, şertûmercên yekîtîya neteweyî" bixwînin, *Le Monde diplomatique*, îlon 2011

Wergera ji fransî: Baran Nebar

www.nefsiyadiroj.org

Çi dibe gava stargeha herî ewle jî xwe di nav tofanê de lerzokî dibîne? Çarşem 23yê mijdarê, sermayedaran bi dana deynekî alman ê xezebeke nedîtî, hêrsa xwe dîyar kir. Bi ketina nav davika wan, bazara ku tedbîrên tund dixwest, êdî ji alozîyê dikeve gumanê. Li hember van dek û dolaban, hewl didin bersivê bidin ''lûtkeyên'' ku pir zêdebûna wan bi kêrî tutiştî nayên.

EWRO, ŞEWIŞÎNA BERÎ HILWEŞÎNÊ?

Li ser kaşkaşoka krîza ewrûpî

FRÉDÉRIC LORDON *

Ji nasîna ezmûnî tê zanîn ku mirov dikare pir caran û bêyî ku jê bikerixe, careke din bixwaze li **Laurel**ê pasteya nerm davêje ser devûrûyê **Hardî** (an jî Hardî davêje ser devûrûyê Laurel) temaşe bike –baş e, ji civînên bilind ên ewropî jî mirov nakerixe?... Ji ber şaşîya kambax a teqdîrkirinê, herçendî bi dilpakîya têkoşîna li dijî bedbextîyê be, weke ku Yekîtîya Ewropî (mirov dikare G20ê lê zêde bike) fikirîbe ku komîkîya xwe-pirbarekirina çekeke li dijî krîzê bû. Jixwe mirov hîpotezeke din jî nabîne ji bo tarîfkirina vê zêde pirbaretîya li nan pêkenok-karîyê ya ku bûye yekane xeta zexm û zelal a rêveberên ewropî yên ku wekî din bûne mîna kerrûgêjan.

Divê were qebûl kirin ku, di nav stûnîrê her diçe zêdetir şidandî de (şoka mezin a xitimîna piştî krîza diravî, kontrola berdewam ya siyasetên aborî ji alîyê bazarên sermayedaran ve, serxwebûn û bizdonekîya bankaya navendî ya ewropî, obsesyonên ortodoksî yên alman, nebûna serwerîyeke yekpare), tarîfa niha ya nasnameya ewroyê bi temamî li derveyî derfetan e.…

Eger ev ne bîrbirina bi awayê **Laurel** û H**ardî** be ya ku îro li ser Ewropayê bûye serdest, bi îhtîmaleke mezin ya Ezîz **Augustin** e: "*credo quia absurdum*" –"ez bawer dikim ji ber ku tiştekî ecêb e". Û di eslê xwe de pêdaketina wisa sînornenas û bi hişkebawerî ya beramberî û li dijî tinehesibandina heqîqetê, tişta herî dawî ye ku bi rastî jî tesîrê li Ewropayê dike. Çawa be, em di wê yekê de hê ancax gihîştine pêncemîn lûtkeya Ewroherêmê (1), beşa augustînîgir a di averêbûnan de înadê dike û beşa komîk a pirbarekirina daxuyanîyan ên xwepîrozkirina ji ber nihayet peydekirina çareserîyeke global (têgihîştbar) ji bo pirsgirêkên herêma ewro … berî ku hertişt di cara din a di rêzê de were dubare kirin. Tê zanîn ku gel xwedî meyla îsrafkirinê ye, ji ber vê yekê, bi her halî sendîkaya pêşeng pêdivî dibîne ku pêşangehê, bi pêşkêşkirina bûyerên gav bi gav zêdetir bi heyecan venû bike (dezgehên nû, welatên nû yên bên rizgar kirin, rehên nû yên rêyên diravî, taahudên bênavber mezinîya wan zêdetir dibe û hwd.) Bi rastî jî nema êdî zêde kes dixwazin bikenin, hetta, li lûtkeya dawî ya Eurogruba 27ê 2011ê jî, ku pêkanînên pir mezin (û hertim têgihîştbar) wê hefteyekê jî wext negirin ji bo careke din bi referandûmeke yewnan a ku bikeve navberê, dakevin asta nêzî sifirê û bibe xwedî encameke mutleq.

Di rastîyê de û wisa xuya ye ku ev li vir herwiha dibe taybetmendîya serdemeke ku bi tenê wê bi awayekî qismî bi krîza salên 1930ê re were mûqeyese kirin, reaksîyonên hukûmetan dibin xwedî cotkarakter, herçendî nakok xuya bike jî, kaoseke ku tê de xweber gengeşîyeke kes ji kesî tênagihe dibe sedemê bûyerên niha rû didin û bicihbîna keysperest, lê belê pir birêkûpêk a rojeveke neolîberal a neguhêrbar. Divê di serê mirov de ev nakokî hebe, ji bo mafdar nîşandana hem lûtkeyên "Helzapoppin" hem jî nermîya stratejîk a bi tesîr ya ku destûrê dide pergala heyî ya ji bo derxistina avê ji cihê herî kûr ê krîza (wê) fersenda kûrkirineke dîrokî ya berê ti caran nehatiye dîtin. Aheng û ne-aheng di vê pêvajoya ku mirovan şaşûmetel dihêle de êdî wekhev in û di wê serdemê de perîyoda qedera neolîberalîzma bi awayê sala du hezarê ya xewirandin, an jî teqîna di dizîyê de bi roleke mezin radibin.

Tekîner wisa dizanin ku fît dibin gava ku berdêla berûda ku li pey xwe avahiya hilweşiya dihêle didin

Berjewendîyên bên ji bîr kirin wisa xurt in ku divê bênavber were bi bîr anîn ka çiqas bûyerên îro xwe dispêrin krîza kredîyên desteserkirî. Ev bixwe jî îfadeyeke şahane ye ji bo bigewdebûna seryamedarîyê ya di navê de komkirineke bêtarîf a meaşan weke çareserîya desteka daxwazê, li pey xwe bi tenê deyn û bar giran kirin. Herçendî, bi rizgarkirina bankayan û bêlivbûna desttêwerdayî de, dewletê hew dît ku ketiye nav rewşeke têkçûyî, li pey pelişîna diravî ya arizî… zêde bextiyar ji ber xwe veguherî krîzeke diravî ya gelemperî. Hingê ji hêla G20ê ve û di weşanên wan ên 2009ê de (***London, Pittsburgh***), beşa "***stop-and-go***" ya civînên bilind vedibe. Lê belê ma ev qîrînên serkeftinê yên li baloyeke bi hev re ya rêveberan û şirovekaran êdî tên bîra kê, ku xuya ye dibûn hêmanên bêhnfirehkirinekê, nisbet bi tirsa ku di payîza 2008ê de ew şaşûmetel kiribûn gava ku ew çend nêzîkî ber kendalê bûbûn? Bi rastî jî baştir e mirov wan daxuyanîyên serkeftinê neyne bîra xwe, sozên bi serûberkirina diravî (yên xwedî rûçikekî baş di 2011ê de gava pergala bankayî ji nû ve gefa hilweşandineke serdanpê dixwe) û misogerkirinên weke *"krîz niha li pişt me ye"* yên ku mirov bi dudilî wan dixe nav kategorîyên tevdaneke bicoş a zarokane, an jî eletewşîyên sînornenas. Wê salek jî di ser vê bûyerê re derbas nebe, ji bo ku careke din bawişka nû bi awayekî cidî xwe bide bihîstin û dîsa ji bo ku jihevketina aborîya gelemperî ya yewnanî bi awayê herî xirecir xwe bide der û bimîne weke fitloneka herî xirab a tevahîya dîroka siyaseta aborîyê. Ji bo kêlîyekê be jî hatibû bawer kirin ku hukûmetan zanîbû ji şaşîyên berê, bi taybetî jî ji felaketên *Depresyona Mezin* dersan derîne, lê belê qet jî wisa nebû! Qebûlkirina valahîyên di butçeyê de bi lîstika îstîqrarkarên otomatîk (2), yekane stratejîya ji bo navîndemê ya mumkin, (ne wesayeta sergêjker a bazaran bû) wê salekê nedome. Û Yewnanistanê xwe spart bahaneya îdeal a baş bicihbûyî ji bo wergerandina her cure amûrên siyasî yên butçeyî û bi awayekî teqerek ji pratîka ku pala xwe dida valahîyên butçeyî derbasî şirketê bû, bêyî hêvîya daketineke mezin.

Ji bilî kesên ku wê bi israr weke "berpirsîyar" bên bi nav kirin, ji niha û şûn ve êdî bi tenê zêde tê zanîn ku –ew di destpêkê de zelal bûn– sedemên ku stratejîya kemberşidandina giştîkirî dibin têkçûn: Bêîmkanîya ji bo her kesekî cuda cuda telafîkirina zirarê, li ser daxwaza derve fetisandina daxwaza hundir, dîyardeya ku hemû derdorên din heman hişkîyê tercîh dikin, dibe sedemên daxistinên mezinbûnê, bo nimûne windahîyên reçeteyên bacî, tesîra kêmkirinên lêçûnan hildiweşînin. Li bin awir û zexta, sermayedarên navneteweyî ku asoya wan a wextî li gel navîndema pêwist a lihevanîna makroaborî ya berfirehîyeke wisa qet nagunce, her tişt cihê xwe digire. Dûre ev zincîreya eletewş a ku di nav de bilindbûnên rêjeya faîzê yên nehefsarkirî, hilpekînên panîka mezin, erzanîyên bêserûber ên butçeyî (servîsa deyn zêdetir dikole valahîya butçeyê ya ku li alarmê dixe ji bo fînansa ku hildikşîne jor rêjeyên faîzê yên xizmeta deynê jî zêde dikin …), a siyasetên aborî, bi kûrkirina kêmkirinan bersivê didin … û deynên –car caran ***Standard&Poor's*** an jî ***Moddy's,*** şirketên tekûz ên coşdayînê, desteka xwe ya hêja ya bacî didin avhewaya hêçîtîya giştî. Bilindbûna rêjeyên faîzê ya ji ber panîka diravî û bertekên averêbûyî yên siyasetên aborî, vediguherin sînerjîya jehrkirî ya ku rêza lûtkeyên ewropî her carê wan bi dijwarîyên mezin re rû bi rû dihêlin.

Bi xetereya ketina nav nakokîyê be jî, ev xeta kaosê du qat zêdetir hilkişiya ser xeteke stratejîk a ku di her derenceyê de dibe şahida mezinbûna bêserûberîya lihevkirina mezinbûneke aborîyê ya paralel a pêşketinên neolîberalan. Lewre krîz ji bo herkesî winda nebûye. Û ne bi tenê ji bo bankavanên tevî îkramîye û qezencên xwe yên li hev par kirine, ji payîza 2008ê ve li keştîyê siwarbûyî ne. Dûrketina ji navenda balkişandinê ji dema teşqeleyên fînansa arizî ber bi *"pirsgirêka deynê gelemperî"* wê curekî hunera dêhn belav kirin, şelandin û dij-êrişê bigihîne asta herî bilind. Ne ku li alîyê deynên gelemperî tiştek naqewime –herçendî mirov wê kêm caran teqîneke ewçend bi heybet bibînin jî. Lê belê ti tiştek tine ku nekeve bin tesîra rasterast a krîza diravî ya taybet –û bankayên ku şensê wan heye ku êdî nekevin bin deynê civakê bi sedema ku alîkarên lezgîn hatin telafî kirin, xwe wisa didin xuya kirin; weke ku bêlivbûna aborî ya rû da û hilweşîna reçetên bacî û teqîna di valahîyên butçeyî de, ne berhemên wan bi xwe bin, dişibin teqemenîavêjên ecemî yên ku wisa bawer dikin bi dayîna berdêla barûdê fît dibe, lê belê ji bîr dikin ku li pey xwe avahîyeke hilweşiyayî dihêlin.

Fersenda ku ji destê bankavanan neçûye, ewçend ne mezin e ji bo jestîyonerên bûne mijarên rojeva neolîberal a ku qet nebe divê were qebûl kirin; ew hunera wê ya pêkanîna pêşketineke mezin ji krîza ku wê mohra xwe li pelişîna wê ya dîrokî dabe. Ya rastî ji mêj ve ye ku halûhereketên li ser mijara "deyn" li gor raporên **Pébereau** (3) an jî **Attali** (4) hewl didan qadê amade bikin û hişan ji bo ramana plankirî amade bikin. Lê belê hemû komedîyên gilîûgazinan, an jî lerizînên ji ber îflasa ku tê, nikaribûn têra biîtîbarkirina hebûna pirsgirêkeke bi tenê bikira –qet nebe heta sala 2008ê. Krîza diravgirên arizî ya ku bi awayekî berbiçav deynên gelemperî bilind kirin, ew bi xwe dikare vê yekê bike. Û ji ber ku "pirsgirêka deyn" ti caran ewqas bi awayekî objektîf bi gewde nebûbû, kombînezoneke derî rêzikan a stratejîstên keysbaz û bawermendin di rêza pêşî de kete nav qulê ji bo hawarkirina, bêsedem bi endîşe û bi rastî jî bi coş, ji bo lezgînîya –axirî– eyarkirinên mezin. Li bin rûpoşa bersiveke "aqilane" û "pêwist" a siyaseta butçeyî ya konjontureke taybet, di eslê xwe de ev stratejîyeke strukturel ya tengkirinê, mirov dikaribû weke jihevxissitinê jî bi nav bikira, dewleta civakî ya ku di bihara 2010ê de derdikeve holê û bi hêza rewşeke ku tê de lîberal bawer dikin, dikarin têra xwe encaman jê derînin ji bo tiştên heta niha derbas nedibûn, derbas bikin. Rêbazên ji rêzê yên biserûberkirina butçeyê jixwe dihatin nas kirin: Bicihnekirina ti kesî li şûna karmendên xanenişînkirî, daxistina meaşên wan ên hejmarî, qutkirinên bêwijdanî ji lêçûnên gelemperî, kêmkirina tiştên pêwist ên civakî, zêdekirinên baca bi navê ***TVA*** û hwd., lê belê ev konjonktura di radeyeke ti caran berê pêknehatî de destûrê dide pêkanîna wan. Berî zêdekirina guherîna çawanîya li tundkirina besît a çendanîyê. Ango, ne tesaduf e eger fikra biserûberkirina butçeyî, ya ku pêşî di despêka 2010ê de bi şeklê xwe yê *"asayî"* xwe da xuya kirin, ji 2011ê û vir ve bi formeke bilindtir a jê re *"rêzika zêrîn"* tê gotin, xwe nîşan da. (5) Ev yek di heman demê de bû hewldaneke ti caran kesî nedibîtibû ya pêkanîna dengeya diravên gelemperî, temamkirina depolîtîzasyonê û xewna neolîberal a biserûberkirina xweber a butçeyê.

Taybetmendîya herî bi tesîr a neolîberalîzmê, dîyar e ku kapasîteya wê ya xwedîkirina serkeftinên xwe bi têkçûnên xwe ye. Û lûtkeyên ewropî bi awayekî mukemel dibin şûna vê transmutasyonê –ku heta niha jî bi dawî nebûne. Lewre dijwarî bi xwe, herçendî bêyî ku li rewşa berê veger, bi awayekî heybet hatiye bi dest xistin, (tenê xeşîmîyeke zarokî dikare bawer bike ku ew "*ji bo derbaskirina kêlîyên xirab*" wextî û sînorkirî ye), ji ber vê yekê dijwarî wê bide dû heman aqûbeteke bi afat a mîna yên berê yên keşfên liberal…û heman jixwederbasbûna bi heybet. Vê carê bi rastî jî, divê hem tiştê ewçend baş di kadînê de hat parastin, were veguhestin, lewre dij-hilberînîya jehrî ya dijwarîyên ewropî yên koordînekirî niha zêde li ber çavan xuya dike. Ew ya sermayedaran e; sermayedarên ku tiştekî û tersê wê dixwazin –disîplîna butçeyî û mezinbûna aborî– … û bi awayekî metodîk ji alîyê dîsîplîna butçeyî ve tê kuştin. Ew dest pê dike, dibe hebûneke hukûmetan bi xwe, hukûmetên ku dibin remorka bazaran, dikevin bin bar û karê şopandinê weke ku ew dikarin cihên fermanên lipeyhevhatî biguherînin. Ew wisa ye, lê belê vê carê bi awayekî cidîtir, fona diravî ya navneteweyî, ku dest pê dike, li hemberî wê yekê ku kêmkirin jinûvedestpêkirinan dikuje, dikeve nav heyecanê (6) *(û Xatûn **Christine Lagarde** bi xwe, weke ku niha ketibe nav gumanan, ji îhtîmalên linavhevxistina doktrînan a bi navê **"rilance"**)* (7) an jî Komîsyona Ewropî ya ku pêşbînîyên wê yên mezinbûna aborî tesîrên felakateke anonskirî qeyd dikin. Mezinbûna aborî ya Yekîtîyê ji bo 2012ê ji sedî 1.75 ta 0.5 hate revîze kirin. (8) Meliktîya-Yekbûyî (Birîtanya), ji bo 2011ê ji sedî 1.7 derbasî 0.7 dibe, ji bo 2012ê jî ev rêje ji sedî 2.5 (!) û ji sedî 0.6 e. Fransa bi tena serê xwe anonsên xwe revîze dike: % 1.75 dadikeve %1ê. Hetta, Almanya jî pê dihise ku di dawîyê de ku ew ê nikaribe bi tena serê xwe ji nav okyanûsa vê pelişînê xwe rizgar bike –ji ber sedemên hê xurtir gava ku mirov bi modela mezinbûna aborî ya xwe dispêre îxracatan xwe bipesinîne … 2012 wê % 1.8 be, weke ku dihate texmîn kirin, lê belê hukûmeta alman wê weke % 1 nîşan dide û li gor enstîtuyên serbixwe jî ew % 0.8 e.

Piştî qutbûnên di butçeya gelemperî de, kêmkirina meaşan dest pê dike

Baş e çi dikare ji stratejîya telafîkirina valahîyên butçeyî bimîne, gava ku hemû mezinbûnên aborî li nav ewçend welatan hilweşin û gava ev senkronîzasyon rê bide hin sînerjîyên liserhevkomkirî ên birîndar? Hukûmet wisa xuya dikin ku ji vê rewşê serê wan têra xwe tevlîhev e û mirov dikare ji niha ve bibe şahidê nuveyên pêşî yên guherîneke awayê meşa wan a ku wê feraxetê ji ewçend fethên hêja yên dijwarîyê neke, ew ê pêşveçûnên nû di guzergahên nû de li wan fethan zêde neke. Ji ber ku di eslê xwe de neolîberalîzm xwedî du obsesyonan e: Dewlet û liberxwedana meaşgiran. Lê belê, ji ber ku tişt wê nikaribin bi vê qebetîya bikêf bihatana gotin, ew bi bahaneya *"deynan"* ya pêşî diperçiqîne û bi îdîaya "bihayê kar û handana reqabetê" êrişê dibe ser ya duyemîn. Û li vê derê ye ku astenga kemberşidandinê ji xwe re derîyekî dibîne: Eger dijwarî li gor nêrînên wan jî veguhere felaketê (kêmkirina valahîyên butçeyê), ti tişt nikare stratejîya hilperikîna mezinbûna aborî bi rêya handana reqabetê –ango bi kêmkirina bihayê komple yê kar– lê zêde bike.

Wê di nêzîk de ji ber vê yekê were dîtin -di eslê xwe de ji niha ve tê dîtin- ku gotara siyasetên aborî ji bo nermkirina mentiqa desttêwerdanên besît, wê xwe pirbare bike û fikra hilpekîna bi rêya îxracatkirinên pêşbazîyane gav bi gav wê şûna wê bigire: Hêdî hêdî kêmkirina daxwaza hundirîn niha pir dîyar e, rizgarî jî di vê rewşê de di daxwaza derveyî de ye. Tiştê ku weke "devaulasyona hundirîn" hatiye bi nav kirin, bi vê wateya xwe ya rûboyaxkirî ya ku şana serdemekê ye, dubereya dezenflasyona pêşbazîyane ya salên 1980yê (9) wê eynî mîna versîyona xwe ya pêşî û herî hindik ji ber du sedeman bi heman awayî têk biçe: Ya pêşî û eger bê hisab kirin ku xwedî tesîreke esasî ye, ew ê feydeyên xwe ancax di navîndemê de nîşan bide ango di asoyeke wextî ya derveyî nisbeta lezgînîya ji nû ve mezinbûna

www.arsivakurdi.org

aborî ya daxistina bi lez a rêjeya faîzên deynên Hilberîna Hundirîn a Grûz /HHG.

Lê belê fikir bi xwe ye ku hemû dewletên ewropî bi yekdengîyê radihêjin vê stratejîya ku wê fikrê ji sedîsed heba dike, ji ber ku di avakirinê de tenê yekalî ye! Feydeya pêşbazîkarîyê daneyeke nisbî ye, herwiha mirov dikare bixwaze ku hemû bidin ser rêya modela alman, lê belê divê neyê ji bîr kirin ku gelemperîkina wê bi xwe zirarê dide xwe. Di vê rewşê de jî tiştê di dest de bimîne li dijwarkirina butçeyî wê dijwarîya li ser meaşan jî were zêde kirin û ev kêmkirina îlawe ya daxwaza hundirîn ya li nebûna geşedana daxwaza derve were zêde kirin, wê bibe encameke bi heybet. Tevî vê yekê jî encam ne girîng e: Bêtesîrîya siyasetên neolîberal ên ti caran nebûne sedemeke têrker ji bo redkirina wan, ew hê jî dikevin pey fetihkirina hemû dezgehên xwedî rezerv. Ev fethên ku *"peymana ji bo ewro"* ya adara 2011ê hedefên wan ên bingehîn dest nişan kirine, –kêmkirina berdêla meaşê teqawidiyê, hêsankirina jikaravêtinê, xwecihkirina muzakereyên li ser meaşan, jihevxistina statuyên parastî, (CDI, fonksîyona gelemperî), li gor bîrbirina lîberal ya ku dixwaze her tiştê weke ku tewangbar xuya dike, wê dawîya dawî were tewandin–, hemû sedem mirov digihînin fikra ku ew ê di demeke nêz de naqarateke nû ya sergêjker ya siyaseta aborîyê biafirînin.

YEHYA AL SELO: **Govend I**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 60 x 40 cm

Lê belê gelo krîza deynên serdest ku pê ve girêdayî pêşveçûn dikarin her kêlîyê derkevin derveyî kontrolê, wê ji hukûmetan re wextê bihêle da ku vê fitloneka nû muzakere bikin? Ti tişt ne kêmtir di ewlekarîyê de ye, lewre pêşbazîya lezê niha di navbera manevrayên mijûlkirin û ewiqandinê yên neolîberalîzmê û dînamîka pelişîna wê bi xwe de ye. Fînansa ji vir û pê ve gihîştiye moda "şaşûgêjbûnê", dibe sibeya bêdawîbûna wê ya mentiqî ya sînorên ceribandinan, ketiye rê ji bo namzedên din ên bên rizgar kirin li pey hev bixe rêzê –û xenîmetên potansîyel çendî mezin bin, ew ewçend jî dilbijîner in. Îtalya niha ketiye navenda balkêşîyê û eger ne bi plana qutîyê ya rizgarkirinê be (*bail-out*), tirs û guman hene ku ew nema bikaribe ji nav derkeve. Tayînkirina ecêb a serokwezîrên teknokrat-bankavan, ku tê wateya hovîtîyeke siyasî ya wisa qebe ku medya lê varqilîn, wê ji agirê pûş pê ve ne titşekî din be. Yekane nirxa van rûçikên bijarte yên **Mario Monti** û **Lucas** gelo îtîbara wan ne zêdetir e di badana van cîwatayan de, ango di vî karûbarê ku serberjêrkî ber bi têkçûnê digindire de? Yekane tiştê mirov dikare ji wan bipê ew e ku rahêjin heman tiştê ku selefên wan dikir, lê belê ji wan xirabtir bimeşînin, an jî xwe bikin pêşengên "devaulasyona hundurîn" a ku heman aqûbet li pêşîya wê ye. Di eslê xwe de **Montî** ji nû ve xwedî nameyên pêewleyî û qebûlkirî yên Yekîtîya Ewropî hene û wî ji bo *"almanîkirina helwêsta beramberî butçeyê"* ya Îtalyayê di ewroyê de fersendeke dîrokî didît (10)… Ji ber vê yekê wê mumkin bûya ku ji niha heta çend salên din, hilkişîna wan a ser dika siyasî wê weke hewldaneke xwe dispêre dîrokeke berê xuya bikira; eynî weke yek ji averêbûnên manewrayên bêhêvî yên pergaleke qedandina piçûkxistina siyaseta demokratîk, ji ber ku ev helwêsta piçûkxistinê –ya **Goldman Sachs** û/an jî BCE, ekonomîstên berê yên xwedî sertîfîka ji zanîngehên herî zêde xwe dane karûbarê berbelavkirina ortodoksîya îflaskirî (11), ango, kêm an jî zêde *portr-tîpê* kesê herî têkçûyî…û qet li ber xwe neketî – ketiye nav gîyana hemû hukûmetên xwe "bispor" nîşan didin. Bi rastî jî ev her du qiraseyên zilaman wê nikaribin tiştekî mezin bikin û tiştê bikin wê di rewşa wan a heyî de zêde bi kêrî wan neyê. Lewre madem Îtalyaya ku li cihê herî bilind ê kaşkaşokê ye, pir zelal dibe ku FAE (*Fona Alîkarîyên Ewropî*) wezîfeya xwe di asta herî bilind de bi cih nayne. Hesabek li quncikê maseyê weke ku dibêje Îtalya bi tenê wê bi giranîyeke bi qasî 600 mîlyar ewroyan li ser lêçûnên muhtemel ên EFSFê (*european financial stability facility*-Fona ewrûpî ya aramîkirina diravî) bibe bar –li gor hesabê heta vê saetê dîyar bûye; ev reqem 440 mîlyar ewro ye. Helbet, lutkeya 27ê cotmehê bi kêfeke mezin kapasîteya fonê hilkişand 1000 mîlyar ewroyan… (12) lê belê piştî dîyarkirina reqemê, der barê hûrdekarîyên wê yên pratîk de ti tişt nehat gotin. Almanyayê dubare kir ku ew ê neçe wêdetirî sînorê taahuta ku kiriye.

Welatên sêyemîn (Çîn an jî meliktîyên petrolê) ku kodika parsê dirêjî wan hatiye kirin, bi awayekî ecêb ji bo fikra siwarbûna li keleka ***Medus***ê pir dilxwaz xuya nakin. Û bêyî ku bifikirin ka eger piştî serpêhatîya Îtalyayê, ya Spanyayê an jî, bi carekê, ya Fransayê jî rû bide, wê çi were serê fona belengaz … Bi tesîreke trajîk a meqesê, her namzeda nû ya li benda rizgarkirinê du caran li derîyê *Fona Ewropî ya Aramkirina Diravî* (EFSF)ê dide. Pêşî ji bo avansan, dûre jî ji bo pêşkêşkirina çavkanîyên xwe; ji ber ku çawa be ew ê bêyî ku tiştekî bibêje, bi ketina nav lîsteya alîkarîxwazan, welatek ji deynên *ipso facto* ya rizgarkeran ji muaf dimîne. Dûre jî, ji nû ve wekhevkirina barê giştî li ser garantorên mayî, tê bi cih anîn… û ev jî bi awayekî pir berbiçavtir nîşan dide ka sînorên prensîpa rizgarkirinê çi ne; bi zêde deynbarkirina li ser hinekên din, rizgarkirina hinekan ji zêde deyndarîyê. Bêyî xwegihandina heta *bail out* a dîyarkirî, windahîya sêbera wê ya -a ji alîyê Fransayê ve wê ji bi rêya fonê ji EFSFê (Fona Ewrûpî ya Aramîkirina Diravî) re were şandin û ev fon jî bi taybetî jî piştî têkçûna duyemîn lêzêdekera bingehîn, di bin tehdîda windabûnê de ye –û ji niha ve tê dîtin ku li vir bûyereke ku divê dûrî çavan neyê hiştin mijara gotinê ye …

Ji alîyê bedbextîya xwe ve fona belengaz gihîştiye qonaxa xirabtir ji bazara bi êş a mîsyonan ku ti feydeya wan jê re tineye. Lewre ji ber vê yekê bispor ketine nav endîşeyan û bi awayekî nepenî li gel hin rêveberên bi êş re danûstandinan pêk tînin; wê bixwazin careke din li ser bazarên talî tîtrên serwerî yên dewletên endam ji bo êşê pê bidin kirîn û ev jî wê bibe awayê hefsarkirina bilindahîya rêjeyên wan ên faîzê. Lê belê operasyonên bi vî cureyî di rewşa normal de wê nebûna para karûbar a *fon*ekê ku bi xwezaya avabûna xwe xwedî derfetên sînorkirî ye –û ji ber vê yekê jî sermayedaran wê bênavber ew "test nekira". Bi tenê bankaya navendî ya ku bi awayekî teorîk dikare bi awayekî sînornenas pereyê ku ev yekane awayê cezibandina bazaran û ji nû ve zindîkirina wan e. Bankaya Navendî ya Ewropayê, ne vê dike ne jî wê. Dibe ku ew niha mudaxeleyê reşê dike, lê belê heta ji destê wê tê hindik û hinek jî bi awayekî şermoke, lingên xwe bi awayekî berbiçav li xwe xwe kaş dike û zêde bi derengî dimeşe, tevî ku rewş ji zû ve gihîştiye asteke pir dijwar a jihevketinê.

Dîyar e ku ***Bankaya Navendî ya Ewropayê*** yek ji cihên herî bilind ên sextekarîya ewropî ye: Bûye mîna girtîgeha hişkenêrînên eletewş, rêzikên felcker û obsesyonên alman û ew herwiha cihê herî xeter yê pirsgirêka awirî ya bûyera nepayî ya sincî (exlaqî) di nîvê civatên siyaseta aborî yên bi awayekî serbixwe tên meşandin, lê belê bi hebûna xwe ya hevpar a li *ewroherêmê* didin xuya kirin, tên destek kirin. Niha paşketî, BNE, hewlê dide qasî mumkin e bi awayên nazik posîzyoneke lihevkirinê ji xwe re saz bike da ku karibe hebûna xwe bidomîne. Desttêwerdana bi tundî, weke ku niha ev yek jê tê xwestin, di çavên wê de wê bibe berdêla rewakirina xirab-reveberîya dewletên ji alîyê diravî ve qûş li wan teng bûye û ji ber wê yekê ew bi awayekî ji wan re pêşnîyar dike ku weke rêya herî dawî ku hê jî mumkin e, rêzikên wê careke din bin pê bikin –ev jî handana herî xirab a ortodoksîya butçeyî ye ku ew bi xwe dixwaze bibe notirvana tiştekî wisa. Lê *Bankaya Navendî ya Ewropî* bi vî halê xwe yê heyî!

Nesadiqbûna li hemberî xwe an jî jiholêrabûn, ev bi xwe ya dudilîya BNE ku divê ji her duyan yekê hilbijêre… Lê belê ji bo tiştekî wisa êdî zêde ne dereng e? Û ji ber zêde ferexatkirina ji prensîpên xwe, BNEyê gelo bi ewroyê, xwe negihandiye devera jê neveger? Gelemperîkirina mantiqê alozkarî, ku *corrélateke (pêwendî)* neçarî ya dijwarîyên korane ye, niha li herderê ocaxên spekulatîf pê dixe û ji wan ocaxan rêjeyên bilind ên nehefsarkirî yên faîzê (Îtalya, tarîxa dawî ya ku rêjeyên faîzên wê yên deh salên dawîyê % 5.8 bû ku ji nîvê cotmehê heta nîvê mijdarê hilkişîya % 7.5ê) û xirabûna deynê dewleta eleqedar derdikevin. Fransa, di rewşa lerizînê de li benda naskirina aqûbeta xwe ye. Ew xwe di vê herêma şîlo de dizane an jî, ew hê jî bi zimanekî vekirî nehatiye qewirandin, lê ya dîyar ew e ku ew ji niha ve di armanca rewşa veşartî de ye. (13) Vê gavê, hemû aborîyên ku ketine nav vê herêmê, ji wir bi awayekî ji zincîrê qetiyayî derketine û berê xwe dane alîyê îstîqameta EFSNê –lê belê ji alîyê şaş ê gîşeyê ve.

Eger, ji neolîberalîzmê an jî gelan, yek pêwist be tê re derbas bibe...

Ji bêkêrîya lûtkeyên pirbare yên ketine pêşbazîya *ad nauseam (heta dereceya bêzarbûnê)* ya ji ber nakokîyên jihevneketîn a pereyê yekpare yê îro heta bigihe tayînkirinên herî bilind ên teknokratên weke xuda tên hêvî kirin û herwiha nexweşîya vegir a guhertinên sexte yên hukûmetan (Yewnanistan, Portugal, Îrlanda, Îtalya, dîsa Yewnanistan, di nêz de Spanya û dûre dibe ku Fransa) ku hemû jî hema hema weke hev in; bêhêvîtî ji herêma ewroyê difûre. Û hêdî hêdî bêhna kelaxê tê. Dibe ku ya ku tê, ne serhildan, lê birîna ji bo parvekirina kelaxê be! –lê belê birîna kê? Paradoksa serdemê dixwaze ku ev birîna, ku ji mêj ve dest pê kiriye, ya gelan bûya, lê belê herwiha ya neolîberalîzm bixwe. Lewre ya dawîyê wê karibûya bikeve rewşeke wisa ku neçar bima, fişekên xwe yên dawîyê bavêtana. Hetta, zêdetir ji "devaluasyona hundirîn" a eletewş, hilperikîna mezin ber bi pêş a federal, çareserîya dawî ya hesas a rizgakarkirina me tevan, karûbarê bi tenê pêvajoyeke pênc salan e –ne dîyar e ka dirav bi bendemayîneke heta hingê dibe xwedî çêjeke baş yan na. Zevîya xirbeyan a ku wê bide pey zincîreya kêmasîyên serwerî û îflasên bankayî, qet nebe wê bibe xwedî fezîleta mezin a *tabulata rasa (tabloya vala, rûpela saya)* û lîberal jî di nav de, ji bo herkesî. Kesî ti caran pergaleke serdestîyê ya ku xwe bi xwe radest dike nedîtiye. Divê, gelek enerjî li enerjîyê bê zêde kirin, îca ev enerjî we divê bila ji pêla şoka hilweşîna sîstemê hatibe, an jî we divê ji ya serhildaneke hundirîn. Bila ya duyem li ya yekem bê zêde kirin û ji bo hemû rewşên nezelal, ev yek wê ewçend jî ne xirab be: Eger, ji neolîberalîzm an jî ji gelan yek jê divê tê re derbas bibe, qet nebe bila ew be.

* Aborîzan. Nivîskarê *Vegerandina yê din. Komedîya cidî li ser krîza diravî di sê beşên şanoyî û helbestên Aleksandrin de*, Le Seuil, Parîs, 2011.

1 Civînên bilind ên "Yewnanistan-1", 9ê gulan 2010ê; "Îrlanda-Portugal", 28 mijdar 2010; "Hevpeymana ji bo ewroyê", 11ê adar 2011ê; "Yewnanistan-2", 21ê tîrmeh 2011ê; "Yewnanistan-3", 27ê cotmeh 2011ê

2 Kûrbûna bi carekê ya valahîya butçeyê li qonaxa bêlivbûna aborî tesîra hilpekînekê li xwe kir

3 Bi awayekî bêalîbûneke têkûz wiha hatiye bi nav kirin: *Dawîlêhatina rihetîya deynê gelemperî* (La Documentation française, Paris, 2005)…

4 *Rapora ji bo rizgarîya geşedana aborî ya fransî*, La Documentation française, Paris, 2008

5 Civîna Bilind a Eurogroupe ya 11ê adara 2011ê

6 Fona Diravî ya Navneteweyî, *World Economic Outlook*, Washington, avril 2011

7 Tehdîda oksîmorîk a bi îmzeya Lagarde ê ku dixwest bide bawer kirin ku dijwarî bi pêşketinê re ne di nav nakokîyê de ye …

8 *European Economic Forecast, Autumn 2011*, Gerînendeyîya Giştî " Karûbarên aborî û diravî", Comîsyona ewrûpî

9 Siyaseta ji 1984ê heta 1993ê ji alîyê Pierre Bérégovoy ve hat bi rê ve birin, desenflasyona pêşbazîkar dixwaze bi kêmkirina meaşan rêya devaluasyona guherînê, ji bo di nav stratejîya mezinbûna aborî ya pala xwe dide îxracatan de sazkirina avantaja reqabetkar

10 Charlemagne, "The euro's existential worries", *The Economist*, London, 6ê gulan 2010ê

11 Le Massachusetts Institute of Technology pour M. Papademos û zanîngeha Bocconî ya Mîlan ji bo Monti. Binêrin li "destpêka dawîyê", Pompeya La pompe diravxwir, Les blogs du Diplo, 11 tebax 2011

12 Binêrin li nivîsa bi sernavê "destpêent de la fin", la pompe à phynance, 11 août 2011, http://blog.mondediplo.ne

13 Weke *think tanka* brukselî ya Lisbon Institue (15 mijdar 2011)

Wergera ji fransî: Baran Nebar

www.arsivakurd.com

Wexta ku di bin giranîya hêzên bazarê de û bigewdebûna jeopolîtîk qidûma dewlet-neteweyan li bin giraniya hêzên bazarê û dîsa li demeke bigewdebûna jeopolîtîk ya ji piştî şer mîras maye, qidûma dewletên neteweyî dişkên, rêvebir xeyala aramîyê dikin. Hal bû ku formên hikûmetên li şûna împaratoran bi cih bûyî, bi berxwedana xwe ya hilpekînî ya dîrokê, bi vezelînîya xwe, bi kapasîteya xwe ya lihevgihandina sêniyên cihêreng, pir balê dikşînin. Gelo ma êdî ew ê karibin çi fêrî me bikin?

Hilberîna yekîtîyê di nav dijberîyê de

Ji Romayê heta Stenbolê, ji bo têgihîştina cîhanê, fikirîna li ser împaratorîyê

Jane Burbank û Frederick Cooper *

Di 2011ê de em dê çima qala împaratorîyan bikin? Hawê ku ji me re hatiye gotin em di serdema netewe-dewletan de dijîn: zêdeyî 200 netewe-dewlet hene, ku her yek ji wan li cem Neteweyên Yekgirtî xwedî kursîyekê, pûlên posteyê û dezgehên hikûmetî ye. Dîsa jî netewe-dewlet îdealeke van demên nû ye û siberoja wê nedîyar e. Herweha, ji bo gelekan jî xwedî encamên xerapker e. Li dû hilweşîna împaratorîyên ***Osmanî, Avustûrya-Macaristan, Romanov*** [Çarîtîya Rûsyayê] û ***Almanan*** a piştî Şerê Cîhanê yê Yekem û di navbera salên 1940 û 1970yê de dekolonîzasyona ***Fransa, Brîtanya, Hollanda, Belçîka*** û ***Portekîzê***, împaratorîyan rê li ber cîhaneke ewle ya neteweyan venekir. Sedema gelek xwînrijî û pevçûnên bêîstîqrarîyê yên li ***Rûanda, Iraq, Îsraîl/Filistîn, Afganistan, Yûgoslavya***ya berê, ***Srî Lanka, Kongo, Qafqasya, Lîbya*** û gelek deverên din, ew bû ku li van deran piştî 1918, 1945 û î 1989ê ji bo rejîmên împaratorîyê alternatîvên pêkan nehatin dîtin. Dewletên ku li ser axên kolonîyên berê hatin damezirandin, nikarîn bigihîjin wan armancên xwe, ku dihatin hêvî kirin ku bi serxwebûnekê pêk bên. Hêzên mezin, cîhaneke neteweyên yeksan û jêneger îdîa dikin û her weha hêza leşkerî û aborî ji bo têkbirina desthilatdarîya dewletên qels bi kar tînin.

Nostaljîya împaratorî û bibîranînên hestyar ên cîhana wenda ya Raca Brîtanya û Îndoçîna Fransayê nikarin xitabî roja me ya îroyîn bikin. Herweha ji bo neheq nîşandana mudaxeleyên Amerîka, Fransa û hikûmetên din binavkirina wan a wekî peyvên nostaljîk ên "împaratorî" û "kolonyalîzm" jî di nirxandin û pêşdebirina cîhana me ya îro de bi kêr nayê. Lê belê, lêkolîneke li ser dîroka împaratorîyên hem ên qedîm û hem jî yên demên nêzîktir, di warê berfirehkirina têgihîştina me de dikare alîkarîya me bike, da ku em fêm bikin çawa wer li cîhanê hat û perspektîveke firehtir a li rêxistina îqtîdara siyasî ya rabuhurî, îro û belkî ya dahatûyê jî bi dest bixin.

Demeke dîrej, kiryar û bandorkirina li ser hevdu ya împaratorîyan teşe da naveroka tevger û ramanên mirovan. Lêkolîna li ser împaratorîyan alîkarîya me dike ku em li serê bifikirin ka çi kir ku têkilîyên dîyarkirî di warê qad û dem de pêk werin û nehişt ku têkilîyên din pêk werin. Li cîhanê, împaratorî teşedayên bixwebawer ên berhem, ragihandin û çandê bûn, lê belê diviya ku ew jî bi sînordarîyên xwe re mijûl bûbûn, nemaze jî di warê bikaranîna hêza xwe ya li deverên dûr û li ser gelheyên cur bi cur, piranî jî di demeke weha de, ku împaratorîyên din jî hebûn. Dema ku em li birêveçûna împaratorîyan binihêrin, pêkhatin, şer û pevçûn, reqabet, serkeftin û têkçûnên wan tiştekî tîne bîra me, ku di çend dehsalên çûyî de hatiye ji bîr kirin: Ev yek jî ew e, ku desthilatdarî dema berê û li gelek qadên cuda roja îro tevlihev e, parçe bûye, tebeqe bi tebeqe ye û li ser yelpazeyeke prensîp û kiryarên avaker de teşe girtiye.

"Qiralên daristanan"

Çi hêz da împaratorîyan, ku karibin dirûvê bidin cîhanê? Yek ji wan, ku em jî di pirtûka xwe ya bi navê ***Empires de la Chine ancienne à nos jours*** [*Heta roja îro împaratorîyên qedîm ên Çînê*] (Payot-Rivages, 2011) de nîqaş dikin, ew e ku împaratorî teşeya domdar a hikûmkirinê bûn.

Dezgehên berbelav ên siyasî, împaratorîyên fireh, yan xwedî bîrhatinên firehbûnê, herçend ew bi darê zorê tev li wan dibin jî, cudabûn û hîyerarşîya navbera gelan berdewam dikin. Her çiqas împaratorî pirrengîya navbera tebayên xwe nas dikin û divê serî pê derxin, teşedayîna netewe-dewlet homojenî ye: ***"Yek gel, yek war, yek hikûmet".*** Împaratorî bi gelên cuda reftarê cuda dikin. Stratejîyên ji hev cudatir ên hikûmkirinê, ku împaratorîyan bi kar anîn, hişt ku ew karibin di mesafe û demên dirêj de çavkanîyan kontrol bikin û wan bihewînin. Li hember temendirêjîya Împaratorîya Osmanî ya 600 salî, ne hewce ye ku em desthilatdarîya du hezar salî ya wan xelefên xanedarîya çînî bi bîr bînin jî, netewe-dewelet di asoyên dîrokê de bi tenê xaleke piçûk e.

Heta ku serekên siyasî xwedî daxwaza berfirehtirkirina kontrola xwe bin û heta ku gel di warê civakî û çandî de ji hev cudatir bijîn, cazîbeya avakirina împaratorî yan jî belavtir kirina wê hîna jî berdewam e. Lê belê, ji ber ku împaratorî dihêle ku cudatîyên navbera gelan bidomin, hêmanên wan xwedî wê potensîyelê ne, ku ji împaratorîyê veqetin. Her ji ber vê yekê împaratorî di dîrokê de gelek zêde peyda bûn û disa ji ber vê yekê ew tûşî parçebûn, sînorên xwe guhertin û jihevketinê bûn. Teşeya împaratorîyê wekî şewbê vegir û têger bû. Mirov dikarin li ser gelek teşeyên dewletan bifikirin, lê belê heta ku împaratorî hebin, heta ku birêvebirina wan a mirovan û çavkanîyan, ku ji yek war û yek gelî wêdetir in di destê wan de be, ji bo fikrên siyasî pêk werin, divê li împaratorîyan û li derfeta avakirina yekê bifikirîn.

Hemû împaratorî bi pirsgirêkên wek hev re rû bi rû man, an gelên ku ji komên cur bi cur pêk hatine çawa bi rê ve bibin, hikûmkirina ji mesafeyeke dûr, bin-komên ji hev cuda çawa kontrol bikin. Dîsa jî ji bo birêvebirina împaratorîyan rêyeke tenê tunebû: împaratorî bi "komeke hêzên" cur bi cur ve dihatin bi rê ve birin.

Ew hin stratejîyên xwe ji xelef yan jî raqîbên xwe hîn bûn. Wekî mînak Împaratorîya Osmanî karî kelepûrên tirkî, bîzansî, ereb, mongol û faris tev li hev ke. Da ku bikaribin hikûmdarîya xwe ya pir-bawerî bi rê ve bibin, osmanî bi serekên her civateke olî ewle bûn û wan hewl neda ku wan komên olî asîmîle bikin, yan ji holê rakin.

Împaratorîya Brîtanyayê bi demê re ji xwe re domînyon, kolonî, manda peyda kirin, Hindistan ji alîyê xizmeteke din a sîvîl ve hat bi rê ve birin, mandayeke nepenî li Misirê hebû û herweha li her cihê ku Brîtanya bi rêya "împeryalîzma bazirganîya serbest" beşdar bûbû li wê derê "herêmên bandorkirinê" peyda bûn. Împaratorîyeke xwedî repertûwareke pir rengî ya birêvebirinê dikarî taktîkên xwe bi baldarî biguherîne, bêyî ku bi pirsgirêka asîmîlasyonê û hikûmkirina hemû deveran a li gor yek modelê re rû bi rû bimîne.

Mirov dikare di warê birêvebirina gelheyên ji hev cudatir a împaratorîyan de hin şablonên bingehîn û nakok bibînin. "Siyaseta ferqan" li cem hin împaratorîyan dihat wateya naskirina curbicurîya gelan û erf û adetên wan ên wekî rastîyên jîyana rojane. Li cem hin împaratorîyên din jî ev yek dihat wateya kişandina xeteke tûj a navbera yên ji hundir û yên ji derve an ku "barbaran". Di sedsalên 13 û 14emîn de ji bo desthilatdarên mongolî cudatî hem tiştekî asayî û hem jî tiştekî bikêrhatî bû. Împaratorîyên mongolî berevanîya olên ***Budîzm, Konfîçyîanîzm, Xirîstîyanî, Daoîzîm*** û ***Îslamê*** kirin û herweha huner û zanistîya ereb, faris û şaristanîyên çînî pêş ve birin. Împaratorîya Romayîyan bêhtir xwedî meyla homojenkirinê bû, ku li ser lihevkirinê dihat ava kirin, lê belê tê de çanda roma, têgeha cazîb a hevwelatîya roma û di talîyê de xirîstîyanî jî wekî ola dewletê aşkere bûn.

Li ser van herdû şiklên îdeolojîk varyantên împaratorîyan hatin ava kirin û hin împaratorîyan, weke Împaratorîyên Osmanî û Rûsyayê, ev herdû şikil bi kar anîn. Împaratorîyên ewropî yên li Afrîkayê yên sedsalên 19 û 20emîn di navbera meyla pişavtinê, ku li ser ewlebûna wan a ji berztirbûna şaristanîya rojavayî bilind dibû û meyla hikûmkirina ne-rasterast, an ku birêvebirina bi rêya elîtên civakên fethkirî, dudil man. Di sedsala 19emîn de împaratorîyên ewropî mîsyoneke şarezakirinê ragihand, ku tê de tengezarîya teorîyên nîjadî jî hebû.

Herçend desthilatdarîyên împaratorî gel û çandên wan wekî "yên din" didîtin jî fatihên van deran nikaribûn împaratorîyê bi tena serê xwe bi rê ve bibin. Hewcedarîya wan bi "qasidan/navberkaran" hebû. Desthilatdarên împaratorî pirî caran fêris, zanebûn û otorîteya hin kesên ji civaka fethkirî bi kar anîn, an ku ya elîtên ku ji tevkarîyê sûd werdigirt yan jî ya kesên din, ku ji berê de marjînal bûn û avantajên xizmetkirina hêza serkeftî didîtin. Qasidîyeke cureyekî din jî kesên ji niştiman bûn, ku wekî koçber yan jî karmend dihatin herêmê. Herdu stratejîyan jî xwe dispart ser têkilîyên civakî yên qasidan, da ku tevkarîyeke bikêrhatî were ewle kirin. Taktîkeke din berevajî wan bû: Kole û kesên din, ku ji civakên xwe yên resen veqetîyane û ji bo refah û zindîmayînê muhtacî efendîyên împaratorî ne, dianîn payeyên otorîteyê. Ev stratejî bi awayekî serkeftî ji alîyê xelîfeyên ***Ebbasîyan*** ve û paşê jî ji alîyê ***Osmanîyan*** ve hat bi kar anîn, ku birêveber û fermandarên wan ên payebilind di dema zarokîyê de ji malbatên wan dihatin stendin û di hîmayeya Sultan de dihatin mezin kirin.

Di teorîyê de, divîya ku împaratorîyên ewropî yên vê dawîyê, şûna teşeya qasidîya şexsî bi burokrasîyê ve guhertibûya, lê belê ev yek bi piranî li ser kaxizan pêk hat, ne di jîyanê de. Di piranîya Afrîkayê de birêveber xwe wekî ***"le roi de la brousse"*** (*qralên qirşikan*) didîtin. Pêwîstîya karmendên herêmî bi şef, berevan, wergêran hebû, ku wan hemûyan jî hewl didan ku ji xwe re sûdê werbigirin. Di dîroka împaratorîyan de qasidî xwedî roleke girîng bû, lê belê herweha xeternak jî bû. Koçber, elîtên xwecih û rayedarên bin-kom dibû ku xwedî xeyala birêveberîya şova xwe bi xwe bûn. Dema ku em li ser qasidan hûr dibin, em têkilîyên vertîkal ên navbera desthilatdar, karmendên wan û tebayan bin xêz dikin, ev jî têkiliyên siyasî ne ku îroj weke kevnar tên dîtin û li şûna wan têkilîyên horîzontal ên navbera çîn, nîjad yan jî etnîsîteyê tên tercîhkirin. Tahayyulên siyasî ji kiryar û bandora împaratorîyan girîng bûn.

Serokên împaratorîyan di rewşên dîyarkirî de derfetên xwe û dijwarîyên li pêşîya xwe dîtin, xeyalên wan ne bi fikrekê sînorkirî bûn, ne jî bêdawî bûn. Elîtên herêmî û tebayên din ên împaratorîyê jî xwedî xeyalên xwe bûn. Divê em wan di rewşa wan bi xwe de fêm bikin, ne di ya xwe de. Wekî mînak, monoteîzm ji alîyê împaratorê Romayê Constantine ve hatibû pejirandin û paşê jî ji alîyê Muhammed ve: Fikra yek împaratorî, yek Xwedê û yek împarator fikrên hêzdar bûn. Lê belê rûyê din ê monoteîzmê hîzbî ye, an ku argumana ku dibêje împaratorê niha ne berevanê rêkûpêk ê bawerîya rast e.

Împaratorîyan hewl da ku xwe bi fikrên edalet û exlaqê ve girê bidin. Lê belê, rexne dikarîn wan fikran li dij wan biguherînin, wekî di sedsala 16emîn de **Bartolomé de las Casas** yan jî di destpêka sedsala 19emîn de li Împaratorîya Brîtanyayê tevgera li dijî koledarîyê, (1) yan jî ew asyayî û afrîkî, ku wan îdîayên 'şarezakirinê' ya ewropîyan veguherandin wê îddîayê, ku digot demokrasî nabe ku bi tenê li parzemînekê were bin karantîna kirin.

Têgeha "guzergahê" dikare alîkarîya me bike, ku em veguherîn û rengdayîna (hevdubandorkirina) navbera împaratorîyan lêbikolin, bêyî ku em tekerurkirinê ya dîrokê ya wekî xelefê serdeman îzah bikin, ku her yek xwedî taybetmendîyekê ye, ku xwe ji selefên xwe cuda dike.

Tiştê ku ji sedsala 15emîn û pê ve jê re carna "Firehbûna Ewropayê" tê gotin, ne dozîna berbelavbûnê ya gelên ewropî, ku ji wan re wekî mîrat mabû, lê belê bandora kanjonktureke dîyarkirî bû. Dewlemendîya ku li împaratorîya hêzdar a Çîn û Asyaya Başûr pêk hatibû, ji bo bazirganên welatên dûr wekî dawetkirineke cazîb bû, lê belê Împaratorîya Osmanî, ku împaratorîya herî mezin, hêzdar bû û ji dezgehên parçebûyî yên Ewropaya Rojava bêhtir ewle bû, di navbera Ewropa û Çînê de bû. Qiralên Îspanya û Portekîzê û paşê jî yên Hollanda û Îngîltereyê hewl dan ku ji bo xwegîhandina welatên dûr rêyeke din bibînin, ku dora osmanîyan bigerin û xwe ji bexta karsazên xwe yên herêmî rizgar bikin. Encama ku ne dihat guman kirin ew bû, piştî ku **Columbus** da ku here Asyayê ber bi rojavayê ve derket deryayê û ew der kifş kirin, ku dê bibûna Amerîka, gelên herdu alîyên Atlantîkê bi hev ve hatin girêdan.

Dema ku li têkilîyên navbera împaratorîyan were nihêrtin, konjonktureke din a krîtîk a dîroka cîhanê bi awayekî din xuya dike: Şoreşên ewropî û amerîkî, yên sedsala 18emîn û ya destpêka sedsala 19emîn. Şoreşên li ***Saint Dominque*** a fransiz, Amerîkaya Bakur a brîtanî û Amerîkaya Başûr a îspanî di nav împaratorîyan bi xwe de li ser hêzên hikûmetên herêmî, koçberên ji niştiman û bin-koman de bûn û mebesta veqetîna ji împaratorîyan nebûn.

Dewlet-netewe û qirkirinên etnîk

Dema em bi lez li guherîna aqûbetên rejîmên împaratorî yên li Ewropayê ya ji sedsala 19emîn heta naverasta sedsala 20emîn binihêrin, em dê bibînin ku dinya bi projeyên avakirina împaratorîyên nû yên *Almanya, Japonya û Yekîtîya Sovyetan* ji hev belav dibû, ku li hember wan hêzên din gel mobîlîze kirin û çavkanîyên qada xwe ya împaratorîyê bi kar anîn. Di naverasta sedsala 20emîn de derbasbûna ji împaratorîyan a ber bi netewe-dewletan, ku dihat pêşguman kirin, ewqas aşkere nebû. Gelheyên tevlihev ên Ewropaya başûr û navendî, ku li jêr desthilatdarîya gelek împaratorîyên cuda jîyabûn, ku di nav wan de ***osmanî*** û ***Habsburg*** jî hebûn, bûn qurbanîyên pêla paqijîyeke etnîkî, ku mebesta wan paqijîyan ewlekirina dewleta her neteweyekî bû: Di şêrê Balkanan ên 1870 û 1912-1913ê de û piştî *Şerê Cîhanê yê Yekem*, ku hêzên serkeftî împaratorîyên têkçûyî nav xwe de par ve kirin û piştî *Şerê Cîhanê yê Duyem* alman ji hin welatan hatin derxistin û beranberî wan jî ukranyayî û polonyayî jî ji hin deverên din hatin qewirandin. Rewş herçend weha bû jî, dewletan xwe bi neteweyekê ve girê nedidan; paqijîya etnîk a kujer di destpêka salên 1990ê de dest pê kirin.

Li Afrîkayê, nîjadkujîya Rûandayê ya 1994ê di serdema piştî-împaratorîyan de hewldaneke bi mebesta afirandina gelekî bi tenê bû, ku dê xwe bi xwe bi rê ve bibiraya. Li Rojhilatê Navîn, jihevbelabûna Împaratorîya Osmanî ya 1918ê hîna jî nehatiye ferikandin: Neteweperestên dijber Îsraîl-Filistînê li ser heman herêmê doza mafan dikin, herweha li Iraq, Misir, Lîbya û deverên din komên cuda ji bo desthilatdarîyê pev diçinin.

Guzergeha împaratorîyan teşe da welatên herî hêzdar ên roja me ya îro. Mînak Çîn. Çilmisîna hêza Çînê ya ji destpêka sedsala 19emîn heta dawîya sedsala 20emîn, di dîroka du hezar salî ya malbatên împaratorîya Çînê de gelek serdemên bê desthilatdar de serdema herî kurt bû. Di serdemên komar û komunîzmê de, Namzedên desthilatdarîyê difikirîn ku sînorên berî wan hatibûn danîn, yên ku ji alîyê **Yûan** (sedsala 13emîn) û **Qing** (sedala 17emîn) ve hatibûn danîn, wê tim wiha bimînin.

Serokên Çînê van malbatên împaratorî û kelepûra împaratorî tînin rojevê. Çînê berê xwe daye Rojava, digel hevrîşim û porselenê hilberînên sanayîyê îxrac

www.arsivakurd.org

dike, hevkêşîyeke mezin a bazirganîyê dimeşîne û dibe kredîtora Dewletên Yekgirtî. Daxwazên serxwebûnê yên *tîbetîyan* û siyaseta cudaxwazîyê ya herêma musulman a **Xinjiang** (2) pirsgirêkên klasîk ên împaratorîya Çînê pêk tînin. Berê, divîyabû ku desthilatdarên Çînê baronên aborîyê kontrol bikin û çavdêrîya gelheyên cuda bikin, lê belê desthilatdar tecrûbeyên xwe yên îdareya dewletê bi kar tînin da ku bi van pirsgirêkan re serî derxin û di warê guherandina erdnîgarîya hêzan de vegerin ser cihê xwe yê sereke.

Ji Şarlmanyayê heta Yekîtîya Ewropî

Hem damezirandin û hem jî hilweşîna Yekîtîya Sovyetan dikarin di çarçoveya împaratorîyê de werin fam kirin. Stratejîya Sovyetan a piştgirî dayîna komarên neteweyî, ku ji alîyê qasidên komunîst û pêbawerên herêmî ve hat meşandin, nexşerêyek e ji bo cudabûnan û herweha zimanekî hevpar afirand, ku pê desthilatdarîyên nû nîqaş bikin. Dewleta herî mezin a xelef, Federasyona Rûsyayê, pir-etnîkî ye. Destûra sala 1993ê ya Rûsyayê hişt ku komarên ku federasyonê pêk tînin, dikarin zimanên xwe yên fermî hilbijêrin, lê herweha zimanê rûsî wekî "bi giştî zimanê fermî yê Federasyona Rûsyayê" ma. Piştî demeke tengezarîyê, **Viladimir Putin** kelepûrên împaratorîya saltanatî vejandin. Piştî ku wî û kesên ku di hîmayeya wî de bûn, karsaz bi dewletê ve girê dan, kontrola li ser dezgehên olî hişktir kir, çapemenî anî emanê, pêvajoya hilbijartinan guherand û pergala yek partî, ku ji alîyê 'demokrasîya deshilatdar' ve tê piştgirî dan, bi zorê dilsozîya hikûmetên federasyonê wergirt, li deverên rûs bi neteweperestîyê re flort kir, li deverên sînorê yên Rûsyayê dîsa ket pêşbirkê û di qada navneteweyî de bi awayekî serkeftî çeka sereke ya Rûsyayê an ku enerjî bi kar anî, Împaratorîya Rûsyayê di qada xwe ya Ewrasyayê de dest bi veguherîneke din kir.

Hêza herî mezin ku pêş dikeve îro Yekîtîya Ewropî ye. Ewropa ji sedsala 5emîn heta sedsala 20emîn ji ber mebestên hin elîtan, ku dixwest împaratorîyeke nû ya Roma ava bikin û herweha ji ber biryardarîya hinekên din, ku dixwestin pêşî li vê yekê bigirin, gelek bêzar bû. Şerê ji bo û li dijî împaratorîya Ewropayê ji **Charlemagne** heta **Charles V** û **Napoleon** heta **Hitler** berdewam kir. Piştî wêrankirina hevpar a Ewropayê ya dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn û herweha ji ber ku ewropî êdî nikarîn kolonîyên xwe di destê xwe de bigirin, bi awayekî daîmî dawî li şerê kujer ê ji bo împaratorîya ewropî hat. Hêzên ewropî dîsa jî hewl da teşeyeke nû bidin împaratorîyên xwe da ku wan berhemdartir bikin û meşrû derxin û encax di dawîya salên 1950yê de Brîtanya û Fransayê dev ji van hewldanên xwe berdan. Wekî Japonyayê, Almanya jî xwe ji lîstîka împaratorîyê xilas kir; herdu welat jî wekî netewe-dewlet perweşîyan, ku herdu jî wekî împaratorî nikaribûn bi ser kevin.

Di navbera 1950 û 1990ê de dewletên ewropî azadbûna xwe ya ji împaratorîyan danîn û di nav xwe de dest bi xebatên konfederal kirin. Ev avabûn herî bi bandor di warê sînordarkirina îdare û zagondanînê de meşîya. Lê belê her kesê ku ji xalên gumrikê yên vala hiştî derbas dibin, ku lê bi mîlyonan mirov di dema şerên dubarebûyî de mirin, dikarin pesnê serkeftina welatên ***Schengen*** bidin. Yek ji taybetmendîyên herî sereke yên desthilatdarîyê, an ku kontrolkirina wan kesan, ku ji sînoran derbas dibin, di asta sînorên Ewropayê hat bilind kirin. (3) Derbasbûna Ewropayê ya ji projeyên lêkdanî yên avakirina împaratorîyan ber bi dewletên neteweyî, ku dev ji kolonîyên xwe berda û ber bi konfedarasyona neteweyan ve çû, dijwarîya rêkûpêkkirinên li ser desthilatdarîyê bin xêz dike û dest nîşan dike ku konseptên neteweyî yên dewletan hîna di van demên dawî de xwe ji yên împaratorîyan cuda kirine.

Derbasbûneke bêwijdan?

Piştî 2001ê di navbera aliman de mode bû ku Dewletên Yekgirtî wekî 'împaratorîyekê' bi nav bikin. Mebesta wan yan şermezarkirina pozbilîndîya wê derbarê tevgerên wê yên li derveyî welat, yan jî pîrozkirina hewldanên wê yên ji bo ewlekarî û demokratîzekirina cîhanê bûn. Pirsa ***"weha ye? yan ma ne weha ye?"*** dûr e ku repertûwara hêzan a Amerîkayê dîyar bike, ku ev hêz li ser bikaranîna stratejîyên hilbijartî yên împaratorîyan bilind dibin. Di sedsala 20emîn de, çendîn caran zor bi kar anî, ku pê desthilatdarîyên welatên din bin pê kirin; dagîrkerîyê dike, lê gelek kêm kolonî ava kirin. Lê belê hesta neteweyî ya DYAyê jî ji rabuhurîya wê ya împaratorîyê peyda dibe: Di sala 1776ê de **Thomas Jefferson** îdîa kir, ku wilayetên ku li dij împaratorîya Brîtanyayê serî radikin, dê *"împaratorîyeke azadîyan"* damezirînin. Îdareya nû ji wê yekê peyda bû, ku em dikarin navê siyaseta ferqan a Romayê bi nav bikin: Li ser esasê mafên wekhev û mafê mulkîyetê yê wan mirovan, ku wekî hevwelatî dihatin dîtin û li derve hiştina amerîkîyên xwecih û koleyan bilind dibû. Belavbûna li seranserî parzemînê talîyê çavkanîyên dewlemend da destê ewro-amerîkîyan û paşê jî koledarî hilweşîya, serokên amerîkî hêz bi dest xist ku bikaribin di warê dem û mercên mudaxelekirina cîhana mayî de biryarê bidin.

Di warê teşeyên din ên têkilîyên li ser qad û herweha di warê tengezarîyên bi wê yekê re girêdayî de, împaratorîyan hebûna xwe berdewam kir; împaratorîyê hem derfet da û hem jî çûnûhatina hilberînên sanayîyê, sermîyan, mirov û fikran sînordar kir. Avakirina împaratorîyan pêvajoyeke bi şidet bû û piştî fethkirinan piranî kolonyalîzm hat, ew ne be jî bi xwe re pişavtina bi darê zorê û piçûkxistin anîn. Împaratorîyan dezgehên hêzdar ên siyasî ava kirin; wan herweha şopên êş û jana mirovan hiştin. Lê belê fikra neteweyî, bixwe di kontekseke împaratorîyê de bi pêş ket û derket holê ku dermanê pozbilindîya împaratorîyê nîne: Nemaze dema ku em li pevçûnên neçaresekirî yên îro yên li Rojhilatê Navîn û Afrîkayê binihêrin.

Em niha encamên rêyên belavelabûyî û xerab ên împaratorîyan dijîn, digel xeyala hevnirxîya fikra desthilatdarîyê û rastîya newekhevîya nav û navbera dewletan. Fikirîna li ser împaratorîyan nayê wateya vejandina împaratorîyên brîtanî, osmanî yan romayî. Fikirîna li ser dihêle ku em bibînin, ka îqtîdar li seranserî cîhanê bi kîjan dirûvan tê bi kar anîn. Eger em karibin dîrokê weke veguherîneke dest jê nabe ya împaratoriyan ber bi netewe-dewletan nenirxînin. Belkî em dikarin bi dîtineke firehtir li dahatûyê bifikirin. Gelo em dikarin li teşeyên desthilatdarîyê bifikirin, ku ji împaratorî û netewe-dewletan çêtir bikaribe li meseleyên newekhevî û cudabûnên gelên cîhanê mijûl bibe?

* Profesorên dîrokê li zanîngeha New York û nivîskarê Împaratoriyan. Ji çîna berê ta roja me, Payot, Parîs, 2011.

1 Domînîkiyê spanyol (1474-1566). Ji ber desnîsankirina sertên dijwar ên xwecihên li nava mêtingehên Qraliyeta spanî, ew hat sûcdarkirin ku dixwaze bi rûposeke "mirovî" deshilatiyeke emperyal berdewam bike

2 Binêrin li nivîsa Martine Bulard, "Gava tav hildikisiya Wêdetirî Rojavayê çîn", Le Monde diplomatique, tebax 2009

3 Binêrin li jivîsa Alain Morice û Claire Rodier, ya bi navê "Yekîtiya ewrûpî cînarên xwe çawa hepis dike", Le Monde diplomatique, hezîran 2010

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

Çend nimûneyên dîrokî

Ji Împaratorîya Romayê bigirin, heta Meliktîya Brîtanî, ji serdestîya Portugalî ya wêdetirî deryayê bigirin, heta kolonîyên Fransî û Meliktîya Alman, împaratorîyên ewropî li gor xwe şeklûşemalek dan cîhanê. Helbet ew ne bi tenê bûn.

Împaratorîya Çînê

Împaratorîyên ku Çîna îro li ser mîrasên wan bi gewde bûye, pêvajoya zêdetirî sê hezar salan, bi buhran û parçebûnên curbicur ên serdemên serdestîya mutleq, dane dû hev. Xanedana dawî ya **Qing** a di 1664ê de ava bû, di 1911ê de hildiweşe û di pey re jî **Sun Yat-sen** Komarê îlan dike.

Împaratorîyên ereb-misilman

Piştî mirina Hezretê Muhemmed, di 632yê de ereban ji başûrê Fransayê ta kevîyên Hindistanê, gelek welat kirin bin destên xwe. Du xanedan derdikevin holê: Ya ***emewîyan*** a ku Şam ji xwe re kiribû paytext, heta sala 750yê hebûna xwe dewam kir; dûre ya ***ebasîyan*** a ku Bexda ji bo xwe kiribû paytext, di sedsala IX. de gihîşt serdema xwe ya zêrîn, berî ku bikeve pêvajoya lawazbûn û parçebûnê û herî dawî jî di 1258ê de dema Bexda ji alîyê mongolan ve hat îstila kirin, xanedan bi temamî hilweşîya.

Împaratoriyên mongol

Di sedsala XIII. de mongolîyên li pey Cengîz Xan hatin, Împaratoriya herî mezin a dîroka cîhanê ava kir. Teknolojîyên eskerî û siyasî yên koçberan hiştin ku ew civakên curbicur dagîr bikin û wan bigihînin hev. Herçendî Împaratorî pişt çend nifşan ji hev belav jî dibûn, stratejîyên mongolî yên birêvebirinê tesîr li gelek Împaratoriyên ewroasyayî kirin.

Împaratorîya Osmanî

Ev împaratorîya misilman a ji hêla tirkan ve hat ava kirin, dê di sedsalên XV. û XVI. de bibe hêza sereke ya ewropî. Pêvajoya hilweşîna wê bi têkçûna wê ya di şerê yekem ê cîhanê de bi dawî hat û erdê wê ji alîyê serkeftîyên şer ve hat parve kirin. Mustafa Kemal encax karî li ser parçeyeke axa wê, Komara tirk saz bike.

Wergera ji fransî: Baran Nebar

YEHYA AL SELO: **Lehî I**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 60 x 40 cm

www.kurdi.org

Çile 1993

MUDAXALEYA ARTÊŞA TIRK LI BAKURÊ ÎRAQÊ

Şer derbasî Kurdistanê dibe

MICHEL VERRIER *

Seranserê sala 1992yê, di şerê li Kurdistana Tirkiyeyê de ji hezaran zêdetir kes hatin kuştin, bi pevçûna di navbera gerîlayên kurd yên Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) û artêşa tirk ji nuha û pê ve rojane ye, artêşa tirk ya ku meha cotmehê, ji bo gerilayên PKKyê ji kampên wan yên bingehîn qut bike, mudaxeleya bakurê Iraqê kir. Ev nakokî îro dikare hemû herêmê têxe talûkeyê.

YEHYA AL SELO: **Dêleşêr**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 100 x 100 cm

Her roj çapemenîya Stenbol û Ankarayê bîlançoya şerê di navbera gerîlayên Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) û arteşa tirk de ku li başûr û rojhilatê Tirkiyeyê didome, wek rapor diweşîne. Qasî kuştîyên herbê, yên ji hev hesabpirsinê, li ser zêde dibe. Endamên mîlîsên alîkarên dewletê yanî "korucu" û malbatên wan, ên ku dibin qurbanên êrişên PKKyê. Ji alîyê din de, ji 150yan zêdetir kurdên ku di rêxistinên Parastina Mafên Mirovan de kar dikin, bi alîkarîya bo gerîlayan tên sûcdar kirin û ji alî komandoyên dizî ve hatin kuştin. Bi ser vê de donzde rojnamevan jî bi eynî metodan hatin kuştin. Hukûmet dixwaze berpirsyarîya van kuştinan bavêje ser rêxistineke kurd ya integrîst ku dibê bi Îranê ve girêdayî ye; rastîya wê ew e ku ev kes ji alî "komandoyên qatil yên taybetî" ku di nav hêzên dewletê yên ewlekarîyê de cîh digrin û ji alî wan tên îdare kirin, hatin kuştin.

Di şerê xwe yê bê sînor yên li herêmên Rojhilat û Başûr, arteşa tirk, ne guhdarîya biryara sîvîlan, ne jî qanûnên ku bi halê taybetî hene, dike. Li gor du raporên ku ji alîyê çend mebûsên Partîya Sosyal-Demokrat ya Erdal Înönü ve ku di eynê wextê de endama hukûmeta koalisyonê ye, hatibû amade kirin, şanî dide ku nêzî sînorên Kurdistana Iraqê, li herêmên Botan, di pîrozbahîyên sersala neteweyî di Newroza, 21ê Adara 1992yê, de, li hember xwepêşandanên sîvîl û aştîxwaz yên bê çek û sîleh, tank û panzer hatine bi kar anîn. Bi taybetî bi şideteke gelek korane û hovane mudaxeleyî bûyerên Şernexê hatiye kirin.

Amnesty raporan li ser zulma dewleta Tirkiyeyê belav dike, lê Rojava li ser alîkarîyê berdewam e

Di 18 û 19ê meha tebaxa 1992yê de, Şernex, bajarek ku nifûsa wî ji sî hezaran zêdetir e, ji alîyê leşkeran ve hat wêran kirin û gel hat mecbûr kirin, an ber bi çîya ve biçe, an jî ber bi bajarên cîran ve. Li gor agahdarîyên fermî bi qasî hezar, hezar û pêncsed gerilayên PKKyê nava rojê êrişî ser bajêr kir, leşkeran yekser bersiv dan û bi qasî panzdeh sîvîl hatin kuştin. Çapemenîya tirkan, bi taybetî rojnameyên ***Hürriyet*** û ***Milliyet*** ku tu sempatîya wan ji van "teroristan" re tuneye, ev rastî qebûl nekirin û bi vê rastîyê razî nebûn, bi êrişeke weha mezin ya PKKyê bawer nedikirin. Li gor wan, li gel çembereke leşkerî û qewî, çawa êrişek di vê mezinbûnê de, dikare têkeve bajêr, bêyî ku tu zaîyatekê bide û bi paş de vegere? Rojnamevanê ***Turkish Daily News***, **Ismet G. Imset**, vê pirsê ji xwe dipirse: *"Ger êrişa PKKê ya li ser bajarê Şernexê rast be jî, gelo ev bûyer heq dide ku leşker şideteke bê sînor li hember hemû bajêr bi kar bîne?"* (1) Li gel ku ev bê qanûnîyên dewletê gelek caran ji alîyê raporên ***Amnesty Internasyonal*** ve hatine eşkere kirin jî, Ankara berdewam dike alîkarîya Rojava ya Ewropa û bi taybetî ya Amerîkayê bi navê "tekoşîna li hember terorîzmê" werdigire.

Îro, em ji hêvîyên ku di dema hilbijartinên parlemantoyê yên 29ê Oktobera 91ê peyda bibûn têra xwe dûr ketine. Di vê demê de koalîsyonek di navbêra partîya **Süleyman Demirel** ku bibû serokwezîr, ***DYP*** (*Partîya Rêya Rast*) û *Partîya Sosyal-Demokrat* ***(SHP)*** ya **Erdal Înönü** de çêbûbû. Partîya parastina mafên kurdan, **HEP**: *Halkin Emek Partisi*, (*Partîya Keda Gel*) bi 24 namzetên xwe bi ser ketibû û 24 wekîl hatibûn hilbijartin. Di her du heremên Dîyarbekir de, ku wek paytexta Kurdistanê tê hesab kirin, bi qasî ji % 37 ta ji % 70yê deng hatibûn bi dest xistin. Li heremên Botanê, Sêrt û Şernexê ji % 50yê dengan.

Bi carekê de, hukûmet biryarê dide ku mafên mirovan biparêze û hurmetê şanî bide, îşkenceyê bi dawî bîne û girtîgehan bike wek malên "camekan/şefaf". Her weha sozê dide ku çareserîyan ji pirsgirêka kurdî re peyda bike. Partîya HEPê, ku wê demê alîkarîya xwe dide hukûmeta koalîsyonê daku hukmên "rêveberîya awarte" ji holê rabe û dixwaze ku mafê perwerdeya bi zimanê kurdî bê garantî kirin, pirtûk û rojname bi zimanê kurdî bên weşandin û herweha otonomîyeke herêmî wek statu bê qebûl kirin.

Çareya hukûmeta tirk: Hîn bêtir leşker, tank û top û balafirên cengê

Ji buhara 92yê û vir de, piştî pelaxtina bûyerên herêma Botan, newala di navbêra HEPê û hukûmetê de çiqas diçe kûrtir dibe. Hêvîyên ku bi hilbijartinên 91ê peyda bibûn, di ber avê de çûn û li herêmê îro rewş çiqas diçe xirabtir dibe. *"Hêvîyên me hebûn, me xwestibû ku em bawer bikin, lê paşîyê çawa bû? Hukûmetê wek tedbîr; bêtir û bêtir leşker, helîkopter û tank û top şandin herêmê. Yanî cardin her wekî berê, tu guhertin çênebûn",* dibêje **Huseyîn Turhallî,** ku bi xwe ebûqat e û serokê partîya HEPê ya Dîyarbekirê ye.

Halbûkî ji bo daxistina tansîyonê pêşniyazî kêm nînin. Bo nimûne: Rojnamevanê radîkal yê ***Hürriyet***ê **Oktay Ekşî**, ku li deh an jî bîst herêmên kurdan referandûmekê difikire ku dikare dîyar bike ka gelo gel serxwebûnê, an jî jîyana bi hev re ya yekîtîya Tirkiyeyê dixwaze. (2) Serokkomar **Turgut Özal** pêşnîyaz dike ku televîzyona kurdî bê ava kirin, lê ev fikir ji alîyê serokwezîr **Süleyman Demirel** ve hat red kirin, bi sebeba ku yekîtîya zimanê tirkî tê parçe kirin û karakterê wî yê fermî tê şikandin. (3)

Rêveberê partîya ANAPê **Mesut Yilmaz**, (muxalefet), serokwezîrê kevnare, dibêje ku kurd karibin partîya xwe bi xwe ava bikin û ger bixwazin karibin ji bo Kurdistaneke serbixwe jî fikrê xwe beyan bikin, lê bi şertê ji hemû cûre şidetê vegerin. (4) Lê ev fikir bala tu kesî nakişîne, herweha ya HEPê jî. Turhalli weha dibêje: *"Partîyeke kurd ji berê de heye, ew jî PKK ye, ji % 80yê gel wê destek dike".*

Terefdarê çareserîyeke pasîvîst û dewleteke federal, partîya HEPê, dixwaze di navbeyna PKK û Ankarayê de bibe navber da ku agirbestek were îlan kirin. PKK ku avakirina Kurdistaneke serbixwe diparêze û kurdan hemûyan tîne ba hev, di vê gavê de têra xwe nerm bûye. Serokê partîyê **Öcalan** di vê derheqê de weha dibêje: *"Kurd, ji veqetandinê zêdetir, hîn bêtir ji bo yekîtîyeke azad in."* (5) Bêyhûde, belasebeb…

Artêşa tirk ya jakobenîst û kemalîst

Ji bo artêşa tirk, ku xwedî kultureke bê hempa ya **Jakobenîst** û **Kemalîst** û dîrokî ye, tu caran ne mumkun e ku otonomîyê jî qebûl bike. Li gor sondajeke teze, ku raya giştî ya tirk û kurd temsîl dike; ji % 55ê tirkan difikirin ku sebebên nexweşîyên li Başûr û Rojhelatê Tirkiyê, faalîyetên gerîlan e, ji kurdan % 1, bi vî şêweyî difikirin. Tam tersê wê ji %35ê kurdan bawer in ku sebeb hîn bêtir zilma dewletê ye û ji %30ê jî bawer in ku ji ber sebebên xwestina serxwebûnê ye. (6) Ev cudayetî di navbêna herdû gelan de çiqas diçe zêde dibe û yekîtîya welat tehdît dike.

Ji ber vê yekê li Îzmîrê, ku bi qasî milyonek kurd lê dijîn, ji nuha de, tirk belavokan belav dikin da ku esnafên kurd bên boykot kirin û ji dikanên wan dan û stendin û alvêr neyên kirin, ku tu kes kar nede kurdan, Li Dîyarbekirê, pêncsed polîs, bi munasebeta defnkirina hevalekî xwe, diqîrin û dibêjin: ***"Mirin ji bo hemû kurdan".*** Di 26ê meha 12ê de, Dadgeha Ewlekarîyê ya Dewletê di derheqê **HEP**ê de doz vekir û bi qedexekirinê tehdît kir.

Li Cizîrê, li Herzexê, li Şernexê û li Silopîyê têlên hidûdan û bircên çavdêrîyê yên tixûbên Iraqê û Sûrîyê şanî didin ku rewşa awarte û şer çiqas diçe bêtir bi cî dibe. Ev rewş tam dişibe rewşa salên 1950yê ku Artêşa Fransayê li Cezayîrê pêk anîbû. Li

www.arsivakurdi.org

hemû gundan mirov qereqolên leşkerî li gel torbên qûmê, mitralyoz û çekên otomatîk dibîne. Bi roj, leşker çek dagirtî, tilî li ser tetikê digerin, bi şev, tank û panzer li rêyên vala cirîdan davêjin.

Dema ku mirov sînor derbas dike, di navbera Cizîrê û Zaxoyê de û dikeve Kurdistana Iraqê, wek rêwî mirov derhal rehetîyekê, aramîyekê his dike, windabûna tansîyonê û hewa azadîyê tenefus dike. Halbûkî kurdên Iraqê di welatekî ku bi temamî ji alîyê artêşa Seddam ve wêran kirî de dijîn. Kurd, ji nû ve, çar hezar bajar û gundên xwe ava dikin. Malzeme gelek bê kelk û bê kêr in, pir kêm in, alavên xwarinê deradet buha ne, zêdebûna zarokên parsek li ber çavan e. Grubeke mafîyayê hemû stokên malzemeyên pêwîst girtiye destê xwe. Li hember vê anarşîya ku her ku diçû mezintir dibû, Enîya Kurdistanê, ku hemû rêxistinên kurdan tê de cîh digirin, qerar da ku hilbijartinan li dar xin.

Piştî gera Barzanî û Talabanî helwêsta rojavayîyan tê guhertin

15ê gulana bihurî, teqrîben, der dora mîlyon û nîv dengdaran êrişî ser buroyên hilbijartinan kir. Partîyên biçûk bi temamî hatin ji bîr kirin, lê deng nîve-nîv li her du partîyên bingehî hatin dabeş kirin; PDK, partîya **Mesûd Barzanî** û YNK, partîya **Celal Talabanî**, sed cîyên Meclîsa Hewlêrê di nav hev de parve dikin. Pênc cî jî, ji bo civata Asûrî–Kildanîyan (civata xiristîyan) hatine veqetandin.

Di vê rewşê de, di navbera du pozisyonên cuda de, ku ji alîyê du serokan ve tê tespît kirin, gel nizane çi biryarê bide. Di kampanya xwe ya hilbijartinan de, Mesûd Berzanî dida bawer kirin ku bi hukûmeta merkezî ya Bexdayê re divê li hev bikin, ji ber ku birêveberîya amerîkî û suûdî jî bawer dikirin ku Sedamek kêm qawet li ser hukum ji belavbûna Iraqê çêtir e. *"Ger serxwebûn, mafê dewletekê, ji netewa kurd re projeyeke siberojê be jî, di şertên îro de, pêwîst e mirov bikaribe bi otonomîyê jî îdare bike."* (7) Lê belê, ji bo Celal Talabanî; pêwîst e li gel muxalefeta Iraqî bi hev re enîyeke yekbûyî ava bikin û hukûmetê hilweşînin.

Piştî gera birêz Mesûd Barzanî û birêz Celal Talabanî ya meha tebaxa 1992yê, li welatên Rojava, bi taybetî li Amerîkayê, rewş hat guhertin. Bi vê gerê re, nakokî di navbera muxalefetê de kêmtir bû û enîyek ji bo rûxandina desthilatdarîya Sedam hate ava kirin. Ev stratejî, îro ji alî Kuweyt û Erebistana Suûdî ve jî tê parastin. (8)

Bi xêra vê mudaxeleyê, cara yekem li bajarê Selahedîn li Kurdistanê, hemû grubên muxalefetê civîyan. (9) Li vir, mecliseke neteweyî û hukûmetek hate ava kirin û ji xwe re rêveberîyek jî hilbijartin ku ji **Mesûd Barzanî**, generalê sunnî **Hessen Al Naqib** û oldarê şîî **Sayed Muhamed El Oulûm** pêk dihat. (10) Bi taybetî di vê civîna 31ê oktobera 1992yê de ji bo dewleteke federal qerar hate stendin, ku dikare gelek welatên cîran bihejîne û bi taybetî jî Tirkîye û Iranê. Ankara nerazîbûna xwe venaşêre, bi taybetî ku piştî şerê Kendavê, PKKê li Kurdistana Iraqê gelek kampên xwe çêkirin. Gerîlayên **Öcalan**, ji rewşa tevlîhev fersend peyda kirin û li hember otorîteya Barzanî û Talabanî ev tişt pêk anîn, bi ser de jî bi çavê "xayîn û feodalan" li wan mêze dikin. Di destpêka sala 1992yê de, PKKyê ji bo ku otorîteya Hewlêrê protesto bike, "hilbijartinên" xwe li dar xist. (11)

Mafê taqîbkirinê û herêmên ewle

Di vê atmosfera giran de, di oktobera 1992yê de, hêzên kurdên Iraqê, êrişek birin ser kampên PKKê. Hukûmeta Ankarayê ev yek li wan mecbûr kir. Ji ber ku Ankarayê jî bi êrişên xwe yên balafirî gef li wan dixwar û tehdît dikir. Tirkiyeyê ev yek wek mafekî rewa ya peymana navdewletî ku di 1983yê de bi Sedam re çêkiribûn, bi kar dianî. (12) Li alîyekî din jî ji ber sînorên di navbera wan de, PDK û YNK girêdayî û muhtacî Tirkiyeyê ne. Alîkarîya mirovî bi rêya Tirkiyê derbas dibe, li vir ku hemû balafirên Dewletên Hevpeymanî ji bo parastina kurdên Iraqê bi cî kirine û li wir mayîna wan jî bi biryara meclisa Tirkîyeyê derbas dibe.

Li gel ku agirbestek di oktobra 1992yê de, ji alî Hêzên Pêşmerge û PKK hate qebûl kirin jî û PKKê kampên xwe yê esasî belav kirin jî, artêşa tirk dîsa jî bi qasî sîh km. dikeve nav axa Kurdistana Iraqê. Ankara dibêje ez diçim alîkarîya dostên Hevpeymanî. Di demeke wisa de ku Hevpeymanîyê (îttîfaqê) serkeftina xwe îlan kiriye. Derdê Tirkiyê di vir de, ji xwe re di sînor de, heremên ewle ava bike. Paşê leşkerên tirkî paşde vekişiyan, lê delegasyonek li navê *"Genel Kurmay"ê* cara yekem çû Kurdistana Iraqê, ji bo ku bi pêşmergeyan re vê meseleya ewlekarîyê niqaş bike.

Ankarayê ji xwe biryara Dewleta Federal a Iraqê protesto kiribû û di 14ê meha 11ê de li gel Iranê, li Tirkiyeyê civînek li dar xist. Halbûkî di vê demê de Iran ji alîyê Tirkîyeyê ve wek alîkara PKK û Sûriyeyê dihat gunehbar kirin. Beşdarên vê civînê hemû qerarên Dewleta Federal protesto kirin û gotin ev biryar dikare Iraqê belav bike û bibe sedema avakirina dewleteke kurd. Ji bo meha sibatê civînek din dê pêk bê û ev tu cara ne di xêra kurdan de ye. Ji ber ku bîranînên xirab ji bo kurdan teze dike; di sala 1937ê de, ***Pakta Saadabadê*** ku ji alî Iran, Tirkiye, Iraq û Afganistanê ve hate îmze kirin ku bi vê yekê re, polîtîkayeke hevgirtî li hember tevgerên kurdan hate ava kirin, ev ji bo kurdan hîç ne bi xêr bû.

* Rojnamevan.

1 *Turkish Daily News* , 6 îlon 1992
2 9 îlon 1992
3 *Turkish Daily News* , 25 nîsan 1992
4 *Turkish Daily News* , 9 nîsan 1992
5 *Kurdistan Rapport* , Cologne, adar-nîsan 1992
6 Piar-Gallup, *Sabah* , 7 nîsan 1992
7 Lihevkirinên bi Seddam re, ji ber ambargoya Bexdayê li hember Kurdistanê, ji oktobra 1991ê vir de hatibûn daleqandin
8 *International Herald Tribune* , 3 tebax 1992
9 Sayid Muhamed Bakr El Hakim, serokê rêxistineke şîî, bi Tehranê ve girêdayî ye, ne beşdar e, lê gelek alîkarên wî di konferansê de beşdar in
10 Fawaz N. Trabûlsî "Li Iraqê alarm!"
11 Divê em destnîşan bikin ku HEP a ku ji bo hilbijartinên Parlemena kurd a Iraqê çavdêr rê kirin, ne xwedî heman helwestê ye
12 Christiane More, "Kurdistan, nelihevkirineke bi jan" le monde diplomatique (îlon 1987) û Kendal Nezan, Tirkiye, li Kurdistanê di nav avzêmê de dimîne"

Wergera ji fransî: Vehbî Aydin

Wênesazê vê hejmarê

Yehya Al Selo

Yehya Al Selo, di 1962ê de li bakurê bajarê Helebê li gundê Ahrasê ji dayik bûye. Perwerdeya xwe ya hunerê li zanîngeha Helebê temam kiriye. Yehya Al Selo bi gelemperî li ser wêneyên ebadmezin dixebite. Hunermend di xebatên xwe de bi piranî boyaxa rûnî bi kar tîne, di heman demê de karîkaturan jî çêdike. Li gel xebatên xwe yên hunera plastîk bi zimanê kurdî çîrok û romanan jî dinivîse. Yehya Al Selo ji ber sedemên siyasî welatê xwe terk kiriye û ev çend sal in wek penaberê polîtîk li Almanyayê dijî û xebatên xwe yên hunerî li wir didomîne.

Yehya Al Selo van çend salên dawîyê ji wêneyên xwe zêdetir bi taybetî bi karîkaturên xwe balê dikşîne ser xwe. Di çapemenîya kurdî de ji bo gelek rojname û kovaran karîkaturan xêz dike.

Yehya Al Selo, di wêneyên xwe de stîlên cûrbicûr bi kar tîne. Ji xetên realîst heta dîmenên konkret li ser mijarên fireh û ji hev cihê dixebite. Yehya Al Selo ji ber ku li ser ebatên mezin dixebite, di wênesazîya xwe de asoyeke fireh bi komposîzyoneke pir xweş radixe ber çavan. Hunermend bi giranî nexşên kurdî bi kar tîne, lê carna jî stîleke abstrak tev lê dike û heman nexşan bi şeweyekî nûjen pêşberî me dike.

Xebatên hunermend ku di nav de hem xetên klasîk, hem jî xetên nûjen dixuyên, bi reng û hestên xwe ji bo hunera wênesazîya kurdî dewlemendîyeke mezin e.

Hunermend pêşengeha xwe ya yekemîn di 1987ê de li Helebê vekir. Li Sûrîyeyê beşdarî gelek pêşengehan bû. Ji sala 2008ê vir ve li Almanyayê jî beşdarî pêşengehan dibe. Heta niha li bajarên Trier û Neuwiedê 3 pêşengeh vekirine.

Yehya Al Selo: **Jina kurd**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 60 x 40 cm

www.arsivkurdi.org

Di dema pêşbazîyeke hunera sporên şer de ku di televîzyonê de zindî dihat weşandin, serokwezîr Vladimir Putin ê tê de cih digirt, hat şermezar kirin. Namzedîya wî ya ji bo hilbijartina serokatîyê ya adara 2012ê reşbînî li nav welatîyên rûs belav kir, û bû sedemê bigewdebûna pirsên li ser paşeroj û nasnameya welêt, ku ev yek dikare di hilbijartinên giştî yên vê mehê de jî li dijî partiya wî bê bi kar anîn."

SERPÊHATÎYÊN NASNAMEYA RÛSÎ

"Em mîrasgirên çar û sovyetan in"

NINA BACHKATOV *

Bîst sal piştî jihevketina Yekîtîya Komarên Sosyalîst ên Sovyetî (YKSS, *li çarçoveyê binêrin*), Rûsya di heman demê de bi pirsgirêkên ji ber parçebûna împaratorîyê û bi zehmetîyên xwe yên taybet re rû bi rû dimîne. Ev dualîtî di nêzîkatîya welêt a li ser hilbijartina meclîsê yên kanûna 2011ê û hilbijartina serokkomar ya adara 2012ê de xuya dike. **Lilia Chevtsovaya** siyasetnas a ku li hember desthilatdarîya heyî bi zimanekî tûj diaxive, bîst salên bihorî weha xulase dike: *"Piştî herifîna komûnîzmê, Rûsya li hember rewşeke weha bû ku tu dewletên dinyayê berî wê pê re rû bi rû nema. Ne tenê diviya ew dev ji vîzyona der barê xwe de ya wek qûtba şaristanîyeke alternatîv, li gel têkilîyên xwe yên xwedî bandor û împaratorîya xwe ya erdî ya baş bi cîh kirî berde, lê diviya ew herweha bi awayekî radîkal qaîdeyên birêxistina dewlet û civakê biguherîne".* (1) Ev karê bi heybet dikare bi serê xwe şiroveya pêşketina Rusyayê bike ya ku, li 1992yê, li ser riya derbasbûneke dualî ya ber bi aborîya bazarê û demokrasîya awayê rojavayî diçû û bi pey re, ji vê riyê derket û berê xwe da rêkeke neteweyî ya hîn baş nayê tarîf kirin. (2)

Di heman demê de, pirsa nasnameyî girîngîyeke taybet bi ser xwe girt. Rûsyayê nedikarî li gor mînaka komarên din ên YKSSa berê bike, yên ku nasnameyên xwe li gel redkirina rabihorîya împaratorî û sovyetî xurt kirin. Di serî de ji ber ku ew mîrasdara heq û ferzên navneteweyî yên YKSSê ye: Kûrsîyên li Desteya Ewlehîyê ya Rêxistina Neteweyên Yekbûyî û rêxistinên navneteweyî yên din, ne tê, malûmilkên li bîyanistanê, hêza nukleer -ku ew jixwe pê serbilind e û li gel van tiştan statûya xwe ya hêza mezin pê rewa dike. Wekî din jî, ji ber ku xelkê rûs hîn bi alîyê federal û pirneteweyî ya welêt ve girêdayî dimîne, ku ev herweha taybetmendîyeke împaratorîyê ye.

Formeke erênî ya kevneparêzîyê

Ji ber vê yekê, qutbûna 1991ê mîraseke nezelal e. Li alîyekî, rûs kêfxweş bûn, ji ber ku ew ê edî karibin tevahîya pere û enerjîya xwe ji bo pêşketina xwe ya xweser terxan bikin, li şûna ku pêwîstîyên hemû "împaratorîya" çarîst an sovyetî bi ser xwe bigirin. Li alîyê din, wan bi zorê dîtina Rusyayê ya wek hêzeke di têkçûyînê de û feqîrbûyî qebûl kir, ya ku sînorên wê ji sedsala 18ê û vir de yên herî teng in û şêwirmendên rojavayî yên tên wê "medenî" bikin, wê weke şagirdeke ne pir jêhatî dibînin.

Serokkomar **Borîs Yeltsîn** (1991-1999) jixwe di girîngîya vê pirsa nasnameyî gihîştibû, lê roleke bi piranî bikêrhatî didayê: Nûkirina lihevhatineke neteweyî bi pey ji holê rabûna îdeolojîya komunîst û misogerkirina yekgirtîya pêwîst a ji bo serkeftina reforman. Di 1992yê de, wî komîteyeke taybet bi tarîfkirina guhertoyeke modern a têgiha kevin a "fikira rûsî" (*ideïnost*) (3) peywirdar kiribû –ku weke komîsyonên peyrew ên xwedîyên heman armancê, ji bilî minaqeşeyeke tevlihev tu encam jê derneketin. Jixwe, serokkomaran li pey hev hemûyan hewl dan ku hesta bingeheke hevpar a ji tevlîbûna dewleteke pirneteweyî û federal, her weke ji çandek, zimanek û dînekê pêkhatî, biparêzin; ev bingeh jixwe têgiha sedsalane ya tarîfa nasnameya rûsî ligel pevgirêdana sêserîya ortodoksî-çar-civata gel berdewam dike. Ev meraqa ji bo parastina girêdana rabihurîyê ne helwêsteke nostaljîk e: Ew ji şiklekî erênî ya muhafezekarîyê tê, ya ku hedef dike yekîtîya neteweyî biparêze, bêyî ku rê li ber guherîna welat ji bo demokrasîyeke pişt-împaratorîyê bigire. **Oleg Morozovê** cîgirê serokê **Duma**yê nîsana 2006ê bi awayê xwe heman tişt îfade kir: *"Em peyrewên dîrokê ne, yên hemû hikûmetên rûsî... Ne weke çepgir an rastgiran, em hem peyrewên Rûsyaya çarîst, hem peyrewên Rûsyaya sosyalîst in... Ji bo ku dilsozên kevneşopîya sedsalane ya xizmetdêrîya welêt bimînin, em muhafazekarîya xwe tînin ser zimên".* (4)

Lê belê, riya li ber vê armancê asê ye. Rast e ku Rûsya federal û pirneteweyî ye, lê belê gelên pêkhênerên wê jî dixwazin ji nû ve bi eslê xwe bijîn. (5) Ew tevlîbûna xwe ya di federasyonê de minaqeşe nakin, lê belê tunebûna pêşniyazeke ji aliyê federasyonê ve ku statuya wan di navbera modela împaratorî û *homo sovieticus* de terîf bike, qebûl nakin. (6) Jê zêdetir, welat ji çend mîlyonên karkerên koçbûyî re bû cîh û war (ji deh nîştecihên Moskvayê yek e), ku hindik caran xristîyanên ortodoks in û ziman û çanda rûsî weke insûreke nasnameyî nahesibînin.

Nasnameya rûsî ya weha têgihîştî jixwe dihele, ne tenê li cem bajarîyên di bin bandorên navneteweyî de mayî, lê heta li nav gundîyên ku êdî êvarên xwe li ber ekranên televîzyonê derbas dikin û li *talk show* û terzên jîyanê û danûstandinê yên ji çanda orf û adetî bi temamî qutbûyî temaşe dikin. Dawîyê, ji bo gelek rûsên wek siyasetnas **Andreï Melvil**, heta "fikira rûsî" li ser bingeha têgihên hêz û cudatîyê tê danîn, lêgerîna nasnameyî wê rê nede welatê wan ku têkilîyên navneteweyî yên hemdem pêş de bixe.

Tevlî bernameyên hemdemkirinê yên mohra xwe li ser du dehsalên dawîn hiştiye, civaka rûsî bi esasî muhafezakar dimîne. Rayedar tê gihîştin ku istiqrar nirxa herî mezin ya stargehê ye: Eger piranîya nifûsê, guherînan ji şansekê bêhtir weke rîskekê dibîne, ew ji rejîmeke ku desthilata wê rûyekî istiqrarîyê nîşan dide xelkê, pir razî ne. Muxalefeta komunîst şiklekî berdewamîyê temsîl dike, li gel nostaljîya bihişteke ku bîranînên wê xweş in, lê vegera wê nayê xwestin. Herçi muxalefeta nekomunîst, ew wek laşekî bîyanî dimîne ya ku di kolanan de dike xirecir, ji civaka ku bi qasî derdorên desthilatdar ji parêzvana tebatîya siyasî ya heyî veqetandî ye. Ji xwe, muxelîf aynî muxelîfên salên 1980ê û 1990ê ne, bi taybetî **Guennadi Ziouganov** (damezirînerê Partîya Komunîst a Rûsî li 1990ê), **Vladimir Jirinovski** (gelperestê ji netewperestîyê sûd werdigre, damezirînerê Partîya Lîberal Demokratîk a Rûsyayê –LDPR) an **Grigori Iavlinski** (Partîya Demokrat a Rûsî –Iabloko). Serkêşên din ên muxalefetê "kevnerayedar" in û hin ji wan tevlî biryardana heman qeraran bûne ku ew îro rexne li wan digirin: **Mikhaïl Kasianov**, kevneserokwezîr; **Boris Nemtsov** kevnecîgirê serokwezîr; **Vladimir Ryjkov** kevnenûnerê gel; **Vladimir Milov** kevnewezîrê enerjîyê; **Garry Kasparov** kevneşampîyonê kişikê, **Edouard Limonov** kevnenivîskar. Îdeolojîya wan hewqas nezelal e ku heta pîvanên çepgir an rastgiran jî li van tevgerên bi xetên guherbar nayên.

Dibûya ku gel hinek sempatîyê ji bo muxalefeta nekomunîst, çendî rênexistî jî bibe, hîs bikira; eger rojavayîyan hewqas bi giranî piştgirîya wê nekira. Ev piştgirî îmaja kasteke piçûk dide ya ku, ji bo berjewendîyên xwe, reformên bi ilhama bîyanîyên nehevalên Rûsyayê pêşkêş dike û tevlî semîner û konferansan dibe da ku welêt rexne bike û ji van bîyanîyan sûdê werbigire. Jê xirabtir: Li gel vê piştgirîya bê şert û merc, muxelîfên lîberal bawer dikin û bi muxatabên xwe yên rojavayî didin bawer kirin ku projeyên wan ji ber zilmkarîya rayedaran û li derve hiştina wan a ji medyayên di destên desthilatê de têk diçin. Di rastîyê de, ew dikarin bi riya medyayên muxelîf ên belavkarîya wan sînorkirî ye lê xwendevanên wan ji siyasetê hatî ne (7) xwe bigihîjin sinifa navîn a nû, ku dibe dengên xwe bide wan. Eger partîyeke muxelîf a yekgirtî hebûya, wan jî karîbû dij-ixtidarekê pêk bînin.

Festîvala muxalefetê ya ku 1 û 2ê cotmeha dawîn li dorhêla Moskvayê çêbû, vê korbûna siyasî baş xuya kir. Ji bernameyan bêhtir, sohbet li dor pêvajoya hilbijartinan a *"ji encaman girîngtir"* tê hesibandin geriya. Nîqaş li ser pirsên weha rawestîya: Gelo divê em deng bidin? Bidin kîjan namzetê heyî, heta komunîst û LDPR jî, da ku *"muxalefeta Rûsyaya yekgirtî xurt bikin"*? Gelo divê mirov bultena xwe xiş bike an biqetîne da ku netê be? Rayedarên wek **Kasparov, Nemtsov** û **Limonov** bi tîj û tundî behsa bersiva wan a muhtemel kir, eger **Putîn** ew dawet bikirana: Qebûlkirina dawetê, redkirina wê, çûna Kremlînê lê redkirina nîqaşê, çûn, lê tenê bi amadebûna wezîrekî taybet nîqaş kirin, hwd. Kengî, piştî demeke dirêj, ji gelê amade re destûra pirskirinê dan, dijûn û xeber di odeyê de hatin avêtin û sifatên wek provokator û ajanê Kremlînê di nav bijarteyan de man. **Vladimir Ryjkov** (Rûsyaya Din) wek awayê tenê ya *"beşdarnebûna komedîyekê"* boykotê diparêze (8), **Mikhaïl Kasianov** (Yekîtîya Demokratîk a Gelane) jî li Parlemana ewropayî di nav hewldanan de ye ji bo ku rojavayî hilbijartinên hîn çênebûyî nas nekin. (9)

"Demokrasiya bi dengê gel"

Herçi serokkomar **Medvedev** û serok-wezîr **Putîn**, ew bi lêgerîna nasnameya rûsan û daxwaza wan a cuda û bihêzbûnê baş gihîştin; ev jî redkirina modelên ji hêla rojavayîyan ve hatî pêşkeş kirin, weke salên 1990ê, bi hincêta serkeftina di şerê sar de rewa dike. Pergala heyî kevneşopîya desthilatdarîya rûsî bi guhertoyeke hemdem diparêze -bêyî têkoşîna çekdarî-, ev jî tê maneya hevsengîyeke quwetan a herdemîn li nav derdoreke piçûk a bijartîyên li dor serok, yekgirtî. Endamên vê derdorê ji prestîj û xwegihandina serêkanîyan feydayê werdigirin, her weke xwedîyên heqê bikaranîna îmkanên îdareyî ne, yanî da ku dengê serok vedin û hilbijartinan qezenc bikin, dikarin budceyên federal, herêmî, xwecihî û rêxistinên dewletî, bi kar bînin. Tu kes hewla sextekirina dengdanê nade, lewre ku guman li ser serkeftina partîya desthilatdar nîne. Lê hedefa wê wergirtina rêjeyeke bilind a dengan e ji bo ku xuyanîya piştgirîyeke gelane ya berfireh jê derkeve û biryarên siberojê meşrû bike. Li ser vê, em dikarin behsa "demokrasîyeke plebîsîtê" bikin, ya ku elementên demokrasîyê di xwe de vedihewîne, lê ne demokrasîyeke rastîn e.

Di vê pergalê de, muxalefet ne qedexe ye: Ew beşeke tevna desthilatê ye. Kremlîn bê navber dibêje ku civakeke hevdem nikare bi tenê ji hêla partîyekê ve bê bi rê ve birin û ji salên 1990ê ve, serokkomarî hebûna partîyên muxelîf li Dumayê misoger dike û heta wan bixwe bi rêk dixe û fînanse dike. Yeltsîn dixwest rê li ber vegeriyana ser desthilatê ya Partîya Komunîst ya bi riya dengdanê bigire, lê Putîn û Medvedev xeyala afirandina pergaleke dupartîtî –weke li Dewletên Yekbûyî an Keyatîya Yekgirtî– dikin, ku yek ji van partîyan wê partîya wan, Rûsyaya Yekgirtî be. Hewldana Kremlînê ya havîna bihurî dîsa damezirandina Partîya Doza Heqdar, bi peywirdarkirina **Mikhaïl Prokhorovê** mîlyarder ku dikare hem partîyê fînansê bike û hem dengdarên lîberal ber bi xwe ve bikişîne, li serokatîya wê, şahidê vî tiştî ye. Lê belê partîyê ew bi daxwaza ferzkirina mirovên wî li ser lîsteyê mehkûm kir û ew red kir.

Kremlîn weha bêhtir girîngîyê dide muxalefeteke înşaker" a ku cihêkarîya fikiran nîşan dide, bêyî ku lihevhatina civakî biçirîne. Demeke berî niha, **Medvedev** ev tişt li ber xwendekarên zanîngeha **Barnaûl** ên endamên şaxa xwecihî ya Rûsyaya Yekgirtî şirove kir: *"Mirov dikare bi du awayan nerazîbûna xwe şanî bike. Dikare bi qelabalixî ji derve îtîrazê bike, an jî dikare ji xwe re bêje: "Ez ji vêya nerazî me û ez dikarim tiştan di hindûr de biguherînim"."* (10) Lê dîsa jî, di paşxaneke siyasî ya weha de, îlankirina **Putîn** a berbijêrîya xwe li hilbijartina serokkomarî ya adara 2012ê, di ber Kongreya Rûsyaya Yekgirtî de, milet xist şokê. Rast e ku ev deng li **Moskvayê** bi salan dihat bihîstin, lê belê agahî hewqas bi dizî hat parastin ku heta hevkarên nêz, wezîr û rayedarên partîyê jî şaş man. Ji bo îdareya heyî, ev tê maneya sekinîna heta gulana 2012ê, piştî sondxwarîya serokkomarê nû. Morala wê evçend nizm e ku li destpêka mijdarê, kesekî eleqedar wesfa atmosfera niha weke *"nêzîkî atmosfera li bunkera Hîtler a gulana 1945ê tê hesibandin"* da.

Zilamê berî yê îlahî westiya ye

Tê gotin ku **Putîn** ji ber anketan biryara berbijartinê da: Wan bi istiqrarî şanî da ku şansê wî yê qezenckirineke bi rihetî ji yê serokkomarê niha pirtir e. Jixwe, di vê demokrasîya hindik demokratîk de, rayedar bê navber anketên raya giştî çêdikin, berî, piştî û li nav her biryarekê. Lê belê, tevî ku herdu hevkarên dueta ji 2008ê ve li ser desthilata Rûsyayê ye *(li kronolojîyê binêrin)* ev daxwaza gelane ya dualî, istiqrar û hêza welêt, baş fêm kir -ku xuya ye yek ji herduyan jî ji yê din bêhtir bersivê dide van daxwazan-, êdî sal ne 2000 e ku **Putîn** di wê demê de bi pey kaosa salên 1990ê re wek mirovê xilasker derketibû holê. Di serî de ji ber ku wî bi xwe berbijêrîya serokkomarîyê ya **Medvedev** pêşnîyar kir û herweha serokwezîrê wî bû. Wekî din, lewre ku xirabîyên herî pir dibin sedema gazincên xelkê -bertîlxurî û bihabûna jîyanê- encamên siyaseteke

YEHYA AL SELO: **Evîn**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 60 x 40 cm

www.arsivakurd.org

weha ne ku wî jî wek serokwezîr, dike berpisîyar.

Êdî gelek rûs weha ditirsin ku istiqrar wê welêt ber bi tebatîyê ve bibe, tevî ku hin xweşbîn hê jî ji **Putîn** hêvîya destpêkirina reformên nû yên 2012ê dikin, wek wî 2000ê kiribû û herweha hêvîdar in ku **Medvedev** wê ji xurtbûna desthilata hikûmetî ya serokwezîrê niha xuya dike, sûdê werbigre, da ku hikûmeteke bêhtir reformker pêk bîne.

Li Dûmayê jî, sal ne sala 1999ê ye. Ji 2007ê ve, çar partî tê de temsîlkirî ne: Rûsyaya Yekgirtî, 315 nûner (ji 2003ê 94ên zêdetir), Partîya Komunîst 57 hilbijartî (6ên zêdetir), LDPR a 40 kursîyan zeft dike (3ên bêhtir) û Rûsyaya Adil 38 nûnerên gel (ev partî li 2007ê tunebû). Divê mirov bi haydarî li anketên raya giştî binêre, bes li gor anketan, dê tenê hersêyên pêşî derbasî rêjeya % 7ê bibin ku rê li ber pêkanîna grûpeke meclîsê vedike (11) û Rûsyaya Yekgirtî dê tenê piranîyeke sade bi dest bixe. Di hilbijartina herêmî ya adara 2011ê de, referansa dawîn a hilbijartinê, ev partî di çend herêman de ket rêza sêyemîn.

Ev tekçûn bû sedema endîşeya Kremlînê û bê guman di vegera **Putîn** de xwedîya rolekê ye. Lewre ku walîyên berpirsên vê tekçûnê di demeke weha kurt de nikarin bên guherandin, vê carê wê kampanyayeke rastîn lazim be da ku dengdarên bêbiryar ber bi sindoqan ve bên kişandin. Dibe ku piranîyeke piçûk ji bo partîyên welatên xwedîyên demokrasîyeke kevin bes be, lê ne ji bo Rûsyaya Yekgirtî ya ku naxwaze bi dengdana partîyên din ve bê girêdan. Heta berê destpêka kampanyaya parlemanê jî, Kremlînê endamên payebilind ên partîyê, her weke giregirên îdareyên serokkomarî û hikûmetî, şandin çarhêlên welêt û di serî de herêmên dudil.

Putîn hîn bes dilxwaz e ku hilbijartinan qezenc bike, lê belê îmaja wî ya mirovekî xurt ji holê rabû, herweke rêzgirtina beşeke gel. Xedarîya komîkan a ku xelkê dikenîne, alozîya karîkaturan, şibandina rojane ya Rûsyaya Yekgirtî bi "partîya diz û çeteyan", nîşanên vê yekê ne. Hertişt îşaretê dike ku awayê îlana bêrbijêrîyê, xeletîyeke mezin a ragihandinê bû û daxuyanîyên piştî wê jî rewş xirab kir, ji ber ku **Medvedev** û **Putîn** da zanîn ku cihê xeletîyê tunebû, ji ber ku biryar çar sal berê hatibû girtin. Welatîyan weha hîs kir ku ew hatin xapandin û tevî ku ew ê kevneserokkomar ji ber pêbawerîyê, an jî tunebûna alternatîvan dîsa hilbijêrin, rîsk heye ku ew cezayê li Rûsyaya Yekgirtî bibirin. Pirseke din jî heye: Gelo Medvedev ku wê serkêşîya lîsteya Rûsyaya Yekgirtî ya ji bo hilbijartinên meclîsê bike, dikare piştî encamên xirab ên muhtemel li ser desthilatê bimîne?

Ji ber vê yekê, em nikarin yekser bêjin ku *"Ew ê bi heman kesan bidomîne"* û weha hilbijartinên bê analîz bikin. Encamên hilbijartinên kanûn û adarê çi dibin bila bibin, karbidest wê mecbûr bimînin ku bi awayekî cuda bixebitin û bê guman fêrî hevjîyana li gel hêzên din jî bibin. Lewre ku serokkomarê bê niha wek mêrekî westayî û bêsebir xuya dike, dûrî rewşa wî ya yanzdeh sal berê. **Medvedev** jî ji dema devjêberdana hilbijartina serokkomarîyê ve, rihet û rizgarkirî xuya dike. Jixwe, pareke personela siyasî nêzî temenê malnişînê dibe, bi taybetî ji nav refên "mêrên rutbedar" *(siloviki)*, gazîyên hêzên leşkerî û servîsên ewlehîyê ku Putîn 2000ê bi xwe re biribûn.

Pirsgirêkeke nifşî di nav qatên herî dûrî hev ên civakê de jî heye, ku bi hezaran ciwan êdî bi rastîya kolxoz, komîteyên navendî an kampên Komsomolê nizanin. Nîqaşa li ser texlîd an redkirina Rojavayê wan eleqedar nake; Ew ne xwedîyên nostaljîyê ne û ne jî nefretê. Berevajî dê û bavên xwe, dinya bi xêra Înternet, medya û îmkanên rêwîtîyê li ber wan vekirî ne. Bi gotinên xwe, ew dixwazin li welatekî "asayî" bijîn.

* Redaktora Inside Russia & Eurasia (www.russia-eurasia.net).

1 Lilia Shevtsova, *Russia: Lost in Transition. The Yeltsin and Putin Legacies*, Carnegie Endowment, Washington DC, 2007

2 Bixwîne: Vladislav Inozemtsev, "Russie, une société sans citoyens", *Le Monde diplomatique*, cotmeh 2010

3 Kovereke ku ji aliyê Fiodor Dostoyevskî ve hatiye birêvebirin, wiha dinivîsand : "*Rûs neteweyeke di asta bilind de xweser in û ji bo me girîng e ku em formeke xweser çê bikin û ev form divê ji xaka me hatibe wergirtin.*" Ev "ramana rûs" dirêjî sedsala XIX. dibe û tevî ku di bin awayên cihêreng jî derketiye holê, ew ji aliyê gelek nivîskar û zanyaran ve hatiye parastin. Îro hêzên siyasî yên ku nasnameyeke ewro-asyayî ji nû ve dertînin pêş, bi bî awayî rêgeheke xweser a li dijî Rojava tînin bîra mirov

4 www.edinros.ru, 15 nîsan 2006

5 Rûsya % 80 rûs û nêzî sed gelên resmî naskirî di xwe de vedihewîne, ku tatar ji wan koman ê herî mezin in (% 4ê nifûsê)

6 Bixwîne: Laurent Bazin, "La pandémie de l'"identité nationale"", *Le Monde diplomatique*, sibat 2010

7 Rojnameya *Novaya Gazeta*, rêzeke malperên Înternetê weke Vedomosti (www.vedomosti.ru) an Kommersant (www.kommersant.ru), radyoya Ekho Moskvy, hwd

8 "The Kremlin's Political Cartel", *The Moscow Times*, 11 cotmeh 2011

9 "Time to lean on Russia", nameya vekirî bi hevîmzaya serokê Partîya Lîberal a Ewropî, Guy Verhofstad, *International Herald Tribune*, Neuilly-sur-Seine, 25 îlon 2011

10 Axaftina li ser NTVê weşandî, 1 mijdar 2011

11 Bi zagona hilbijartinê ya nû, ev rêje dê ji bo % 5ê dakeve

Wergera ji fransî: Simko Destan

Pelişîna aloz a YKSSê

Roja 8ê kanûna 1991ê, sê serokkomar wek sûîkastvanan li nêçirxaneyeke di kûrahîya daristana piyê mirovan pêneketî a belarûsî de civiyan. Bêyî tu wekaleta ji komarên wan, an ji komarên din jî, **Boris Yeltsînê** rûs, **Leonîd Kravçûkê** ukraynî û **Viaçeslav Şûşkevîçê** belarûsî îmza avêtin bin peymanên ***Mînsk***ê û weha jihevketina Yekîtîya Komarên Sosyalîst ên Sovyetî (YKSS) 31ê kanûna 1991ê û şûna wê avakirina Civata Dewletên Serbixwe (CDS) îlan kirin. Gazî duwanzdeh komarên federalbûyî yên din ku wê demê YKSS pêk dianîn, hat kirin ku beşdarî CDSê bibin.

Ev komar bêhazirî man: Tevî ku piranîya wan bi mehan behsa "hikûmdarîyê" dikir, li derveyî komarên baltikî, wan tucarî serxwebûneke temam nehesibandibû. Pêla şokê bi taybetî li Asya Navîn û li Qafkasyayê –ji bilî Gurcistanê- hat hîs kirin. Herçî serokkomarê Qazaxistanê Nûrsultan Nazarbayev, dana biryareke bi vî rengî bêyî ku nûnerekî ji duyemîn welatê berfirehtir ê YKSSê amade bibe, qebûl nedikir. Hêrsa wî bi bîra sê serokkomaran xist ku Yekîtîya Sovyetê ne bi dinyaya slavî bi sînorkirî bû.

Ji ber vê yekê, roja 21ê kanûnê li Alma Atayê, gaveke din hat avêtin. (1) Peymanên bi heman navî, ku ji panzdeh komaran yazdehan ew îmze kirin, CDSa nû bû resmî. Sê welatên baltîk jî (Estonya, Latvîa û Lîtuanya) fersenda qulibandina rûpela sovyetî girtibû û li gel welatên Ewropaya navîn û rojhilatî rêz bûn, yên ku piştî hilweşîna Dîwarê Berlînê, mîrasa komunîst imha kiribû û daxwaza tevlîbûna sazîyên weke Civata Aborî ya Ewropî (CAE) û Rêxistina Peymana Atlantîka Bakûr (NATO) kiribû. Hikûmeta netewparêz a Gurcistanê jî meraqdara nîşandana serxwebûna xwe ya tevayî bû û tevlîbûna CDSeke di bin serdestîya Moskvayê de red kir.

Wek sembol, dawîya YKSSê li gel wêneyê daxistina alayeke sor û libakirina perçema sêrengî ya rûsî ku aniha jî li ser Kremlînê pêl dide, tê bîra mirov. Ev roj 25ê kanûna 1991ê bû lewre ku serokkomar Mîkhaîl Gorbaçev çend rojan berî tarîxa 31ê kanûnê îstîfa kiribû. Panzdeh komarên serxwebûyî ji wê demê pê ve bi pirsgirêkên derketina ji sovyetîzmê re rû bi rû man; di serî de qutbûna ji îdeolojîya marksîst-lenînîst a ku, tevî bêhêvîbûna gelek Sovyetan, hê jî çîmentoya jîyana siyasî, aborî û civakî ya welêt bû.

Jixwe ne cihê şaşîtîyê ye ku dewletên nû li peyrewên karîbû yekbûna civakî misoger bikin û sazûmanan rewa bikin, geriyan: Netewparêzî û dîn ji hêla pergala sovyetî çiqas tade li wan hatibû kirin jî, hewqasî bi xurtî dîsa derketin holê. Desthilatdaran herweha karê venivîsandina rabihurîyê girt ser xwe, da ku hestiyarîyeke neteweyî li welatên bi piranî ji referansên dîrokî yên bi sînorên nû ve girêdayî bêpar çêbikin. Qet nebe, efsane hebûn ku dikarî nirx pê were dayîn: Kozakê azad û serbilind, pêşîyê hemû ukraynîyan; mîrasa Cengîzxan a çend welatên Asya Navîn lê xwedî derdikevin, hwd.

Lê belê, berî hertiştî, pirsgirêkên siyasî, aborî û civakî rê dan. Armanca van hemû komarên nû, sazkirina demokrasîyeke dabeşkir bû, bes li derveyî partîyên komûnîst, rêxistin lê tune bûn. Di mînakên herî serkeftî de, di navbera partîya desthilatdar, muxalefeta komunîst a tevindar de veqetiyanek hebû, lê nedikarî bi riya sindoqan vegere ser textê desthilatê –ji bilî li Moldavyayê, sala 2001ê–muxalefeteke nekomunîst li nav komikên piçûk dabeşkirî, yên ji reqabetên îdeolojîk bêhtir şexsî, timî şiklên nû digirtin.

Di warê aborî de, armanc ew bû ku aborîya bazarê bi lezûbez şûna pergala plankirina navendî bê danîn. Alîkarîya bîyanî modeleke ultralîberal û vekirina tevahî ferz kirin, ya ji bo veberhênerên bîyanî yên ku kêmanîyên personela siyasî û kêmbûna aborînasên nemarksîst bi kar dianî da ku peymanên neadil bi dest bixin ku komar tenê salan bi şûn ve ji wan rizgar bûn. Wek mînak, Dûmaya rûsî tenê 2003ê zagona li ser dabeşkirina qezencan, PSA (Power Sharing Agreement) (2) guherand û Qazaxistanê tenê 2010ê veberhênerên zemînên petrolê yên Kaşagan xistin ber destan.

Dawîyê, pirsgirêkên civakî jî pir bûn. Ji bo piranîya gel, dawîya YKSSê hat maneya qutbûna girêdanên malbatî, çandî û zanistî yên li nav komaran. Belavbûna jêrxaneyên ku bûn yekîneyên serbixwe, nikarin bên xebitandin û vekirina bazarên neteweyî li itxalatan, bûn sedema nemana bi hezaran karan. Xelkê neewlehî û tirsa ji siberojê hîs kir, herweke heyînîya sinifên civakî yên cihêkirî, herifîna nirxên malbatî û girîngîya pere û milkên madenî.

Bi pirsgirêkên mîna hev re rû bi rû mayî, hikûmetan ligel hin guhertoyên neteweyî jî bersivên hevreng dan: Li herderê, desthilat li ser bingeha serokkomarîyeke xurt, meclîseke ku weke odeyeke qeydkirinê dixebite, çapemenîyeke ku bivê nevê piştgirî dide biryarên resmî; di warê aborî de, têwerdana dewletê rê dide parastina şirketên xwecihî û ferzkirina alîkarîyê ji bo xizmetên civakî û jêrxaneyên herêmî li ser şirketên ferdî. Ev awayê xebatê xwedêgiravî nedaîmî bû û diviyabû wext bidaya aborîya bazarê da ku pergaleke fînansî ya têra xwe qalind li hember reqabeta navneteweyî çêbike; lê ew hê jî di dewrê de ye.

N.B.

1 Paytexta Qazaxistanê ya wê demê, ku bi pey re navê Almaty lê hat kirin. Ji 1997ê ve paytext bû Astana

2 Power Sharing Agreement qeydeyên belavkirina qezencan di navbera veberhêner û dewleta eleqedar de dest nîşan dike

Wergera ji fransî: Simko Destan

Çend tarîx

25ê kanûna 1991ê: Ala rûsî li ser Kremlînê cihê ala sovyetî digire.

Çile 1992: Serbestkirina fiyetan.

Cotmeha 1992ê: Destpêka ferdîkirina malûmilkên dewletî.

24ê îlona 1993ê: Nûnerên gel li pey şeş mehên pevçûna li gel serokkomar di derheqê erk û hêzên wî de, xwe li Meclîsê asê dikin; Boris Yeltsîn bang li artêşê dike da ku wan derxîne.

12ê kanûna 1993ê: Pesindkirina Destûra Bingehîn bi rêya referandûmekê û hilbijartinên meclîsê.

11ê kanûna 1994ê: Êrişa li ser Grozny.

3yê tîrmeha 1996ê: Ji nû ve hilbijartina Yeltsîn.

16ê tebaxa 1999ê: Viladîmîr Putîn dibe serokwezîr.

1ê cotmeha 1999: şerê Çeçenistanê yê duyemîn.

31ê kanûna 1999ê: Yeltsîn, Putîn wek berbijêrê serokkomar pêşniyar dike û îstîfa dike.

26ê adara 2000ê: Putîn tê hilbijartin.

14yê adara 2004ê: Putîn dîsa tê hilbijartin.

2yê kanûna 2007ê: Hilbijartinên meclîsê yên pêşî ku li gel rêjeya lîsteyên partîyan tên meşandin.

2yê adara 2008ê: Dîmîtrî Medvedev wek serokkomar tê hilbijartin.

8ê gulana 2008ê: Putîn dibe serokwezîr.

YEHYA AL SELO: **Bazar**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 120 x 90 cm

www.arsivakurdi.org

NIVÎSKAREK, WELATEK

Serpêhatîyên ukraynî

ANDREÏ KOURKOV *

Andreï Kourkov, nivîskarê herî navdar ê hevdem ê ukraynî ye li dinyayê, lê belê ew bi rûsî dinivîse. Di romanên wî de penguenên noyrastênîk (kesê rayên hêrsa wî lawaz) û vîzyonên nementiqî hene, lê belê mijara wan timî pirsgirêkên siyasî ne. Andreï Kourkov mîrasgirekî Gogol e: dema ku realîte bi rastî sosret û sosirmet be, hingê ya ku wê rastiyê nîşan bide fantezî ye.



YEHYA AL SELO: **Jîyana gundan**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 80 x 80 cm

Ez kesekî xwedî şans bûm. Ez li ***Ukrayna***ya sovyetî mezin bûm, ez bi xwe tê de jîyam û min şahidîya jihevketina *Yekîtîya Komarên Sovyetên Sosyalîst*, (YKSS) kir û ev nozdeh sal in, eger ez rasterast tê de cih nagirim jî, ez bûyerên li welêt dişopînim.

Di nozdeh salên jîyana hevpar de, min karî awayê bîrbirina Ukraynayê têbigihim: Lewleba ***Foucault***, ya ku di navbera Rojhilat û Rojava de diçe û tê.

Li destpêka salên 1990ê, min û jina xwe, me li navenda dîrokî ya ***Kîev***ê studyoyek kirî û berî her tiştî me tê de derîyekî polakirî yê dikare xwe li ber guleyan bigire, da bi cih kirin. Wê demê, bajar, weke hemû deverên din ên welêt, ji alîyê komikên krîmînel ve dihat kontrol kirin û bawer dikim, tenê polîsan xerac nedida wan. Berevajî, gangsteran bi xwe xerac dida polîsan: Ji bo polîs wan ji projeyên xwe agahdar bikin û krîmînelên ku bi şaşî tevî kalaşnîkovan dihatin girtin, berdin. Vê pêvajoyê bi qasî şeş an jî heft salan dewam kir, heta ku polîsên herî çavbel fam kirin ku ew bi xwe jî dikarin parastina karûbarên piçûk û navîncî pêk bînin û berdêla wan xizmetan jî bavêjin berîka xwe.

Dîsa li heman serdemê, servîsên taybet, yên bi koka xwe digihîştin KGBya berê, ji ber şerên mafîyayê û gendelîya mîlîsan helak bûbûn. Di nav du salan de, hemû mafyaya ukraynî ji holê rabû û kes nizane çi hat sere wê, lê li goristanên welêt, bi hezaran abîdeyên goran "bi gewde dibûn" û tevî kincên xwe yên sportîf ên bi marka ***adidas*** û di destên wan de mifteyên ***mercedes***, wêneyên merhûman li ser wan abîdeyan dihatin raxistin. Êdî dîsa kesî nikaribû li sikakan ji xwe re bimeşe; bi taybetî jî danê şevê. Hedadên ku derî pola dikirin, ji ber sîparîşên zêde wext nedidîtin serê xwe bixurînin. Gansgsterên herî xurt karibûn li jîyanê bimînin û ew di pey re ketin nav cîhana bazirganîyê û siyasetê. Gelek ji wan ketin nav karûbarê qaçaxçîtîyê, ji ber vê yekê her derê welêt bi malê îtxalkirî, yê rengareng û bi fiyetên erzan hat îşxal kirin: Kurkên *grêkî* û çaketên *rom* ên çerm, lîkorên *îsraîlî* û alkolên *belçîkî* yên bi markaya "***Nîkolas II***". Kesî bac nedida, lê belê meaşê mehane yê karkerekî ji 40 an jî 50 dolaran derbas nedibû û perê ku diket destê karmendekî xanenişîn, ancax têra kirîna çend nanên somun dikir.

Desthilat wê demê ketibû nav destên serok **Leonid Koutchma**, nûnerê girîng ê "birêveberên sor". Bi şêweya xwe ya sade, hazircewab û nêzî gel, ew carna bi gîtara xwe ya kevin jî derdiket ser ekranên televizyonê. Hetta, wî carna xwe nedigirt, stran jî digotin. Xelk ji ber wê hewaya wî ya qelender a malxwêyekî malê, li kolanan li dor serok diciviya û jê dixwest ku ji wan re li gîtarê bide û stranan bibêje. Kesên muzîkperest: Ên ku di demeke kurt de veguherîn *derdora wî ya karê karsazîyê* (*business environment*). Wan piranîya şirketan kirin malê taybet û bi awayekî nazik hin prensîp û qanûn anîn bîra serok da ku ew bikaribe bi riya wan ***Ukrayna***yê bi awayê herî bilez ber bi aborîya lîberal ve bibe. Lê belê, ***Ukrayna*** veguherîbû bazareke dirinde û hovane ya pir mezin. Ji her du ***ukraynîyan*** yekî karûbarê bazirganîyê dikir. Her tişt dikarîbû bihata firotin: Kartolên baxçe, cixareyên qaçax, berhemên kargehên ku lê dihat xebitîn. Lewre ji dema alozîya parlementerîyê ve, karkeran meaşên xwe rasterast weke mal û xizmet werdigirtin. Ev yek hertim ji tinebûnê baştir bû. Rêya di navbera ***Kîev*** û ***Nîkolayev***ê de di nav bajarê biçûk ***Pervomaysk*** re derbas dibe û li vî bajarî kargeheke firaq, quşxane û taweyan hebû. Karkeran xirdewatên ku li şûna meaşên xwe werdigirtin, dibirin bazara li ser kolanê, ku êdî ji ber vê yekê rojê 24 saetan vekirîbû. Cara pêşî ku ez bi rêya bejî hatim ***Pervomaysk***ê û ber bi Derya Reş ve çûm, min bi awayekî şaş û metelmayî dît ku cureyekî haleyê di asoyê de diteyise. Ez pêşî fikirîm ku ew bi her halî herêmeke parastinê ye. Lê belê paşî min dît ku ew bazara firaqan e û ew bi ronahîavêjan *weke rojê* hatine ronî kirin. Quşxane û tawe, di nav vê ronahîyê de, weke keştîyeke kozmîk dibiriqîn û weke ku keştîya kozmîk li wî cîhî ji hev hatibû xistin, xuya dikir. Ev bazar, divê ez bibêjim, hê jî heye, tevî ku ev demeke dirêj e ku karker êdî meaşên xwe weke dirav werdigirin.

Leonid Koutchma, duyemîn serokê ***Ukrayna***yê, diyar kir ku di dema serokatîya xwe ya pêşî de ew fêr bûbû bibe serok û di dema serokatîya xwe ya duyem de wî dixwest welêt veguherîne welatekî ewropî yê nûjen. Ev yek wê bi îhtîmaleke mezin pêk bihata jî, eger "pirsgirêkeke" piçûk rû nedabûya. Di îlona 2001ê de, rojnamevanekî ku heta hingê qet nedihat nasîn, **Gueorgui Gongadzé**, winda bû. Termê wî dê—serjêkirî—pir bi lez bihata dîtin. Û tavilê destnivîsên bi agahîyên nihênî, yên li buroya **Leonîd Kouchma**, ji alîyê parêzvanê wî yê nêz, general **Melnitchenko** ve hatibûn nivîsandin jî wê eşkere bibûna. Agahîyên di vê destnivîsê de dibûn sedem ku guman çêbin ku fermana kuştina **Gueorgui Gongadzé** ji alîyê serok, an jî derdora wî ve hatibûye dayîn. Ev bû sosreteke navneteweyî ya ku heta îro jî tesîrên wê li ser siyaseta ukraynî xwe didin xuya kirin. Rûniştina doza li dijî kujer, generalê milîsan **Oleksi Poukatch**, wê di nêz de pêk bê, lê belê yê fermana kuştinê jî daye tê gotin ku serokê niha yê parlamentoyê **Vladîmîr Litvine** ye. Û hêjayê gotinê ye ku **Litvine** di sala 2001ê de li ser serê rêveberîya serok **Leonid Koutchma** bû.

Serokê li ser kar, **Victor Ianoukovitch** jî dîsa yek ji şagirdên wî ye. Dema ku **Koutchma** gihiştibû wê bawerîyê ku bidestxistina cara sêyem ya serokatîyê piştî skandaleke ku bi kuştina rojnamevan **Gueorgui Gongadzé** bi encam bûbû, wê bibûya zêdegavîyeke exlaqî, wî di sala 2004ê de biryar da ku **Ianoukovitch** ji xwe re bike "xelef". Ya rastî li gor destûrnameyê jî jixwe nabe kesek ji du caran zêdetir bibe serok: Lê belê *Dadgeha Destûra Bingehîn* tevî vê yekê jî mafekî wisa daye wî —li Ukraynayê, Dadgeha Destûra Bingehîn ti caran li dijî daxwazên serokan dernakeve. Îro jî heman rewş li vî welatî heye.

Di sala 2004ê de, tevî vê yekê bi xêra şoreşa ***porteqalî,*** **Iouchtchenko** bi ser ket. Ji bo serdemeke ku wî li ser text derbas kir, wî pir bi xemsarî aborîya welêt bi rê ve bir, eynî weke keşeyekî şîretbêj wextê xwe bi temamî da xweşbêjîyê û ket nav hewldanê da ku gelê ukraynî fêrî hezkirina welêt bike û bi vê jî nema, xwe weke sembola ***Ukrayna***yê nîşan da û got ku Ukraynaya rastîn ew bi xwe ye, Ukrayna **Iouchtchenko** ye. Helbet serdema wî nebû salên herî xirab ên vî welatî, lê belê bû salên herî durû yên dewletê. Û di encama van salên herî durû de, *Partîya Herêman* û lîderê wê **Victor Ianoukovitch** bûn deshilatdar. Gelek caran ew bi **Georg W. Bushê** kur re tê muqeyese kirin. Kêm, zêde asta wan a perwerdeyê yek e û şaşîyên xwe bi heman peyvan tînin ziman. **Victor Ianoukovitch** şaşîya xwe ya herî meşhûr berî ku bibe serok, kiribû. Li ser forma ku ji bo beşdarîya hilbijartinan dagirtibû, wî diyar kiribû ku ew mamoste ye —peyva esîl, lê belê wî ew peyv şaş nivîsîbû. ***Xwedê wî biparêze, mamosteyê me Ianoukovitch!*** Hem bi maneya peyvê û hêm jî bi maneya mecazî. Tê gotin ku ew bawermendekî pir kûr e. Tiştê ku wî zêdetir nêzî **George W. Bushê** kur dike jî ev e. Helbet nizanim ka ew di gelek tiştên din de jî dişibin hev an na, lê belê piştî serkeftina xwe ya di hilbijartina serokatîyê de, ew ket nav lezûbezeke mezin ji bo ku têkilîyên xwe yên li gel **Poutine** û *Rûsya*yê ku ji alîyê selefê wî ve pir hatibûn îhmalkirin, sererast bike .

Di nav du mehên pêşî yên serdema serokatîya xwe de, wî ji bo 25 salan hebûna fîloya rûs a li ***Sebastopolê*** dirêj kir û misoger kir ku gaza Rûsyayê ya ber bi Ewropaya rojava ve tê şandin, wê êdî bi awayekî aram û berdewam di xaka Ukraynayê re derbas bibe. Wî di ser de jî soz da ku ew ê komarên ***Osetya*** û ***Abxazya*** yên ku îro ji ***Gurcistan***ê veqetîyane, binase. Ji welatîyan re û bi taybetî jî ji welatîyên rojavayê Ukraynayê re ku helwêsta wan a beramberî Rûsyayê têra xwe bihêrs e, **Ianoukovitch** îzah kir ku di berdêla vê dostanîyê de, Ukrayna wê bibûya xwedî gaza erzan. Lê belê Rûsyayê bihayê gazê jî danexist. **Victor Ianoukovitch** nema behsa dostanîyê kir û rabû vê carê jî xwe nêzî serokê *Rûsya Spî* **Loukachenko** kir: Yê dawîyê ji bo ku şûna petrola ***Rûsyayê***, petrola ***Venezuelayê*** bi cih bike, li gel **Hugo Chavez** peymanek îmze kir. Petrola Venezuelayê di ser ***Lîtwanya*** û Ukraynayê re wê bigihîşta ***Bellarûsyayê*** *(Rûsyaya Sipî)*. Ev yek nîşan dide Ukrayna çawa careke din bû welatekî "***pir-vektorî***". Wê hem hewl da bi Rûsyayê re dostanîya xwe biparêze, hem bi milyaran dolar kredî ji ***Fona Diravî ya Navneteweyî*** bistîne, (bêyî van kredîyan welat wê biketa rewşa nekarîna dayîna deynên xwe) û hem jî ji nakokîya navbera ***Rûsya*** û ***Rûsyaya Sipî*** (Bellarûsya) jî sûdê wergire —ha di vê navberê de, wê hê jî komara ***Osetya*** nenasîye… Kanaleke televîzyona dewletê ya rûsî di bernameyeke xwe ya pir populer de bi belavkirina tinazeke qebe, nerazîbûn li hember **Ianoukovitch** nîşan da. Ukraynîyên ku zêde ji serokê xwe hez nakin jî, tinaz û henekên di bernameyê de li hemberî xwe weke heqaret û êrişan nirxandin.

Lê belê analîstan bi bîr xist ku di kanala televîzyona rûsî de, li ser fermana ***Kremlîn***ê dihate kenîn: Di vê rewşê de ew sînyalek bû —sinyaleke hinartî tam piştî serdana jinişkave nîvcohiştî ya **Vlamdimir Poutin** li Kîevê. Piştî betalkirina firavînê, ew bi awayekî dilnexweş vegeriyabû, weke ku pêşbînîya vê rewşê dihate kirin. Halbû ku serdana **Poutine** berîya hilbijartinên herêmî pêk hatibû û ji van hilbijartinan partîya deshilatdar hêvî dikir ku ew ê tevahîya welêt bixe bin kontrola xwe. Bi rastî, bi fen û lîstikan û bi xêra provokasyonên curbicur û manevrayên hiqûqî yên ecêb, ew di hilbijartinan de nîva-nîv bi ser ket. Li sê herêmên rojavayî, netewîgirên tundrew bi ser ketin û ev partî ji alîyê partîya **Ianoukovitch** ve tenê ji bo bilindkirina benda li pêşîya hevgirên **Ioulia Timochenko**, (1) bi awayekî nepayî hat destek kirin.. Û li beşên din ên welêt, ***Partîya Herêman*** karî bi hilbijartîyên tevgerên din re zimanekî hevpar peyde bike.

Lê belê, herçendî rewşeke wisa ji bo nûnerên gel ne girîng be jî, gel bi şoreşa *porteqalî* ji tirsên xwe rizgar bû û nexwest ji nû ve xwe bi destê tirsê ve berde û heta xwe nefiroşe. Û serok careke din neçar e vegere ji soza xwe ya ku wî yê rûsî bikira zimanê duyemîn ê fermî yê dewletê, ji ber ku piranîya ukranîyan li dijî tiştekî wisa ne. Ew ji ber vê yekê berî demeke kin neçar ma cejna zimanê fermî pîroz bike, dema ku saet 16ê pê hesiya ku stasyonên radyoyê ji bo tevahîya welêt bi vê wesîleyê îmtîhaneke nivîsandinê weşand, ku pê herkes dikare asta xwe kontrol bike. Helbet amadekirina îmtîhaneke nivîsê ne wezîfeyeke serok e. Lê belê pêwist bû ku hikûmet li pêşîya kamerayan rêza xwe ya ji bo zimanê ukraynî nîşan bide. Ji bo vê bike, wezîrê perwerdeyê, yê rûsîaxêv **Dmitri Tabatchnik** hat wezîfedar kirin: Bi tenê şaşîyek kir.

Şerê ji bo û li dijî zimanê rûsî ev 19 sal in didome. Lê belê ev ji demeke dirêj ve ye ku êdî ji bo piranîya ukraynîyan ne pirsgirêkek e. Li Ukraynaya rojava, ku lê partîyên netewîgir roj bi roj nêzî serkeftinê dibin, mirov ji tevahîya ewropîyan bêhtir rastî tûrîstên rûsî tê. Li vê herêmê bajar bilivûtevgertir û mirov devbikentir in. Vê herêmê bi tenê 45 sal di himbêza *Yekîtîya Komarên Sovyeta Sosyalîst* (YKSS) de derbas kirin û ev e îzaha vê rewşê. Her çi Ukraynaya rojhilat e, tevî nêzîkbûna wê ya cîranî ya bi Rûsyayê re jî, dilê wê qet tineye vegere nav *"malbata gelên sovyetîk a ku paytexta wê Moskova ye"*, û karsaz êdî ji vê herêmê zarokên xwe ji bo xwendinê dişînin ***Îngilîstan***ê an jî ***Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê***. Berî demeke nêz, nasek, karsazekî ji ***Donteskê***, bi serbilindî gote min ku zarokên wî fêrî ukraynî bûne. Ew bi xwe wê ti caran nikaribe vê yekê bike: Ji ber ku li bajarekî bi temamî ji rûsîaxêvan pêkhatî, pêdivîya wî bi fêrbûna ukraynî qet tuneye. Lê belê tiştekî baş e ku ew hîs dike ku Ukrayna xwedî paşerojekê ye ku ji ya Rûsyayê cuda ye.

* Navê berhema wî ya dawî ya hatî weşandin: Laitier de nuit [Şîrvanê şevê], Paul Lequesne ji rûsî wergerand, Seuil, koleksiyona "Points", Parîs, 2011.

1 Nota redaktor. Serokwezîra piştî "şoreşa porteqalî", ew bloka Timoşenko bi re ve dibe

Wergera ji fransî: Baran Nebar

www.arsivekurdi.org

Hejmarên navdar ên ji alîyê dezgehên sondajê ve li hukûmeta îtalî hatine mal kirin, yan ji alîyê komîserê berê yê ewropî Mario Montî ve tê bi rê ve birin, dihêlin ku di çarçoveya plana kemerşidandinê de tedbîrên zêde dijwar li ser welêt bên ferz kirin. Silvio Berlusconî neçar ma dev ji wezîfê berde; lê belê dîsa jî wî dê mohreke kûr li civakê xistibe.

WESTÎYANA GEL, DOZA BAZARAN

Berlusconîzm, dewam yan dawî?

PIERRE MUSSO *

Piştî hema hema bê navber bêtirî heşt salên li desthilatdarîyê, **Silvio Berlusconi** neçar ma dev ji serokatîya Konseya Îtalî berde. Lê belê ew karîyera xwe ya siyasî weke parlemanter dewam dike û hê jî serokê yek ji du partîyên mezin ên welêt ***Popolo della Libertà*** ye; ev partî berîya hijdeh salan bi navê ***Forza Italia*** hatibû damezrandin. (1) 16ê çirîya paşîn piştî îstîfaya xwe wî weha da zanîn "*ez vedigerim bibim muteşebisek, belê yê partîyeke siyasî. Divê em hertiştî ji nû ve bi rêk bixin.*" Di sîstema parlemanter a ji du odeyan pêkhatî de mirov nikare ji wî bibihure, lewma hevgirê ***Liga Bakur*** a derbasî muxalefetê bûyî, di Meclîsê de xwedî piranîyeke nisbî ye û di blokaja Senatoyê de jî xwedî piranîyeke mutleq e. Bi vî rengî heta ku hilbijartinên nû pêk bên, (herî dereng di bihara 2013ê de) ew şûrekî Demoklesê di ser serê "hukûmeta teknîk" a **Mario Monti** de digire.

Heke hukûmeta Monti ya ku hatiye wezîfedar kirin ku li ser îtalîyan "fedakarîyê" ferz bike, nexasim xistina ber lêpirsînê ya qanûna kar û ya rejîma teqawidbûnê, zêdekirina bacan, bilezkirina taybetkirinan û lîberalkirina sektorên cihê yên pîşeyan, xelk pir jê zivêr bibe, hingê "Suwar" vegera nav karê siyasetê bi tevahî li derveyî îhtîmalan nahêle.

Nakokî ew e ku **Berlusconi** –mîlyarder, li nîvgiravê, duyemîn mirovê herî dewlemend– ne piştî şkestineke di hilbijartinan de, lê belê di bin zexta bazarên malî û rêxistinên ewropî û navneteweyî de hat bi dûr xistin. Yê ku li Îtalyayê tevahîya hêzan –çapemenî, siyasî û aborî – di destê xwe de civandî, li hemberî hêza tekno-malî bêparastin û rût û tazî ma: Kêlîya ku deynê dewletê –çaremîn e li dinyayê – gihişte 1 900 mîlyar euroyan, zexta spekulatîf a bazaran kir ku rêjeyên faîzê yên deynên dewletê û *spreads*ên (2) navdar bigihêjin asta ku êdî neyên ragirtin. Rewabûneke din a di ser neteweyan re ku weke çarenûsê tê nirxandin, rewabûna demokratîk –ji aliyê ya ku fîlozof **Michele Prospero** weke "*henekeke siyasetê*" bi nav dike (3) bi gewde bû– da alî.

Berhema mezin a asayîkirinê

Hemin, piştî nazikkirina piranîya wî ya di encama qutbûna ji ***Gianfranco Fini*** a havîna 2010ê de ya ku bi şkestina di hilbijartinên herêmî û referandûmên bihara derbasbûyî de xirabtir bû, rêjeya popularîteya **Berlusconi** heta ji % 22yê ketibû. Jixwe em behsa dozên li dijî wî yên pirbare dibin; polemîkên wî yên bi heyetên dadgehan re, reva karsazên îtalî û nexasim pêşandana dînîtîyên wî yên cinsî (ê ku êdî bi navê "bunga-bunga" navdar) yên ku dengdarên katolîk û jin jê bi dûr xistin.

Li hemberî vê Berlusconî ji çil salan û vir ve têra xwe mohra xwe li mêjîyan xist da ku "berlusconîzm" ji dayik bibe. Di dema "salên weke risasê giran [ji 1960ê hete 1980yê pêvajoya ku li Ewropayê bikaranîna çekan ji alîyê partîyên siyasî ve pêk hat; nota wergêr]" ên dramatîk de wî yekemîn kanala mezin a televizyonê ya taybet da dest pê kirin, heng û kêf di xeyala îtalîyan de bi pêş xist. Paşê wî şirketeke mezin a çapemenîyê damezirand, şampîyonîyeke neteweyî, ***Fininvest,*** ya ku sê kanalên televizyonê yên neteweyî, şirketeke sînemayê, kluba futbolê ***Mîlan AC*** û weşanxaneyeke mezin a pirtûk, kovar û rojnameyan di bin banê xwe de dihewîne. Bi ketina siyasetê re wî dikarî xwe bi xwe weke "PDGyê *[serok-birêveberê giştî]*yê Îtalyayê" yan jî "serok-muteşebis" pîroz bike. Weke piştî-xirîstîyan demokrat û piştî-komunîst, kete şûna îdeolojîya herdu partîyên mezin ên ku piştî şerê cîhanê yê duyemîn jîyana siyasî û întellektuel a îtalî bi gewde dikirin, berlusconîzm weke îdeolojîyeke nû bi ser ket.

Hostekarê mezin ê merasîmên televîzyonê, **Berlusconî** bi hestan bi rê ve bir. Bi pevkelandina jîyana li raya giştî vekirî û ya taybet, wî hebûna rojane ya şefî bi dîroka îtalî re kire yek: Sala 2001ê ew ji tevahîya malên îtalî re foto-romaneke rengîn ya ji bîstûheşt rûpelan dişîne, navê wê *Una storia italiana* (dîrokeke îtalî), vê romanê behsa jîyana wî dikir. Dengdar-temaşevanên televîzyonê yên ku bi wî re ketî nav aşê têkilîyeke neynikî û harîqulade, hatin vexwendin ku wî weke lehengekî *telenovela*yekê yan jî *sitcomekê* bişopînin. Di nav hêmanekî *panoptîk* ê berepaş de, gel bi vî rengî hatibû vexwendin misêwa lîderê xwe kontrol bike; her yek ji wan dikete ber referandûmeke rojane û xeyalî: ***"Ji bo yan jî li dijî Berlusconi", O me o loro*** *(yan ez yan ew)*. Bi vê berdêlê "Suwarî" rekorên temendirêjîya erka birêveberîyê ya piştî şerê cîhanê yê duyemîn şikandin, bêtirî sêhezar û sêsed rojan desthilatdar ma.

Lê belê berlusconîzmê di warê çandî heta warê antropolojîk de serketinên xwe yên herî birîqende û mezin bi dest xistin, şîfreyên çandî yên "neo-televîzyonê" (4), şîarên marketingê û xeyal-û-leylanên serfkarîyê niqutandin nav xeyala kolektîf a îtalîyan. Çawa ku stranbêj **Giorgio Gaber** kurt û kurmancî derdibire "*ez ji Berlusconî bixwe natirsim, ez ji Berlusconîyê di nava xwe de ditirsim*". Ya rastî, berlusconîzmê alîyekî berêxwedanê yê siyasî-întellektuel a civakê, hegemonyayeke heng û kêfê, ya xweşbînî û hezkarîyeke serfkar saz kir. **Pier Paolo Pasolini** hatina vê "*berhema mezin a normalbûnê*" pêş dîtibû, ya ku "*modelên çîna nû ya pîşesazîyê dixwaze* ferz bike, ev çîna ku *êdî qîma xwe bi 'mirovekî serf dike' nayîne, bi ser de jî xwe lê datîne ku ji bilî serfkarîyê nabe îdeolojîyên din werin qebûl kirin*". (5)

Tu kesê din weke **Berlusconî** ev "çand" di konjuktura salên 1990-2000ê de bi gewde nekir. Weke bersiva krîza siyasî, ew xwe pêşkêş dike û xeyala gelî di "*ta û bayê serfkarîyê*" de asê dike; ev "*ta û bayê ser tewandinê*" ye yê ku **Pasolini** terîf dike. Yên ku serî li berê tewandine, îtalî –partîyên çepgir û sendîka jî di nav de– halê hazir neçar in qebûl bikin ku teknokrat û bankevan yekser hefsarê desthilatdarîyê bigrin dest xwe. *Show* bi dawî hat.

* Li Zanîngeha Rennesê profesor e û nivîskarê pirtûka: *Sarkoberlusconisme: la crise finale?* (*Sarkoberlusconîzm: krîza dawîyê*) e, Editions de l'Aube, La Tour d'Aigues, 2011

1 Berlusconi sê caran bû serokê kabîneya îtalî: ji gulana 1994 ta çileya 1995ê, ji hezîran 2001an ta gulana 2006ê û dawî jî ji gulana 2008ê ta mijdara 2011ê

2 Cudayîya rêjeya faîzê ya li ser deynên di navbera du dewletan de. *Spreada* di navbera Îtalya û Almanyayê de di erefeya îstîfaya hukûmeta Berlusconi de ji % 5ê dibihurîbû, maneya wê ew e ku muteşebis li gorî almanan bi îtalîyan deynên xwe ji % 5ê bêtir didin dayîn

3 Sernavê berhemeke Michele Prospero, *Il comico della politica. Nichilismo e aziendalismo nella comunicazione di Silvio Berlusconi*, Ediesse, Roma, 2010

4 Di gotareke kovara heftana *L'Espresso* ya sala 1983yê de, Umberto Eco "paleo-televizyona" peyamek dida (televizyona dewletê ya salên 1960î) ji "neo-televizyona" li gorî mînaka kanalên Berlusconi têkilîyeke semîmî û ji dil bi temaşevanên xwe re datîne, ji hev cihê dike

5 Pier Paolo Pasolini, *Ecrits corsaires (Nivîsên korsanî)*, kolleksîyon "Champs arts (qadên huneran)", Flammarion, Parîs, 1976

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

YEHYA AL SELO: **Gund**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 120 x 90 cm

Di 1974ê de, li Cocoyoc, li Meksîkayê, konferanseke Rêxistina Neteweyên Yekgirtî (RNY) "pêşveçûn" û modela pevguhêzkarîya serbest û têkilîyên Bakur-Başûr, bi zimanekî dijwar rexne dikir. Encam bi lezûbez hatin veşartin…

Li Cocoyoc, Başûr temsîla ekolojî û yeksanîyê dikir

PHILIPPE BAQUE *

Du hevdîtinên navneteweyî yên li ser jîngehê li pey hev bi çend mehan programkirî salnameya dîplomatîk meşxûl dikin: Konferansa li ***Durban***ê (Afrîkaya Başûr) ya li ser guherîna îklimê, ya ji 28ê çirîya paşîn heta 9ê çileya pêşîn a 2011ê û zîrweya ji bo Dinyayê ya li ***Riyoyê***, ya ji 4 heta 6ê hezîrana 2012ê. Di van randevuyên dema krîzeke aborî de, kesek zêde nikare îdiaya pêşketineke erênî ya gotûbêjan bike. Piştî zîrweya ***Kopenhag*** (2009) û ya ***Cancunê*** (2010), mijara guherîna îklimê û kêmkirina gazên xwedî taybetmendîya civînê, di refên mijûlîyên talî de hatine hilanîn. Heke em bên ser zîrweyên ji bo dinyayê, ku ji her deh salan carekê pêk tên, ya ***Stockholmê***, ku di 1972yê de pêk hat, bûbû sedemê hêvîya kiryareke bi hev re ji bo parastina dinyaya me; ya ***Nairobiyê***, ku di 1982yê de pêk hat, têkçûna bitevayî ya civata navneteweyî dest nîşan kir, yên li ***Rio*** di 1992yê û ***Johannesburgê*** di 2002ê de xwestin ji nû ve bi wasiteya pirneteweyîtîyê dest bavêjin jîngehê. Bêguman, koroyeke pesindayinê ya arasteyî kapîtalîzma "kesk" bûyî, bi tempoyeke versîyona 2012ê, dê ji nû ve ji alîyê ***Brezîlyayê*** ve bê pêşwazî kirin.

Tevî vê jî, xezîneyên jibîrkirî di nav arşîvên *Rêxistina Neteweyên Yekbûyî* (RNY) de radizên. Her wiha, ragihandina herî radîkal a li ser dorûberê ku ji alîyê vê sazîyê ve hatibû belav kirin, ji dîroka fermî hate jê birin û derxistin. Ev daxuyanîya ku di çirîya pêşîn a 1974ê de li bajarê meksîkî ***Cocoyocê*** hatibû nivîsîn, çarçoveya nîzameke nû ya navneteweyî ya bitevayî ji ya ku îro li ser me hatiye ferz kirin cihê bû, pêk dianî.

Her tiştî bi civîna di 1971ê ya li bajarê siwîsrî ***Founexê***, yê nêzîkî Cenevreyê, ku RNY lê kesayetîyên berpirsîyar ên ku dê zîrweya Cîhanî ya Stockholmê (1972) amade bikirana, civandibû dest pê kir: Ev kesên ku ji welatên Bakur û Başûr hatibûn, bisporên ku ji ber bisporîya xwe ya di warê jîngehê, aborîyê, zanistên civatî û pêşketinê de hatibûn hilbijartin, bûn. Di destê wan de tu wekaletên hikûmetên wan tunebûn û raporeke nefermî amade kiribûn, ku tevî vê jî wan derfeta rêvekirina gotûbêjên navdewletî dida.

Kurtebirîya xebatên pêşîn, *"Rapora Founexê"*, dest nîşan dike ku *"hejarî qirêja herî xirab e"* û divê ku mirov berîya hertiştî li dijî wê têbikoşe. Endamên "Koma Founexê" yên ku di bin bandora Lihevkirina Giştî ya li ser Bihayên Gumrikê (GATT) de mane, mafên endustrîyalîzekirina welatên hejar diparêzin û difikirin ku guhastina azad stratejîyeke baş e ji bo ku xwe bigihînin vê armancê. Piştî vê bi çend mehan, zîrweya Stockholmê bi efareya van fikr û mijûlîyan ket. Welatên beşdar ji alîyekî ve xwestin ku fêdeya guhastina azad piştrast bikin û ji alîyê din ve jî gîhaştin qenaeta ku divê li ser pirsa jîngehê di gel problemên pêşketinê israr bikin û bi vî awayî bingeha mafê navneteweyî yê parastina jîngehê danîn. Hin welatên Başûr ên ku ji vê lihevkirinê nerazî bûn, daxwaza avakirina "nîzameke navneteweyî ya aborî ya nû" kirin ku dawîyê li serdestîya hêzên rojavayî bînin.

Îtîrazkarên pêşveçûna berî nameyê

Ji 8 heta 12ê çirîya pêşîn a 1974ê, konferanseke nû ya RNY bi beşdarîya bisporên navneteweyî bi armanca gotûbêjkirina *"bikaranîna jêderan, jîngeh û stratejîyên pêşketinê"* li ***Cocoyocê*** pêk hat. Ev bûyer ji alîyê mirovê karsaz ê kanadayî **Maurice Strong**, bireveberê îcrayê yê *Bernameyên Neteweyên Yekbûyî yên ji bo Jîngehê* (UNEP), û ji alî aborînas û diplomatê srî-lankayî **Gamani Corea**, sekreterê giştî yê *Konferansa Neteweyên Yekbûyî ya li ser Bazirganî û Pêşketinê* (UNCTAD) ve hate koordîne kirin. Ji alîyê raportoran ve, kesên weke **Barbara Ward** –aborînasa birîtanî– ji bo pirsên girêdayî jêderên xwezayî û **Johan Galtung** –siyasetmedar û civatnasê norvecî yê eşkere li dijî kapîtalîzmê û amerîkîyan e– ji bo pirsên girêdayî pêşketinê ne, hebûn.

Di nav rewşenbîrên li Cocoyocê kombûyî de, gelekên ku meyla wan li ser sosyalîzmê bû xwe beli dikirin. **Gamani Corea** weke sekreterê daîmî yê wezareta plankirinê û karên aborî yê Srî Lankayê, di hikûmeta ku şirketên petrolê, yên ewlekarîyê, banka, dibistan û hwd neteweyî dikir û xwe nêzîkî bloka komunîst dikir, amade bû. Hevserokayetîya civînê ya meksîkî ji du kesayetîyên ji welatên li ser riya pêşketinê ne re ma. Kesê yekê, doktor **Wilbert K. Chagula**, wezîrê karûbarê aborîyê û plankirina pêşketinê yê *Tanzanîyayê* ye, ku di bin serokayetîya mamosteyê seretayî **Julius Kambarage Nyerereyî** de, piştî 1967ê, senaîyên serekî û şirketên xizmetguzarîyê netewî kirin, ji bo fînansekirina siyaseta civatî û destpêkirina reformeke kiştûkalîyê bac zêde kirin. Yê duyê, **Rodolfo Stavenhagen,** civatnasê meksîkî, serokê projeya lêkolînê ya kiştûkalîyê li welatê xwe, berê xebatên xwe da ser têkoşîna çîn û tuwêjên cîhana kiştûkalîyê.

Meksîkaya, ku tam jî pêşwazîya konferansê dikir û ji 1970yê ve di bin serokayetîya **Luis Echeveria Alvarez** de bû, ku wî jî kangeh û enerjî netewî kiribûn, ax li gundîyan belav kiribû û siyaseteke civatî ya pêşverû (herçend şoreşger nebe jî) xistibû dewrê. Nêzîkayîya xwe bi **Salvador Allendeyê** li Şîlîyê û Kubaya şoreşger re nîşan dida. (1) Serok E**cheveria** bi şexsê xwe beşdarî semînera Cocoyocê bû.

Daxuyanîya encamê ya, di 23yê çirîya pêşîn de, îdianameyeke rasteqîn a li dijî siyasetmedarên rojavayî bû. Paragrafa wê ya yekê bal dikişand ser biserneketina ***Neteweyên Yekbûyî***, ku peyrewa wê di 1945ê de amade bûbû û digot ku wê sazûmaneke navneteweyî ya neheq afirandiye. *"Kesên birçî, bêmal û bêcî û nexwendî îro ji yên dema damezirandina Neteweyên Yekbûyî pirtir in"* Têkilîyên hêzên ji *"pênc sedsal kontrola kolonîyalîzmê dizane ku bigirseyî desthilata aborî di nav destê komeke piçûk a neteweyan de kom kirine"* hatine guhertin. Li gor raportoran, pirs ne girêdayî kêmbûneke dewlemendîyên afirandî ye, lê girêdayî *"parvekirina wan a xirab û bikaranîna* [wan a] *xirab e"*.

Di raporeke ku astengên li pêş mezinbûna salên 2000ê înkar nake de, Heyeta ***Cocoyocê*** bi awayekî vekirî dîktatorîyê weke sedema bilindbûna hatinîya nesafî ya navxweyî dibîne: *"Pêvajoyeke mezinbûnê ya ku tenê kêmayetîyeke pir piçûk jê îstifade bike û ku imtiyazên navdewletî û navxweyî mezin bike, ne pêşketin e. Ew bi tenê çewsandin e.* (...) *Di encamê de, em fikra ku berî mezinbûnê û paşê parvekirineke adil a fêdeyên wê biparêze red dikin."*

Modêla pêşketinê ya li Cocoyocê hatibû parastin, li ser pirsên aborî ranaweste. Ew awayên jîyanê, nirx, azadî û serxwebûna gelan, mafên kesayetî û yên hevpar derdixe pêş. Ew, *"mafê xebatê, yê ku bi tenê nayê wateya xwedîkarekîbûnê, lê yê xurtbûna kesayetîya mirov, mafê li derveyî pêvajoyên berhênanê yên ku mirov weke amuran bi kar tînin, nemanê"* jî digire nav xwe.

Efsaneyên aborîya bazarê ji holê rabûn, li ber melkesan çûn. *"Çareserkirina van pirsan nikare ji ber xwebixwerêkxistina mekanîzmayên bazarê be,* rapor dinivîse. *Bazarên klasîk, ji kesên pêdivîya wan pê heye bêtir rê didin kesên ku karibin zû perên wan bidin, xwe bighînin jêderan; her wiha telebeke nexwezayî teşwîq dikin û di pêvajoya berhênanê de berhemên avêtinê giştî dikin. Hin jêder di bin kapasîteya xwe de tên bi kar anîn."*

Berevajîya vegotinên serdest ên GATTyê, gunehê xirabûna jîngehê dimîne li ser têkilîyên aborî yên nerewa û bihayê pir erzan ê madeyên xam li bazaran. Bispor difikirin ku divê welatên Başûr peymanên weke nimûneya *Rêxistina Welatên Îxracker ên Petrolê* (OPEC) pêk bînin ku bihayekî baş ji bo hemî madeyên xam li ser bazaran ferz bikin. Li gel ve jî, ew pêşnîyaz dikin ku bi saya serê sazkirineke hiqûqî ya saxlem birêveberîyeke navneteweyî ya *"malû milkên hevpar"* bê ava kirin. Armanca vê yekê ew e ku bêyî bikevin xefika xwe bi îmkanên xwe îdarekirinê derfeta hukmêzatî jî ji bo miletan hebe. Ji bo gîhaştina vê qonaxê jî, raportor "alîkari"yekê ji welatên dewlemend naxwazin, lê dixwazin ku ew hew bi tenê bedelê rasteqîn ê madeyên xam bidin.

Handana serxwebûna aborî

Li şûna tawanbarkirina takekesan -weke tomarkirina ku van salên dawîn bûye mode-, Daxuyanîya Cocoyocê dibêje *"mafê herkesî heye ku weke berhênerekî, berxwerekî û bi taybetî jî yek ji bimilyaran xwecihên dinyayê ji qerekterê sazûmana ku ew jî beşekî wê ye bitevayî têbigihê. Mafê wî heye ku bizanibe bê kî ji xebata wî menfaetê bidest dixe, kî fêdê ji kirîn û firotina wî dibîne û bê çawa ev yek bermayê cîhanî dewlemend an hejar dike."* Perwerdeya dorûberê divê cîyê xwe di projeya perwerdekirina herî berfireh de bigire, ku têkilîyên serdestîyê ji navê raneke lê berevajîya wê, wan rave bike.

Di encamê de, berevajîya *"Raporên Founexê"* yên ji bo amadekarîya konferansa Stockholmê, ku guhastina azad diparast û rola hakemtîya bazirganîyê ya di destê GATTyê de, Daxuyanîya Cocoyocê cîyê navendî yê Neteweyên Yekbûyî û prensîba "ji bo her dewletekê dengekî" qebûl dike. *"Em ji dil bawer dikin ku, piştî mijarên pêşketinê, yên jîngehê û bikaranîna jêderan pirsên global ango giştî yên bingehî ne, ku pêwendîya wan bi halxweşîya hemî mirovayetîyê heye, hikûmet divê mekanîzmayên Neteweyên Yekbûyî heta bi dawîyê bi kar bînin ku wan çareser bikin û ku divê sazûmana Neteweyên Yekbûyî bê nû kirin û bi hêz kirin da ku karibe bi berpirsîyarîyên xwe yên nû rabe."*

Daxuyanîya Cocoyocê bi perspektîfên xwe yên polîtîk ên ku rave dike, mirov di bin bandora xwe de dihêle. Ew paşdemayinê ne weke "derengmayin"eke pêşketinê, lê weke berhema pêşketina welatên dewlemend şirove dike. Belavbûna kapîtalîzmê bi rastî di riya destserdanîna şirketên pirneteweyî ya li ser madeyên xam ên welatên Başûr, bi awayê ku dê her çewsêner û yên tên çewisandin hebin re derbas dibe. Ev aborîya bazarê ye ku hatiye tesbît kirin û bi kûrahîya xwe, guhastina azad e. Banga devjêberdana wê pir vekirî ye. Mesele ne pirsa bi tenê rêkûpêkirina sazûmanê ye, lê ya xwe jê daweşandina wê bitevayî ye: *"Otonomîya di warê neteweyî de her wiha veqetiyana katî ya ji sazûmana aborî ya heyî ferz dike. Di sazûmaneke ku ji alîyê aborî ve girêdayîbûna wê berdewam be, avakirina otonomîyeke bi beşdarîyeke tam û bê kêmasî ne mimkun e."* Dîsa li gor daxuyanîyê, divê dewlet bi vî awayî li dijî ketina bin nîrê girêdayîbûneke derveyî derkevin, bi taybetî jî ji bo birêvebirina mal û milkên hevpişk, otonomîyeke hevparî û hevkarîyê bi rêk bixin.

Ji bo wê jî daxuyanî, bi perspektifeke înternasyonalîst, banga avakirina sosyalîzmeke jîngehparêz li welatên serdest dike. Nivîskar ewinde pêşde diçin û bi henekî heta pêşnîyara pêşkêşkirina xizmeta xwe ji welatên dewlemend re dikin ku alîkarîya wan bikin da ku wan ji berxwerîya pir zêde û jîyana wan a xirab rizgar bikin. Ew dest nîşan dikin ku, *"her diçe pirkirina berhênan û berxwarinê dibe sedemê zêdebûna bêtir bikaranîna antîdepresyonan û nexweşxaneyên psîkyatrîk."*

Yekser piştî çapkirina tekstê, serokên konferansê têlgrafeke dûvdirêj ji Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayê **Henry Kissinger** digirin, ku tê de hemî deklarasîyonê red dike. Hêzên mezin ên aborî dê biçin her tiştî bigirin bin destê xwe û krîza aborî ya 1973yê derfeta xwe jinûve disîplînekirin an marjînalîzebûnê dide dewletên rewşa wan pir krîtîk, yên ku dikevin nav hejarîyê dibînin ku bihayê îtxalata wan weke tîrê berjor radibe.

Ji bo berdewamkirina gotûbêjan di warê "sazûmana nû ya aborî ya navneteweyî" de, welatên dewlemend cîyê minaqeşeyan pir kirin ku bandora RNYê, ku tê de piranî welatên Başûr hene, kêmtir bikin. Di çileya pêşîn a 1975ê de, Konferansa li ser *Hevkarîya Aborî ya Navneteweyî* ku li ***Parîsê*** pêk hat, karibû bi tenê bîst û heft dewletan bîne ba hev: Heşt welatên dewlemend, endamên serekî yên OPECê, lê ne welatekî bi tenê ku li dijî bingehên kapîtalîzmê yan parvekirina navneteweyî ya kar derkeve - ku wê hîn navê "cîhanîbûnê" ji xwe re nedîbû û li xwe nekiribû. Hin welatên mezin ên Başûr ketin nav lîstika Dewletên Yekbûyî, Ewropa û Japonyaya ku di nav aborîya cîhanî de cîyê herî mezin dixwestin, ewinde jî nexwestin qaîdeyan xera bikin.

Reçeteyên jibîrkirî

Bi vî awayî, tevî îmzekirina peymaneke dostanî, aştî û hevkarîya bi Yekîtîya Sovyetan re jî, di 9ê tebaxa 1971ê de, Hindistana ji alî **Indira Gandhî** ve dihate bi rê ve birin, siyaseteke aborî ya ne zelal meşand, cûre "riyeke sisêyan" di navbera sosyalîzm û kapîtalîzmê de; li Brezîlyayê, dîktatoryaya leşkerî ya li ser kar, bi saya serê herikîna sermîyanên rojavayî nisbetekî mezinbûnê yê rekor bi dest xist. Di destpêka salên 1980yê de, dijşoreşa neolîberal bi tevayî tiştên ku ji ber daxwazên Cocoyocê mabûn jî li ber xwe birin.

Îro, lêkolîneke li ser malpera Neteweyên Yekbûyî bi tenê rê dide çend rêzên ku sempozyûma çirîya pêşîn a 1974ê bi bîr tînin. Mirov tê de jêgirtineke kurt a daxuyanîya encamê dibîne: *"Riya ku divê mirov bide ser di bêhêvîtîyê re derbas nabe, ango ne dawîya dinyayê ye û ne jî divê xweşbînîyeke saf a li hember çareserîyên teknolojîyê yên li pey hev be. Berevajîya vê ev rê di qîmetdaneke bi kitekit, bêxwîngermî, ya "sînorên derveyî"* [parastina dorûbereke bimêzên], *di lêkolîneke hevpar a navgînên gîhaştina "sînorên navxweyî"* [têrkirina pêdivîyên bingehîn ên mirovî] *ya mafên bingehîn, di bi sazîkirina avasazîya civatî ya ku van mafan rave bike û di hemî sebra xebata bê tawîz a pêşxistina teknîk û stîlên pêşketinê ku bermayê me yê cîhanî diparêze û pêşve dibe re derbas dibe."* Gelo mirov dikare ji alîyekî ve xebatên Cocoyocê bi bîr bîne û ji alîyê din ve jî bi awayekî ewinde sîstematîk serûbinkirin û perspektîfên siyasî yên teksta orîjînal jê bibe, ji navê rake?

* Nivîskarê *Désobéissons à l'Union européenne !/Em Rêza Yekîtîya Ewrûpî Negirin!*, Fayard, Paris, 2011.

1 Çiqas xwe nêzîkî Navenda ajansa Saloxdariyê (CIA)yê kiribû, wê paşî derketa holê. Binêrin li nivîsa françois Boyer, a bi navê "Ü Meksîka êdî ne serbixwe ye", Le Monde diplomatique, adar 2011

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademîr

www.kurdiyaktif.org

Bicihbûyî li ser xakeke ji alîyê pirrengîya xwezayî ve şahane, gundekî meksîkî bernameyeke neteweyî danî ber xwe ji bo ku hem zengînîya xwezayî hem jî derfetên hebûna gel biparêze. Piştî heft salan, ew ji hal ket. Ew ezmûn wan şertên ku li ser navê têkoşîna li dijî guherîna avhewayê li ser gel tên ferz kirin, radixin pêş çavan.

ALAVÊN HAWÎRDORÎ YÊN ZÊDE PAXAFÊ BI CEWHERA ŞÊNIYAN NAKIN

Tezmînkirina karbonê, dara ku daristanekê vedişêre

ANNE VIGNA *

Arcenio Osorio çîyayekî di ser gundê ***Santiago Lachiguiri*** re, yê li eyaleta Meksîkayê Oaxacayê li berzexa Tehuantepe ye, nîşan dide û dibêje: *"Ev e. Ew avê dide bajarên herêmê hemûyan û ji bo me Zapotêkan ew pîroz e. Yê ku me dixwest em bi awayekî fermî biparêzin ew bû".* Osorio sekreterê meclisa komelgehî ye, ev meclis damezirandineke gelêrî ye ku hatiye hilbijartin û jîyana şênîyên gundî bi rêk dixe.

Tevahîya 8 hezar şênîyên gund tevlî parastina *Cero de las flores*a (Çîyayê Kulîlkan) "xwe" bûne. Jixwe, Komîsyona Neteweyî ya Parastina Wargehên Xwezayî (Conanp) ev çîya ku ji ber *"baş parastina ekosîstemên xwe"* xwedî *"dewlemendîya xwezayî"* ye, di nav lîsteya xwe de bi cîh kir.

Li jêr di gelîyan de qehweya bîyolojîk tê çandin. Di kêlêka çîyayan de dar û werzên garis li pey hev xuya ne. Piştî çend saetên bi meş û hilkişînê, em digihîjin daristanên çaman ên ku bi sedan şiklên cuda yên kulîlkan lê hene. Bilindîya wî çîyayî (2200 m.) û madeya lat û zinarên wê dikin ku ew jixwe piranîya avên herêmê bimije û di xwe de bihewîne. Îro ev çîya bûye dibistaneke ji bo siyasetên jîngeh parastinê.

Di tebaxa 2003ê de, *Cerro* li Meksîkayê bû yekemîn "wargeha parastina xwezayê ya ku bi daxwaza komelê ve hatiye saz kirin". Li gor danasîna Conanmpê, ew *"çerxeke parastinê ye ku bi daxwaza civakê pêk hat. Ev hewldan dewlemendîyên xwezayê diparêze û aborîyeke alternatîf û demdirêj pêşkeşî şênîyan dike. Li Meksikayê, îro 20787 hektar bi vî rengî tên bi rê ve birin."* Tevî vê yekê, heft salan bi şûn ve, di meclisa komelgehî de ya çileya 2011ê civiya, şênîyan ji bo qedandina statuya "wargeha parastina xwezayê" dengê xwe da. Osorio weha vedibêje *"hukûmetê em xapandin, em herçiqas hîn xwedîyên erdên xwe bin jî, em êdî wan kontrol nakin".*

Xuya ye gel pir acîz e û ev hevokeke cidî ye: Bisporê erdên gund, Enan Eduardo, behsa peyvên bikaranînê dike. Xapandin? "*Em pê hisiyan ku belgekirina 1400 hektar erdê* Cerro de Las Floresê*, ne weke ku me biryara wê di dema dengdanê de dabû 5 salan, belê demeke bi qasî 30 salan dirêj dihewîne, kontrola erd ji destên me diçe û me mecbûr dihêle ku awayên hilberandinê yên ku di warê ekolojîk de maneya wan tuneye bi kar bînin.*"

Belgekirina erdan, tesbîtkirina erdan û paşê jî plankirina birêkûpêkirina wan ferz dike. Ev herdu kar ji alîyê rêxistinên ne hukûmetî (ONG) û sazîyên, weke wezareta hawîrdorê, CONAMPê ve tên meşandin. Ev kar divê qaşo bi *"civînên amadekarîyê ku gel beşdarî wan dibe"* û armanca wan agahdarkirin, guhdana xelkê û biryardana bi şênîyan re ye, dest pê bikin. Lê belê ev pêvajo, ku ji bo biserketina siyaseteke parastinê weke pir girîng tê hesibandin, li Santiago Lachirguiri weke diviyabû nehat meşandin. Herçiqasî CONAMP îdia bike ku *"şênî hatin agahdarkirin û tevlî projeyê bûn*", Osorio weha rave dike: *"Me erdên xwe şanî wan kirin û bersiv dan pirsên wan. Lê belê me hîç nedizanî ka wan çi amade dikir."*

Encam: Palên çîya ku sed û çil cotkaran li wan garis diçand, dikevin nav sînorên wargeha parastina xwezayê. Pênc sed hezar erd li "sîstema peredana ji bo xizmetên jîngehparêzîyê": Çalakîyên hilberînê lê qedexe ne, lê gel serê hektarekê salê 400 pesoyan (24 euro) distîne, ango salê 12 408 euroyan. Hindik e. Bi ser de jî proje rêzeke çalakîyan, ku qaşo wê kanên xwezayî bêyî ku zirarê bide derdorê zêde bike, pêş dibîne. Du projeyên mezin: Pêşxistina ekoturîzmê û şirketeke şûşekirina avê. Çar salan piştre dev ji van herdu projeyan berdan. Du holikên ji bo turîstan ku tu caran nehatin bi kar anîn, ava kirin -ev herêma dûr, zêde balê nakşîne ser xwe- û mesrefa zêde ya şûşekirina avê kir ku şirket li petaxê bikeve, îflas bike û derîyên xwe bigire.

Gundîyên ji ser axa xwe hatine derxistin

Lê ya ku pevçûn har kir bêhtir pirsgirêka cotkarîyê ye. Civak ji bo çandinê teknîka şewitandina erdê bi kar tîne: Serê heft salan beşa erdê ya hatiye çandin, dişewitînin û piştre diçînin. Pereng zibilê xwezayî ye, dar bi kêrî midbexê tên û bi ser de jî garis, fasûlî, firingî û îsotên tûj tên çandin.

Zane û etnolog **Eckart Boege** weha rave dike: "*Çandinîya ji deverekê ber bi deverekê din ve* [cihguhêz, NW)] *ku bi qanûnên hişk re baş hatiye bi cih kirin, navgîna herî baş pêşkêş dike da ku zirar li hawîrdorê neyê kirin. Maya di vê teknîk û rêbazê de bûbûn hostekar, hem di warê hilberînê de û hem jî di warê ji nû ve çandina daran de.*" Lê belê sazî û dezgehan –hem yên meksîkî û hem jî yên navneteweyî– ev çandinîya cihguhêz weke tehlûkeya nû dibînin. Hemû bi yek dengî bang dikin: ***"Bi ser agirî de biçin!",*** girtina karbonê veguherîya hêmana navendî ya siyasetên nû da ku fînansman were bi dest xistin. Rêbaza şewitandinê li Meksîkayê bû sedema xirabçûnên girîng: Nemana daristanan, stewrbûna erdan, kêmbûna avê, kêmbûna pirrengîya bîyolojîk û hwd.

Li ser erdên xelkên xwecihî bi xwe rewş ne wisa ye, lewra van gelan weke li Santiago Lachiguiri rêziknameyên hişk ên civakî ên ferz ji bo çandinîyê bi cih kirine. (1) Zanyarê çandinîyê û nivîskarê lêkolîneke li ser rêbaza çandinîya bi şewitandinê **Alvaro Salgado** weha rave dike: "*Heke rêbaz baş were bi kar anîn, hingê di encamê de mirov dikare pirrengî û mîqdara bîyolojîk a daristanê zêde bike. Li alîyekî şewitandin karbonê derdixe, lê di alîyê din de dema erd ji nû ve berdar dibin, zêdetir karbon tê girtin*" Ev tesbîtên di weşanên zanistî de tên qebûl kirin, ji alîyê CONANPê ve tên înkar kirin, CONANP bi xwe xwedîya projeyeke din e ji bo vî gundî: Çandinîya daristanî, pergaleke ku daran (li vir darên mişmişan) di nav çandeke daîmî de bi cih dike. (2) Li vir jî, ji ber ku ne baş hatiye amade kirin, nêzîkbûna ku li ser şênîyan tê ferz kirin, mirov razî nekirine. Di sê salan de erdên çandinîyê lawaz û stewr bûn. Dar bi xwe kêmber in. **Edouardo** dibêje "*ji ber ku garis xweş negiha, CONANPê şîret li me kir da ku em zibilê kîmyewî ji bo dewlemendkirina erdê bi kar bînin.*" Encameke din: Piranîya sed û çil cotkarên ku jidestdana erdan bandor li wan kir, ji gund veqetiyan. Hinan ji wan biryar da koçberî Amerîkayê bibin; yên din çûn bajêr. Hin ji wan di avahîsazîya avakirina otobana herî zêde nêzî wan de dixebitin û yên herî ciwan piştî kampanyayeke tevlîkirina eskeran a nav refên artêşê, bûn esker.

Ji daxwaza betalkirina cihê parastî yê xwezayî û ji daxwaza dawîya "peredana ji bo xizmetên hawîrdorparêzîyê" nerazî, civakê du nûner şandin Foruma Alternatîf a ku bi ***16. Konferansa Alîyên Peymana Avhewayê*** mohrkirî (COP 16) re di heman demê de kanûna 2010ê li Cancunê pêk dihat. Armanca wan: Eşkerekirin û gilîkirina siyaseta parastina ferzkirî. Îfade û şahidîya wan bingehîn bû. Ya rastî, ***COP 16*** bi xwe bû ya ku lihevkirina ji bo parastina daristanan a di COP 13a sal 2007ê li Baliyê pêşnîyaz kirî erê kir:

Bernameya REDDê (ji bo "Kêmkirina berdana gazê ya girêdayî birîn û kêmkirina daristanan").

Hukûmetên ku ji wan nehat li ser kêmkirina berdana gazên bandora serayê dikin, li hev bikin, hêvî dikin ku bi REDDê % 15ê van gazan jê bibin, bi tenê bi rêya pêşîlêgirtina tinekirina daristanan. Du caran "Fikreke baş"? Heke em ji nûnerê taybet ê ***Bankey.0a Dinyayê*** yê ji bo civîna bilind a li Cancunê bawer bikin, hîç şik û guman tê de nîne: "*REDD wê alîkarîyê bide me ku em xwe ji guherînên avhewayê re amade bikin*."

Bi herhalî ev hêman zêde serê xwe ji rewşa sêsed mîlyon mirovan naêşîne ku li dinyayê ji daristanan dijîn, an jî girêdayî daristanan in. REDD li gor pîvana "tezmînkirinê" dixebite: Şirketek yan jî dewleteke hewayê qirêj dike, wê karibe gazên berdide ên ku bandora serayê dikin (bi berdêla xwe ya ku çend ton karbon dike tê îfade kirin) bi "parastina" daristanekê tezmîn bike. Erê qaşo ev nêzîkatîyeke zanistî ye, lê belê ev hêman tevahîya lêkolîneran razî nake. Bi vî awayî zanîngeha Stanfordê a li Kalîfornîyayê piştrast kir ku Panela Navhukûmetî ya li ser Guherîna Avhewayê ji sê paran pareke karbona di daristaneke li Perûyê de muhafeze kirî, zêde hesibandiye. (3)

Endama rêxistina derveyî hukûmetê (NGO) *Global Justice Ecology Projectê* **Anne Petermann** rave dike "*di nav muhafezekirina karbonê de qedexekirina birîna daran heye. Komên xwecihî li dijî REDDê ne lewra ew difikirin ku ev bername wê civakan neçarî koçberîyê bike yan jî bandoreke dijwar li awayê wan ê jîyanê bike, bêyî ku tiştekî di mijara qirêjkirina hewayê û guherîna avhewayê de biguherîne.*" Nûnerên xelkên xwecihî ên ku bi hejmareke pir li Cacunê amade ne, hêvî dikin ku karibin pîvana erêkirina azad bidin qebûl kirin, a ku berîya her awayê pêkanîna bernameyeke REDDê pêşî û zelalkirî ji civakên cihî (CLPE) tê standin. Nûnerê gelê Kuna yê ji Panamayê **Orel Masardule** dibêje "*Em dixwazin ku ew hêza hebe em bibêjin 'na' heke şirketek dixwaze li ser erdên me karbonê tezmîn bike.*" Dîsa jî di deqa dawîyê de bi tenê behsa "*garantîyên civakî û jîngehî*" tê kirin, ku hê divê were terîf kirin. Tevî ku behsa Danezana Neteweyên Yekbûyî ya der barê gelên xwecihî de tê kirin jî –ew digire ser xwe ku "*gelên xwecihî xwedîyên wî mafî ne ku pêşaneyên xwe û stratejîyên xwe yên ji bo nirxandin û bikaranîna erdên xwe û çavkanîyên din dîyar û birêkûpêk bikin*"– ev mecbûrî nîne. Du raporên (4) hê nû yên der barê pirsgirêka rêzgirtina ji xelkên xwecihî yên di bernameyên REDDê de wekî din nîşan didin ku mafên milkîyetê û prensîpên şêwr û agahdarkirina şênîyan bi awayekî birêkûpêk tên bin pê kirin.

Paşgotina nû ya derbarê ax û xakan de?

Ji şeş salan û vir ve ji alîyê şirketan (Shell û Gazprom li Îndonezyayê, BP li Bolîvyayê, Rio Tinto li Awûsturalyayê), welatên (Norwêc li Brezîlya û Îndonezyayê, Franse li Meksîkayê) û fonên taybet ên sazîyên navneteweyî yên mîna Bankeya Dinyayê û dezgehên cihê ên Neteweyên Yekbûyî ve gelek proje hatin fînans kirin. Erê *Lihevkirina Cancunê* serê xwe ji pirsgirêka awayên fînanskirinê naêşîne, fikra ku timî Bankeya Dinyayê parastî, ya ku li gor wê kredîyên karbonê yên REDDê wê karibin bikevin bazara dinyayê, ji mêj ve dev jê hatiye berdan.

Êdî hatiye pejirandin ku van bazaran hîç destûr neda ku berdana gazên karbonê kêm bibe, ne jî bi kêra fînanskirina aborîyeke hindiktir qirêjker hatin. Bispora mijara daristanan ji bo NGOya bi navê FERNê vê texmînê dike: "*Bazara karbonê kêmkirina bikaranîna komirê û karbonê teşwîq nake, lê belê mirovan dixapîne û dihêle bifikirin ku qirêjkirin dikare were tezmîn kirin. Heke REDD bikeve bazareke karbonê, hingê dibe ku rê li ber pêleke mezin a spekulasyona milk were vekirin, a ku wê 'nirxekî karbonê' bide daristanê.*" Welatên ji wan re tê gotin, welatên bipêşketî yên ku di guherîna avhewayê de xwedî berpirsiyarîyeke dîrokî ne, di vê navê de red dikin ku bi tenê REDDê fînanse bikin. Ev pirs ji bo 17. Konferansa li ser Peymana Avhevayê re hat hiştin, a ku tê pêş dîtin ji 28ê çirîya paşîn a 2011ê û pêve li Durbana Efrîkaya Başûr pêk were.

Ne bi tenê tevahîya raporên Bankeya Dinyayê bi israr dibêjin ku pereyên dewletê bi tena serê xwe nikarin barê malî yê bicihkirina REDDê hilgirin û divê fînanskirineke taybet –li gor texmînan salê di navbera 15 û 50 mîlyar dolaran de, pere wê lê biçin, lê belê fonên halê hazir heyî digihêjin 2 mîlyar dolaran (5)– were peyde kirin, lê belê pirsek dimîne: Wê çi were serê cotkarên piçûk ên ku hez dikin çandina gêris dewam bikin û di heman demê de beşekê ji erdên xwe jî di dest xwe de bigirin? Di dema 16. Peymana li ser Avhewayê de, serokdewletê Meksîkayê **Felipe Calderón** ev yek da zanîn: *"Da ku li şûna çandina gêris li çîyê, ew daran biçînin û debara xwe bi pereyên ji bo xizmetên jîngehparêzîyê bikin, em ê pereyan bidin cotkaran."*

* Rojnamevan, Meksîko.

1 Ferza beyarhiştinê ya serê heft salan, pîvan û tedbîrên hişk ên li ser agirî, danîna bendên li dijî erozyonê, û hwd

2 Bixwîne, Mark Hertsgaard, "Comment le Sahel reverdit (Sahel çawa ji nû ve hêşîn dibe)", *Le Monde diplomatique*, tebaxa 2010ê

3 Lêkolîna tebaxa 2010ê ji alîyê Greg Asner ve hatî kirin; Asner ji Carnegie Institution for Science in Stanford e, lêkolîn li ser 43 000 kîlometrokare daristanê li herêma Madre de Dios a Perûyê hat birêvebirin

4 Kate Dooley, Tom Griffiths, Francesco Martone û Saskia Ozinga, "Smoke and mirrors: a critical assessment of the Forest Carbon Partnership Facility (Dû û neynik: Nirxandineke hişyarker a Forest Carbon Partnership Facility)", FERN û Forest Peoples Programme, Bruksel, sibata 2011ê, û Emmanuel Freudenthal, Samuel Nnah û Justin Kenrick, "REDD and rights in Cameroon (REDD û maf li Kamerûnê)", Forest Peoples Programme, Moreton-in-Marsh (Melikîya Yekbûyî), sibata 2011ê

5 *Bigire li ber* Alain Karsenty, "Le coût de la lutte contre la déforestation est terriblement sous-évalué (buhayê şerê li dijî tinekirina daristanan pir kêm hatiye nirxandin)", Centre de coopération internationale en recherche agronomique, Novethic, Parîs, kanûna 2009ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

YEHYA AL SELO: **Derî**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 50 x 50 cm

www.arsivakurd.org

Utopyaya ku ji alîyê Komunê ve hatiye fikirîn

CHRISTOPHE VOILLIOT *

Guhertina siyasetê, sazkirina yeksanîyê di navbera mêr û jinan de, afirandina awayekî nû yê birêvebirinê, beşdarîya welatîyan... hatin pirbarekirin heta bigihîjin asta têrbûneke ku wateyên wan neman, tevî ku demeke dirêj ji alîyê hêzên tevgera karkeran ve dihatin destek kirin. Di 1871ê de gelê Parîsê yê serhildayî wateyeke berbiçav dabû wan gotinan.

Bi helketina sed û çil salîya salvegera xwe, Komuna Parîsê ji nû ve hat bi bîr anîn û cardin ji jibîrkirinê xelas bû. Şaredarîya paytextê ji bo vê roja taybetî gelek çalakîyên kulturî li dar xistibû; herwekî pêşengeh, konferans, ziyaretên li gel rehber û reklamên curbicur yên li ser vê mijarê. Bi bîranînên bi vê şêweyê; bîranînên komunê li hember wêneyên "hefteya bi xwîn" an jî li hember şerên paşîn tên parastin. Wek ku dûmana agirê ku ji alî **Adolfê Thier** û gelê Versay ve hatibû pêxistin, bi van afirandinên balkêş û hêvîyên ku bi serhildana Parîsê, ji nû ve di nav arîya xwe de vedijîya. Revîzyonîzma, înkarkirina ku ji alîyê fotografîyên gelek balkêş (1) û kesên ji vê dîrokê tenê xirakirina kerpîçan û helandina topan (2) tînin bîra xwe." Li gor formulasyona Marks (Marx) ya tûj, divê mirov bîne bîra xwe; hemû tiştên ku heftê û du rojên dawîn pêk hatine û çawa mecbûr kirine ku parîsî hukûmeteke gelêrî ava bikin û ew bikaribe bi hêzên xwe yên leşkerî, xwe li hemcber leşkerên ku karên wan yên meslekî leşkerî ye, bi hêzeke wekhev biparêzin û şer bikin.

Komuna Parîsê li ser du endîşeyan ava bûye: Yek jê ketina leşkerên Prûsyayê bo Parîsê û ya din li ser reaksîyona monarşîyê ya li hember hilbijartinên şaristanîyên meha sibata 1871ê.

"Proleterên paytextî, di nav hemû zor û zahmetîyan de, xiyaneta çîna serdest û ya li ser hukim, baş fêm kirin ku saeta wan hatiye ku rewşê biguherin û desthilatdarî û birêvebirina karên giştî têxin destê xwe" (3) û 21ê adarê yekser beyanekê belav dikin. Şîyarbûneke bi dildarîyeke demokratik, ya 1793ê hatibû qebûl kirin û mebesta wê ew bû ku bi awayekî bawermendane çareserî ji pirsgirêkên civakî yên gelên cuda yê Parîsê re peyda bike û vê bike dezgeheke xurt.

Ji dervayî tedbîrên acîl ku ji ber mecbûrîyeta rewşa xerab û bêçare ya aborî û tenduristîya civaka xebatkaran, belavkirina "karneyên nan", xistina xizmetê ya "firinên erzan" û "beroşa" (tirşika) belaş, ji bo gel birçî nemîne, qedexekirina ji mal avêtina kirêdaran, kêmkirina tevayîya kirêya xanîyan ku ji çirîya paşîn a 1870ê vir ve ketibû fealîyetê. Kêmkirina "Mont-de-Piété" (deynên dewletê bi faîzeke gelek kêm), alîkarîya esnafên ku di ber îflasê de ne û tengavîya deynan dikşînin. Komun, di sîteyê de, dest avêtiye hemû warên civakî û jîyanê, hesabekî biçûk li ser hemû avahî û afirandinên Komunê, bi hêsanî qîmeta wî derdixe hôlê.

Komuna Parîsê û mafên jinan

Berî her tiştî, di warê temsîlkirinê de, Komuna Parîsê rewabûna xwe (mafdarîya xwe) ji hilbijartina endamên xwe ya 26 ê Adarê digire. Ji şoreşa Fransayê û vir de, tu caran qîmeta namzedan û dengdaran hewqas nebibû mecbûrî û bi rûmet: "Ji bo me, ev tiştekî mecbûrî û kêfxweşîyek e ku hûn ji çalakîyên me yên civakî û gelemperî haydar bin û bizanibin em çi difikirin", (4) ev beyan, ya dengdarên taxeke Parîsê ya 17an e.

Bîyanî jî di vê pêvojoyê de cîyê xwe digirin. Piştî avakirina Komara 3em, gelekên wan li alîyê artêşa fransî cî girtibûn. Tarîx: 4ê îlonê 1870; di nav van bîyanîyan de; Garîbaldî û "kirassorên wî" herweha belçîkî, polonî, rûs û hwd. Di derheqê hilbijartina karkerê zêrker **Lêo Frankel** de, ku li Macaristanê hatiye dinyê, Komîsyona Hilbijartinan weha dibêje: *"Weha qebûl bikin ku ala Komunê ya Komara Universel e; Qebûl bikin ku hemû sîte mafê hemwelatîyê ji bo bîyanîyan ku ji sîteyê re xizmet dikin, qebûl dike, Komîsyon jî di vê ramanê de ye û hemwelatîbûna bîyanîyan tescîl dike."* (5)

Jin jî di Komuna Parîsê de cîyekî gelek pêwist û girîng digirin. Ji ber kêmbûna wext û li hemberderketina kal û pîran, mafê dengdanê ji bo jinan di vê demê de nehat qebûl kirin, lê hevalbendên komarê û sosyalîstên *Prudhonist* şanî dan ku ji bo Komunê, têkoşîna ji bo pêşketina civatê û ya jinan yek e. *"Wekhevîya di navbêna cinsan de, di wê demê de, ji alî yekîtîya jinên ji bo parastina Parîsê ve hatibû parastin, ev yekîtî ji alîyê **Elisabeth Dmitrieff** û **Nathalîe Le Mel** ve hatibû îdare kirin. Ev yekîtî, ji bo têkoşîna li hember îmtîyazên çîna serdest ya hukumdar bû".* (6) Li vê derê, ev tişt ne tenê wek prensîp man: Herweha atolyeyên tevxebat yên jinan hatin ava kirin, Yekîtîyên azad, yên di navbêna jin û mêran de legalîze bûn, zarokên ji yekîtîya bê zewac wek yên din hatin qebûl kirin, fahîşetî hat qedexe kirin û weke *"xwînmijî û malzemeyeke tîcarî ya navbêna mirovan de hate qebûl kirin"*

Dêr bûne cihê klubên siyasî

Veqetandina karên olî û kar û barên dewletê, bi biryara 2ê meha nîsanê hate qebûl kirin û malên kilîsê bi hesab û tescîl hate netewî kirin. Gelek dêrên Parîsî ji bo civînên klûbên siyasî bûn cîgeh, bêyî ku ev kult bi temamî ji holê rabe. Komun bi awayekî gelek eşkere da zanîn ku; perwerdekirin bi karaktereke laîk, belaş û mecbûrî tê bi rê ve birin. Ev "perwerdekirina temamî" ye, bi vî awayî **Éduard Vailland** beyan dida, ku bi xwe delegeyê perwerdeyê bû, ji bo wî ev tişt; *"bingeha wekhevîya civakî"* bû. Xebateke mezin ji yên şaredarîyê, pêwîst bû ku bi perwerdeya keçan û ya meslekî ve girêdayî bûya. Ji bo vê yekê dibistaneka hunerî ya tetbîqî ji bo keçên ciwan, di 13ê mehê de hate vekirin. Serpêhatîya paşîn; di 18ê gulanê de, meaşên mamosteyên jin û mêr bûn wek hev û bi hev re hatin zêde kirin. Komisyonê nîşan kir ku *"Zorîyên jîyanê li herderê hene, şertên jîyanê ji bo milet zahmet in û ev qasî mêran, jinan jî eleqedar dike".*

Komun herweha bi hunerê jî têkildar bû. Li ser înîsîyatîva hunermend û wênesaz **Gustave Courbet**, piştî civîneke gelêrî ku nêzî çar sed hunermendan beşdar bû, ***Federasyona Hunermendan*** di 13ê nîsanê de hate ava kirin. Slogana vê yekîtîyê: ***"birêvebirina çalakîyên hunermendî divê ji alîyê artîstan ve bê meşandin."*** *Wek wezîfe, parastina zengînîyên dîrokî, amadekirin û nasandina hunerên îroyîn û ji nû ve avakirina hemû tiştî bi perwerdeyî dabû ser milên xwe".* (7) Bi biryarekê di 22ê nîsanê de, salon ji bo xebatên hunerî ku şaredarîyê bi kar nedianî, dan xizmeta Federasyonê, ev jî, ji bo ku *"şano bê pere ji bo jinebîyan, birîndaran, sêwîyan û muhtacên parastvanên netewî re bê şanî dan".*

Cenaze li erdê ye, lê fikir li ser piya ye

Ji ber van pêşketinên li ber çav di warê xebatê de, Komuna Parîsê navê ***Şoreşa Sosyal*** bi rehetî heq dike. Em behsa qedexekirina xebata şevê ya karkerên firinan û nanpêjan bikin, ji holê rakirina cezayên li ser meaşan (biryara 27 ê nîsanê), aleteke rastîn ji bo kontrolekê sosyal li ser "Împaratorîya Duyem" Formula Yekîtî û rêxistinîya karkeran, wek prensîpek bingehîn ya lidarxistina hilberandinê tê qebûl kirin. Ev nayê wê maneyê ku bi carekê de, bi awayekî çors dê malên şexsî yên gel ji wan bên stendin. Lê xwînmijîya li hember karkeran ya di warê beşdarbûna kollektif ya çalakîyên aborî de, dê bên qedexe kirin. Biryara 16ê nîsanê, weha hesab dikir ku hem bi awayekî miweqet dest deynin ser atolyeyên girtî û tespîtkirina şert û şirûtên finansê yên demên dehatûyê bi awayekî temamî ji alîyê jûrîya hakiman ve ji bo rêxistinên karkeran bên qebûl kirin. Axirê ku meaş bikaribin "şan û şerefa" karkeran garantî bikin, (biryara 19 ê gulanê) divê şertên xebatê û mafê xebata rojê ji alî şaredarîyê ve, bi şirketan re bê munaqeşe kirin, (biryara 13ê gulanê) û ji alî komisyonekê û sendîkayan ve bê tescîl kirin. Li ser vê bawerîyê, pêwîst e meaşek asgarî ji bo hemû karmendan bê xwestin.

Welê dîyar e pêwîstîya kar û barên hiqûqî ji zemanê ku ji delegeyê wan **Eugene Protot** re hatibû veqetandin, bêtir hebû. Bîlançoya **Eugene Protot.** Halbûkî bilançoya wî balkêş bû: Memûrên ku bê qanûnîyê dikin ji kar bên avêtin; karên dadgehî yên belaş bo herkesî, heta karên ku di warên noterî de jî (biryara 16ê gulana 1871ê); hilbijartina hakiman bi dengdana gelêrî. Di derheqê azadîyên civakî de, zimanê fermî ev e: "Divê hemû xayîn û şelaf di bin çav de bin ku tu caran nikaribin zîyanê bidin û hemû teşebusên ji holê rakirina azadîyên şexsî bên ceza kirin" (14ê nîsanê), ev li gel rastîya tal û bûyerên di dema şefê polîs yê kevin de peyda bûn, rewşeke tezat teşkîl dike; ger mirov behsa rehîneyên ku di navbêna 23 û 26ê gulanê de hatine kuştin, neke.

"Cenaze li erdê ye, lê fikir li ser piya ye": Ev gotinên meşhûr yên **Victor Hugo**, gelek caran tê ber pênûsa nivîskarên ku dixwazin Komuna Parîsê bi bîr bînin. Dîsa di eynî demê de nîsana 1871ê, di nivîseke xwe ya di kovara bi navê ***Le Rappel***, de Victor Hugo hinek bi şik weha dibêje: *"Ez wek prensîp terafgirê Komuna Parîsê me, lê di pratîkê de li hember im."* (8) Pirsgirêk îro ev e: Ger mirov prensîpan ji bîr bike; di warê hiqûqê de tê maneya (mafê lojman û hiqûqa kar, û hwd.) lê bikaranîna wê?

* Doçentê Zanistîya Politik, Li Unîversîteya Parîsa-Rojava-Nantere.

YEHYA AL SELO: **Bergên kurdî**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 40 x 30 cm

1 Patrice de Moncan, *Paris incendié pendant la Commune-1871* (***Parisa şewitî di dema Komunê de-1871***), weşanên Mécène, Paris, 2009

2 Karl Marx, Friedrich Engels, *Inventer l'inconnu. Textes et corespondance autour de la Commune*, (***Avakirina nenasîyê, gotar û nameyên di derheqê Komunê de***) La Fabrique, Paris, 2008

3 Sauf indication contraire, toutes les citations qui suivent sont extraites du *Journal officiel de la Commune de Paris* ***(Ger kesek tersê wê nebêje, hemû îfadeyên ku li vir peyda bûne, ji rojnameya fermî ya Komuna Parisê hatine girtin.)*** (réed. 1997, Ressouvenances, Paris, 3 volumes)

4 *Les Murailles politiques françaises*, ***(Dîwarên polîtîk yên fransî)*** Le Chevalier, Paris, 1874, tome 2

5 *Rapport de la Commission des élections*, ***(Rapora Komisyona Hilbijartinan)*** 30 mars 1871

6 Programme du 11 avril 1871, cité par Maïté Albistur, Daniel Armogathe, *Histoire du féminisme français*, ***(Programa 11ê nîsana 1871ê, ji alî Maïté Albistur, Daniel Armogathe, Dîroka femînîsma fransî)*** Des Femmes, Paris, 1977, tome 2

7 Cité par Gérald Dittmar, *Histoire de la Commune de Paris de 1871*, ***(Ji ali Gerald Dîttmar, Dîroka Komuna Parîsê ya 1871ê)*** Dittmar, Paris, 2008

8 Cité par Charles Rihs, *La Commune de Paris, sa structure et ses doctrines (1871)*, ***(Ji ali Charles Rihs, Komuna Parîsê, struktur û doktrînên wê, 1871)***, Droz, Genève, 1955

Wergera ji fransî: Vehbî Aydin

www.arsivakurdi.org

Xemxwarên jinparêzîye

MONA CHOLLET

Mirov nikare behsa xebitandina xizmetkareke malê an paqijîyê bike bêyî ku van statîstîkan bi bîr bixe: Li gor raporeke Rêxistina Hevkarî û Pêşketina Aborî (OECD) ya li ser 29 welatan hat amade kirin, jin bi navincî serê rojê du saet û nîvan ji mêran zêdetir kar û barên malê dikin. (1) Ev ferqa ku li gor welatan pir tê guhertin, ligel bilindîya rêjeya jinan a li ser bazara xebatê, kêm dibe. Lê belê, rapor derdibire ku *"li Danîmarkayê jî, welatê ku dema xebata bêpare ya mêran lê herî bilind e, mêr hê jî ji jinên Norwecê - welatê ku dema xebata bêpare ya jinan lê herî nizm e - kêmtir vê xebatê dimeşînin"*.

Li berevajî vê yekê, jinên pir welatan tenê dikarin nîvwextî bixebitin (li gor Eurostat, rewşa % 32 jinên xebatkar a Yekîtîya Ewropayê wisa ye) û ew bi giranî ji betlaneyên zarokanînê yên demdirêj sûdê werdigrin. Ev herdu eleman terxankirina jinan a ji bo karê malê û zarokan xurt dikin. Ev her du jî dibin sedem ku jin bêhtir bibin berpirsyarên karê malê û mezinkirina zarokan: Li Fransayê, di navbera anketa "Plankirina wextê" ya Enstîtuya Neteweyî ya Statîstîk û Lêkolînên Aborî (Insee) ya 1986ê û ya 1999ê de, wextê ku mêr ji bo karê malê vediqetînin bi tenê 8 deqîqeyan bilind bû.

Asayîbûna xebata tamdanî wekî din dike ku cotên (jin û mêrên) xwedîyên hatinên bilind, karên bi vî rengî bi kesên din jî bidin çêkirin. Ev mînaka civakî ku li Fransayê, piştî dirûşma **Nicolas Sarkozy** ya "Xebata zêdetir, qezenca zêdetir", bi cih bûye, piştgirîya zêdebûna newekhevîyan bi awayekî eşkere hat kirin: Ev dihêle ku hinek ji bisporîya xwe feyde werbigrin, yên din jî neçar bimînin ku karên nerind û kêmmeaş bikin. Herweha, cotên (jin û mêrên) ku dixwazin şûna xebata bi pare ya di jîyana xwe de kêm bikin, mesele di derdorên jîngehparêz û li dij mezinbûnê de, pêrgî xetereya vegera li dabeşkirina adetî ya karan dibin. (2)

Gelo "roja xebatê ya cot" a jinan pêdivîya xebitandina xizmetkaran rewa dike? Ev pirs li cem jinparêzên salên 1970yê bû sedema nîqaşên domdirêj. Ew herweha bû mijara pêkenînê ya jinnehezan, weke ku karîkatureke 1908ê ya kovara heftane ya çepgir *Lîassiette au beure* di deqeke bi sernivîsa: "Dema ku jin wê deng bidin" nîşan dide, jineke burjuwa ji mêrê xwe re dibêje: *"Hevalê min, min xulama me ji kar avêtiye: Ew li dij min bûbû namzeda sosyalîstan"*. (3) Nêzîkatîyeke bi vî rengî dide ji bîr kirin ku mêr bi qasî jinên xwe berpirs û feydegirên xebitandina xebatkarên malê ne. Ew weha pirsa dabeşkirina karê malê dîsa nixumandî dihêle, ku jinparêzan jixwe hewl dida vê pirsê bidin xuya kirin dema ku wan digot: *"Karkerên hemû welatan, kî goreyên we dişo?"*

Lê belê, **Devetter** û **Rousseau** tiştekî balkêş nîşanî me didin: Li cem cotên (jin û mêrên) fransî yên ku xebatkareke malê dixebitînin, dabeşîya karên ku ji xebatkarê re nayên hiştin hîn bêhtir newekhev e. Di vê rewşê de, bi tenê % 18ê mêran bi wekhevî karê paqijîya malê dikin - li cem cotên (jin û mêr) ku karê paqijîyê bi xwe dikin, ev rêje digihîje % 40ê. Nivîskar fikireke weha jî diparêzin: *"Aşbûna karê paqijîyê tiştek e, lê aştîyeke bi rûmet tiştekî din e jî"*. (4)

1 "Panorama de la société 2011" [" Bergeha Civaka 2011ê"], www.oecd.org, 26 tîrmeh 2011

2 Janet Biehl, "Femmes et écologie, un lien "naturel"?" ["Jin û Jîngehparêzî, Girêdaneke Xwezayî?"], *Le Monde diplomatique*, gulan 2011

3 Vegotî di Geneviève Fraisse, *Service ou servitude. Essai sur les femmes toutes mains [Xizmetkarî an Xulamtî. Ceribandin li ser jinên ber destan]*, Le Bord de l'eau, Lormont, 2009

4 François-Xavier Devetter û Sandrine Rousseau, *Du balai. Essai sur le ménage à domicile et le retour de la domesticité [Bimalin! Ceribandin li ser paqijkirina malê û vegera xizmetkarîya malê]*, Raisons diagir, Ivry-sur-Seine, 2011

Wergera ji fransî: Simko Destan

YEHYA AL SELO: **Qeder**, boyaxa rûnî li ser tûwalê, 120 x 90 cm

YEHYA AL SELO: **Dansa rojhilatê**, 100 x 80 cm, boyaxa rûnî li ser tûwalê

Gelo liyaqet nirxeke rêşaşîyane ye?

ANGÉLIQUE DEL REY *

Di 1984ê de **George Orwell** analîza "cot zimanî"ya vê civaka siberojê kiriye, ku dema me ya niha pir nêzîkê wê ye. Îro gelek nirxên sereke hene ku divê bi ronîya vê "***novlangue*****"ê ya ku bi tenê belavkirina tevlihevîyê bi nav dike, bên lêkolîn. Wateya "liyaqet"ê ya ku hê nû ji nû ve hatiye zindî kirin, mînaka vê şêlobûn û zelûlîyê ye. Du berhemên fîlozofî destûrê dide deşîfrekirina dabaşan.

Bingeha wekhevîya komarparêz a ku destûr da derbasbûna ji cudahîyeke civakî ya girêdayî xwînê ber bi yeke din a girêdayî zerengîyan (kapasîte) ve, li gor **Yves Mîchaud** û **Domînîque Gîrardot** liyaqet îro wekî makîneyekê ku hemû newekhevîyan rewa dike, tê bi kar anîn û di nav van newekhevîyan de yên herî nerewa jî hene: Kesên ku tevlî teşxîskirinê nebin, hêjayî pençeşêrê ne û kesên ku ji bo mayîna di kar de "her" tişt nekiribin, hêjayî bêkarîyê ne. Û bi mantiqî kesên ku dizanîn rizamendîya baş bikin hêjayî dewlemendîyê ne…

Liyaqet êdî bûye nîşana *"serfirazîya ferdî ya egoîst"*, (1) êdî negirêdayî nirxên "*respublica* (komar)" ango tiştê gelemper e –lê bi yên *neoliberalîzm* û *utîlîtarîzmê-* (kêr/feyde/perestîyê) ve girêdayî ye. Bîyanî divê mayîna xwe ya li welatê ku hatiyê pêşwazî kirin, bi jêhatîbûnê bikêrî vî welatî bên, bi dest bixe, hunermend jî divê alîkarîya gelemperîyê bi hewldana xwe ya komkirina fonên taybet bi dest bixe… Bi vî awayî em difikirin ku *"li gor analojîyekê ku di navbera mirov û malên bazirganîyê de ye; qabîliyetên me, kalîteyên me, rayeyên me bi merca gihiştina destê dezgeha nexuyayî ango bazarê, dê bihayê "nirxa" rast derxista holê. Çawa ku em weha nîşan didin heke em mal û xizmetên xwe bixin reqabetê, hingê ew ê bi bihayê xwe yê rast bi hev bên guhertin; em îdîa dikin heke em heman tiştî bi mirovan bikin, ev yek dê her kesî li cihê wê/wî yê rast bi cih bike"*. (2) Cotekarîkatûra prensîpeke dadê: Ewil, ew takekesê/î (ferd) wekî berpirsîyara bi tenê ya serfirazîya xwe bi cih dike, bi razberkirina rewşên fîzyolojîk, psîkolojîk û bi taybetî yên civakî, yên ku her yekî bi rola xwe radibin, piştre jî lewre ew dikare her kesê/î bi tenê weke muteşebissekî xwe yê piçûk bibîne yê ku jêhatîbûnan li gor nirxandina wan û mûçeyê wan dide hev.

Di nav derdora neolîberal de ti elaqeya liyaqetê bi wê tiştê re jî ku wê berê îfade dikir, êdî nîne. Berê maneya liyaqetê nirxê exlaqî yê mirovî bû, ku bingeha *rêzdarîyê* (Michaud) an jî *naskirina* (Girardot) kesên din dide nîşan. Lewre herdu jî cihê xwe didin "nirxandinê", qelpezanî û sextekarîya wan a ku hemû şîroveyan dûr dixe û giranîya xwe datîne ser warê *musteheqîyê*: "hemû kar hêjayî destheq in". Nexwe, çawa ku **Girardot** bi hêz digihêje vê encamê, di bin tesîrên amûreke naskirinê de em li "*cebrî îcraya* naskirinê" şahidîyê dikin: Dema ku "***savoir* être** [*zanîna* hebûnê]" ên ku veguherîn xuypakîyên me jî di navê de her tişt bi dolar û euroyê tê pîvan, hingê ne mumkin e ku mirov rêzê ji xwe re bigire. Îdeolojîya liyaqetê di maddekirina mirovî de xwedî rol e. Di vê maddekirina mirovî de ku her kes êdî daketiye komeke qabîliyetên ku hem dikarin bên ava kirin, hem pîvan û hem jî bi kar anîn.

Gelo ji me tê em têgeha liyaqetê bi xwe rizgar bikin? Her du nivîskar bi hev re dibêjin erê, lewre "*liyaqet û bêliyaqetî* (qisûr) îfadeya pêdivîya me ya rêzgirtin û pêzanîna nirxê kesên din e, da ku em di cihaneke mirovî de bijîn". (3) Lê tevî ku li gor **Michaud** lêgerîna demokratîk a wekhevîyê, bi sarkirina ji çalakîyê tevahîya wateyên vê fikrê jê dikişîne, ji bo **Girardot** liyaqet ewil çalakîya wekhevîyê ye, lewre ew ne encama hesabê zêde ye, lê belê ya *qabîliyetê* ye. Bi rastî mesele rûmetgirtina ji wê tiştê re ye ku dema me xwest em bidin, me bi dest xist, ji vê naskirinek peyda bûye ku girêdana civakî ava kiriye. Têgihiştina xweş ku hinek kes di nav fikra wê ya ku dane me û ya ku divê em "heq bikin" de dikarin pê xemgîn bin ji ber ku ew cihêrengîya ekosîstemê nahewîne.

* Mamosteya dersa fîlozîfîyê û nivîskar

** Novlangue: zimanê resmî yê Oseanê (Océania)

1 Yves Michaud, *Qu'est-ce que le mérite?[Liyaqet çi ye?]* Gallimard (Weşanxaneya Folio), Paris, 2011

2 Dominique Girardot, *La société du mérite, idéologie méritocratique et violence néolibérale* [Civaka Liyaqetê, Îdeolojîya Liayqetokratîyê û Şideta Neoliberal], Weşanxaneya Bord de l'eau, Lormont 2011

3 Yves Michaud, berhema li jor

Wergera ji fransî: Sevda Orak

arsivekurd.org

Dengên demê

EDUARDO GALEANO *

Welatîyê uruguayî, Eduardo Galeano yek ji nivîskarên latînamerîkî yên hemdem ên herî binavûdeng e. Ew hem rojnamevan, hem helbestvan, çîrokbêj û hem jî dîroknas e, li vir bi kurte-nivîsên pêkenokî yên kesekî ji rêzê yê jibîrkirî balê dikşîne jiyanên piçûçik, lê carna ji analîzên pir dirêj zêdetir tiştan dibêje

ROJ

Li Pennsylvanyayê li cihekî, **Anne Merak** weke alîkara *Rojê* dixebite.
Ji dema herî dûr a ku tê bîra wê ve, wê her tim ev kar kiriye. Her sibe, ew radibe û bi milên xwe rojê radike da ku rojê hilde ezmanan; û her êvar, ew milên xwe ber dide ber xwe ji bo ku bihêle roj here ava.
Ew hê pir piçûçik bû gava ku xwe li vî karî girêda û wê ti caran ev kar di ser guhê xwe re neavêt.
Bi qasî nîv-sedsal berê, xelkê navê wê bi dînîtî derxist. Ji hingê ve, **Anne** di gelek timarxaneyan re derbas bû, ji alîyê gelek psîkîyatran ve hat venêrtin û bi qasî dinyayekê heb û derman pê dan daqurtandin.
Wan ti cara nekarî ew baş bikin.
Wisa baştir e jî.

BANKAVANÊ NIMÛNE

John Pierpont Morgan xwedîyê bankaya herî bihêz a cîhanê û herwiha xwedîyê heştê û heşt şirketên din bû.
Ji ber ku mirovekî pir meşgûl bû, wî ji bîr kiribû berdêla bacên sermayeya xwe bide.

Wî ji sê salan û vir ve, ango ji buhrana 1929ê ve ji rewşa qezencên xwe jî resmî nedabû zanîn.
Nûçe bû sedemê rabûna hêrsa girseyên perçiqandî li bin xirbeyên buhrana borsayê ya ***Wall Streetê*** û li tevahîya welêt bû sedemê bigewdebûna skandaleke mezin.

Ji bo xwe rizgarkirina ji îmaja bankavanê têrnexwir û kedxwir, wî rabû gazî berpirsîyarê têkilîyên bi gel re yê sîrka ***Ringling Brothers*** kir û pê şêwirî.

Vî bisporî jî jê re pêşniyar kir ku elameteke xwezayê, **Lya Graf**, jineke sî salî û bejna wê şêst û heşt santîmetre, lê belê rûyê wê, bejnûbal û timtêla wê qet ne yên acûcekê bûn, li cem xwe bişuxulîne.
Bi wî awayî ew kete nav kampanyayeke pir mezin a danasînê. Reklam ji wêneyekî pêk dihat. Li ser wêne bankevanekî dişibîya bavekî dilovan, li ser textekî meliktîyê rûniştî û jinika piçûçik jî danîbû ser çokên xwe. Fikra di wêne de dibû temsîla hêza diravî ya ku xelkên di nav lepên dijwar ên buhranê de diparastin.
Ev yek ji bo wî bû şkestinek..

DERSA BIJÎŞKTÎYÊ

Di derseke xwe ya venêrîna tund a nexweşan de li Buenos Airesê cara pêşî Ruben Omar Sosa rewşa Maxiliana, danî ber xwe. Ev bû dersa herî girîng a tevahîya salên wî yên lêkolîn û perwerdeyê.

Profesorekî ev rewş wiha rave kiriye: **Doña Maximiliana**, westiyayî ji tevahîya jîyaneke derbasbûyî ya bêyî betlanên yekşeman, berî demeke nêz ketibû nexweşxaneyekê û her roj wê heman tişt dipirsî:

– Ji kerema xwe, doktor, hûn ê karibin nebza min bipîvin?

Piştî bi awayekî nerm bi tilîyên xwe pêl qevdika zenda wê dikir û dûre destê wê hêdîka berdida, doktor jê re digot:

– Pir baş e. Heftê û heşt. Nebza te bêkêmasî ye.
– Waa, spas doktor. Îca niha jî gelo hûn ê karibin nebza min bipîvin, ji kerema xwe?

Û doktor careke din nebza wê dipîva û jê re ji nû ve îzah dikir ku tenduristîya wê têra xwe baş e, û rewşeke ji vê baştir ne mumkin e.

Vê dîmenê her roj xwe dubare dikir. Her cara ku ew di ber odeya **Doña Maximiliana** re derbas dibû, vî dengê kelegirî gazî wî dikir û milê xwe dîsa û dîsa eynî mina şaxikekî darê dirêjî wî dikir.

Wî, neçar daxwaza wê bi cih dianî, ji ber ku divê doktorekî baş pir bi sebr û aram be li hemberî nexweşên xwe yên ku bi latînî wateya wan jî bi sebrûaram e, lê belê wî ji xwe re digot: *Ev pîra han bûye bela û maye* û dûre wiha difikirî: *Aqlê wê jî piçek çelqîyaye.*

Piştî gelek salên din doktor hê nû fam kir ku tiştê ku pîrê dixwest tenê ew bû ku kesek destê xwe li devereke laşê wê bixe.

PEYV

Li nav dahlûdevîyên bilind ên **Paraná**, kamyonvanekî tembîh li min kir ku ez bi tedbîr bim:

– Li himberî dirinde û wehşan ha ji xwe hebe. Hê jî li kevî û quncikan hin ji wan serîberdayî digerin. Lê baş e ku ne zêde ne. Niha hêdî hêdî hemûyan digirin û wan di parkên sewalan de radigirin.

Wî bi min re bi spanyolî xeber dida. Lê belê ew ne zimanê wî yê rojane bû. Kamyonvan di jîyana xwe ya her roj de bi guaranî dipeyivî û ev ziman yê wan dirindeyan bi xwe bû, ew dirindeyên ku ew ewçend ji wan ditirsiya û ew biçûk dixistin.

Tiştê ecêb, li Paraguayê, zimanê şkestîyan tê axaftin.

Hê jî ecêbtir, şkestî bi israr bawer dikin ku peyv pîroz in. Peyvên ku derewan dikin, xiyanetê li tiştên behskirî dikin, lê belê yên rastîyê dibêjin jî gîyanê tiştan deşîfre dikin. Şkestî piştrast dikin ku gîyan di nav peyvên ku wî derdibirin de veniştiye. Eger ez peyvên xwe bidim te, ez xwe didim. Ziman ne tiştekî bê qîmet e.

BAZARA GLOBAL

Darên bi rengê darçînê, fêkîyên zerê zêrîn.
Destên qehweyî, tovên spî yên di nav pelên kesk de dipêçin.
Tov dimeyîn li ber tava rojê. Dûre, gava wan datînin ser hev, li bin ezmanê sahî, tav wan ziwa dike û hêdî hêdî rengekî paxir dide wan.

Hingê kakao dest bi rêwîtîya xwe ya li ser behra rengezmanî dike.
Ji bo ji nav destên ku wê diçînin derbasî nav devên ku wê dixwin bibe, kakao li karistanên ***Cadbury, Mars, Nestle*** an jî ***Hershey*** pêrgî gelek desttêwerdanan dibe, di pey re jî li supermarketên cîhanê pêşkêşî firotanê tê kirin: Ji her dolara ku dikeve nav kasayê, sê sent û nîv digihîjin gundên ku ew jê hatiye.
Richard Swift, rojnamevanekî torontoyî çû Ghanayê, heta xwe gihande yek ji wan gundan.
Ew çû serdana cotyarên çandinîyê dikin.

Gava ew rûnişt ji bo bêhna xwe vede, wî hin şokolayên di paketan de ji berîka xwe derxistin û hê wî gezek jî li şokolaya xwe nedabû, komek zarokên bi meraq dor lê pêçan.
Wan di jîyana xwe de ti caran tiştekî wisa tehm nekiribû. Wan pir jê hêz kir.

JIDAYÎKBÛN

Li nexweşxaneya dewletê ya li taxa herî dewlemend a *Rio de Janeiroyê*, rojê bi qasî hezar nexweş tên venêrtin û derman kirin. Hema hema hemû xizan an jî pir xizan bûn.
Doktorekî nobedar ev yek ji **Juan Bedoian** re wiha vedigot:

–Hefteya borî, ez neçar mam ji du pitikên keç ku wê bihatana dinyayê yekê bineqînim. Li vir, bi tenê aleteke nefesdayînê heye. Her du pitik jî di heman kêlîyê de hatin dinê û her du jî li ber mirinê bûn, û ez neçar mam biryarê bidim ka diviya kîjan bijî.

Di wê kêlîyê de doktor wiha fikirî bû: *Ne karê min e ez ji wan yekê tercîh bikim, divê Xwedê biryara vê yekê bide.*
Lê belê Xwedê ti tişt di guhê wî de negotibû.
Doktor kîjan biryar dabûya bila dabûya, di encamê de wî yê yek ji wan bikuşta.
Eger wî ti tişt nekira, wî yê her du bikuştana.
Lê belê wextê wî tinebû zêdetir dudil bimîne. Her du keçikên pitik li ber derçika mirinê bûn, wan dest pê kiribû ji vê cîhanê vediqetiyan.
Doktor çavên xwe girtin. Yek ji pitikan bû mehkûma mirinê, ya din bû mehkûma jîyînê.

TENDURISTÎ

Li rawestgehekê komek zarok otobusek dagîr kir.
Di bin milên wan de pirtûk, defter û gelek alavên din hene, ew dipeyivin û bênavber dikenin. Hemû bi yek carê bêyî ku li hev guhdarî bikin, dipeyivin, qarewarê dikin, xwe bi vir ve û wir ve dilivînin, hev daf didin û ji bo hertiştî û ji bo ne ti tiştî bi dengekî bilind dikenin.
Ciwamêrek xwe nêzî yek ji zarokên herî şûmî, yê bi navê **Andres Bralich** dike û jê dipirse:
– Çi bi te hatiye, kuro, ma tu bi nexweşîya kenê ketiyî?
Mirov carekê çav li ser bigerîne bes e, da ku fam bike ku hemû rêwiyên din ên otobosê derman bûn û ku êdî ji nexweşiya kenê xilas bûne.

DESTKARÎ

Mohammed Aşraf naçe dibistanê.
Ji hilhatina Rojê heta tarî dikeve erdê, ew topên fûtbolê dibire, diqewêre, qul dike, bi hev ve dike û didirû; ew topên ku ji gundekî pakistanî yê bi navê ***Umarkot*** tên îmal kirin û ber bi qadên lîstinê yên tevahîya cîhanê digindirin.
Mohammed yazdeh salî ye. Ew vî karî ji pênc salîya xwe ve dike..
Eger xwendina wî hebûya û wî bi ingilîzî jî zanibûya, ew ê têbigihîşta ka li ser etîketên ku ew bi her berhemeke xwe ve dizeliqîne, çi nivîsandî ye: *Di çêkirina van topan de zarok nayên xebitandin.*

LI DIJÎ HERIKÎNÊ

Fikrên kovara hefteyî ***Marcha*** hinek ber bi rengê sor (komunîzm) ve bûn, Lê belê rewşa aborî ya kovarê ketibû bin xeta sor ya petax û îflasê. **Hugo Alfaro,** ê ku li tenişt rojnamevanîya xwe bi rêveberina kovarê re jî eleqedar dibû û karûbarê acizker ê hesab û fatûran jî dikir, di hin firsetên pir nadîr de bi kêfeke mezin ji cihê xwe hildipekiya:
– Temam, pir baş e ev, niha pereyên me terî lêçûnên hejmara bê dikin!

Beşa ji reklamê re veqetandî hatibû firotin. Di tevahîya dîroka rojnamevanîya gerdûnî ya serbixwe de, me her tim ev cûre bûyerên mûcîzewî weke delîla hebûna Xwedî pîroz kiriye.

Lê belê, midûrê kovarê **Carlos Quijano** bixwe ji tirsa reng lê nedima. Li gor wî ev sosreteke mezin bû: Ji vê nûçeyê xirabtir nûçe tinebû. Eger reklam hebûya, divê rûpelek û hetta çend rûpel jê re bihatana veqetandin. Her perçeyê rûpelekê cîhekî pîroz bû ji bo dijderketina zeptûreptan. Ji bo ku rastîyên veşartî derxe holê, ji bo ku fesadiyên aliyên dijber eşkere bike û ji bo ku misoger bike mirov nayên xapandin.

Dîktatorîya eskerî ya ku bi ser ***Uruguayê*** de girt, dawî li sî û çar sal hebûna **Marcha** û ya hin dînîtîyên din jî anîn.

GIRTÎGEH

Di 1984ê de, **Luis Niño** li zindana *Lurigancho* ya li Lîmayê li ser navê rêxistineke parastina mafên mirovan lêkolînek kir.

Ew kete nav van kesên bi tenê yên li ser hev hatibûn kom kirin û hewl da, bi awayekî ji awayan, di nav van zîndanîyên tazî an jî kincên jihevketî li xwekiribûn, ji xwe re rêyekê veke.

Dûre, wî daxwaz kir ku bi midûrê girtîgehê re biaxive. Ji ber ku midûr ne amade bû, berpirsîyarê karûbarên dermankirina girtîyan pêşwazîya wî kir.

Luis jê re got ku wî girtîyên li ber mirinê, yên xwîn vedireşin dîtine, gelek ji wan ji ber tava zêde laşên wan bûne mîna agir û birînên xedar li laşên wan de hene, lê belê tevî vê yekê jî ew li girtîgehê rastî doktorekî jî ne hatiye. Berpirsyar jê re rewş wiha îzah kir:

– Em doktor, em têkilî wan nabin heta ku hemşîre gazî me nekin.
– Başe, hemşîre li ku derê ne?
– Pereyên me yên ji bo em hemşîreyan li vir bixebitînin, tunene.

ÊRIŞKARÊ ÊRIŞKIRÎ

Li Amerîkaya Latîn, rejîmên eskerî pirtûkên dijberî rejîmê dişewitandin. Di demokrasîyên îro de, pirtûkên tên şewitandin ên hesabgirîyê ne. Dîktatorên eskerî mirov didan winda kirin. Dîktatorên diravî diravan didin winda kirin.
Rojekê, bankayên Arjantînê red kirin ku pereyên mişterîyên xwe li wan vegerînin.

Norberto Roglich hemû pereyên xwe danîbûn bankayekê ji bo ku mişk wan nekojin, an jî diz wan nedizin. Gava bankayê dest danîn ser pereyên wî, Don Norberto pir nexweş bû, ji ber ku sal ti caran bê derdûbela derbas nedibûn û meaşê wî yê xanenişînîyê jî têra kirîna dermanên wî nedikirin.

Ti rêyek li ber nemabû: Hêvîşikestî, ew ket nav qesra keleha diravî û bêyî ku destûrê ji ti kesî bixwaze, wî xwe gihand heta maseya rêveber. Di nav destê xwe de narincokek digirt:

– Hûn ê pereyên min li min vegerînin an na ez ê we hemûyan bifirînim!

Narincok ji plastîkê bû, lê belê bi kêrî pêkhatina mucîzeyekê hat: Bankayê pereyê wî lê vegerand.
Dûre, ew hat girtin û ket zindanê. Dozger sêzdeh sal cezayê zindanê xwest. Ji bo Don Noberto, ne ji bo bankayê.

KARGEH

Sal 1964 û cinawirê heftserî yê komunîzma navneteweyî heta dawî heft devên xwe vedikirin ji bo ku Şîlîyê hûrhûr bike û daqurtîne.

Mejîyê raya giştî bênavber bi wêneyên dêrên şewitandî, wargehên komkirinê, tankên rûs, dîwarekî Berlînê yê li navenda Santiagoyê û gerîlayên porûrihlihevketî yên zarok direvandin, dihate bombebaran kirin.
Hilbijartin hatin li dar xistin.

Tirs bi ser ket û Allende têk çû. Di wan vedorên bi êş de, min jê pirsî ka tiştê herî zêde ew birîndar kiriye çi ye..
Allende got tiştê li cihekî pir nêz, li maleke taxa Providencia qewimî pir ew êşandiye. Jinekê karê mitbexê dikir, li malê mêze dikir û ji bo meaşekî pir kêm pir diwestiya, hemû kincên xwe xistibûn kîsekî naylon û li bin axa bexçeyê patronên xwe veşartibûn ji bo ku dijminên sermaya taybet wê neşêlînin.

AGAHDARÎYA GLOBAL

Çend meh piştî hilweşîna bircan, Îsraîlê Cenîn da ber bombeyan.
Ji wargeha penebarên filistînî niha tenê çaleke qirase ya serdevde tije bi mirîyên di bin xirbeyan de perçiqandî ve maye.
Çala krater a Cenînê bi qasî bilindîya bircên New Yorkê kûr bû.
Tevî vê yekê jî, ji bilî kesên rizgarbûyî ji hilweşînê yên ku bi hêvîya vedîtina xizm û nasên xwe bibînin xirbe dixepartin û vedidan, haya kê ji vê çalê çêbû?

* Nivîskarê Ûrûguayî. Ev beşek ji pirtûka wî ya dawî ya bi fransî ye: *Dengên Demê*, Lux, Montreal, 2011.

Wergera ji fransî: Baran Nebar

www.kurdiyaka.org

ÇAND Û HUNER

Fîlmeke kurdî ku bêhna 'Yeşilçam'ê jê tê: Doz

ALI GÜLER

Fîlma ***Doz***, ku tê de stranbêj **Dîyar** û **Zozan** dilîzin, yek ji wan berheman e, ku di van salên dawîyê de li Kurdistana Başûr bi budçeyeke weha mezin hatiye saz kirin. Lê belê, di warê senaryo û listîkvanîyê de gelek li jêr bendewarîyan de maye. Bawer dikim, ku sedema vê yekê ew e, ku **Vîyan Mayî** derhênerîya fîlmê kiriye û hunermendên wekî **Dîyar** û **Zozan** tê de rol stendine. Ji ber ku fîlma 30 deqîqeyî ya derhênerê, ya bi navê ***Kevoka Spî***, ku di 2008ê de kişandibû, gelek deng vedabû û di çendîn festîvalên navneteweyî de hêjayî gelek xelatan hatibû dîtin û ecibandin,

Derhenêra kurd **Mayî,** bi vî awayî di nav sînemaya kurdî de ji xwe re cihek dîtibû û gelek behsa wê hatibû kirin. Piştî ku min ***Kevoka Spî*** temaşe kiribû, ez jî li ser navê sînemaya kurdî ji **Vîyan Mayî** di nav gelek bendewarîyan de bûm. Lê belê, piştî ku min fîlma ***Doz*** temaşe kir, hêvîyên min şikestin. Bi rastî ne bi tenê fîlma ***Doz***, di gelek fîlman de, ku van salên dawîyê li Kurdistana Başûr hatine kişandin, pirsgirêk û xetayên mantiqê hene: Mînak di filma ***Herman*** a **Hussein Hassan** û ***Sîbera Fîşekê*** ya **Masoud Arif** de heman pirsgirêk hene. Herçend ev fîlm di warê siyasî de hin peyamên dîyarkirî bidin jî, di warê sînemayî de gelek qels in. Dema ku li van fîlman were nihêrtin, bi awayekî aşkere xuya dibe ku sînemaya kurdî, ku vedijî, di vî parçeyî de sancîyên giran ên zayînê dikişîne. Helbet, li hember ewqas hebûna aborî û derfetên afirandî ev amatorî dibin ku werin qebûl kirin, nizanim. Ev yek dikare bibe mijara gotareke din.

Fîlm bi sehneyeke aşîna dest pê dike

Senaryoya fîlmê *Doz* ji çîrokeke gelêrî hatiye wergirtin. Li gorî çavkanîyên gelêrî, çîroka Xurşîdê Çavbixal 200 sal berê li hawîrdora Colemêrgê hatiye jîyandin. Lê Vîyan Mayî, rasterast girêdayî çîrokê nemaye û gelek guhertin di fîlm de çêkirine. Bêguman her derhênerek dikare fantazîyên xwe têxe nav senaryoyê û guhertinan çeke. Lê derhêner, gelek tişt guherandine û vê yekê jî gelek xeletî bi xwe re anîne. Wek mînak; ew kesê ku Sîrmê dixwaze axayeke kurd e, lê di fîlm de wek kurê Mîrê Ecem hatiye nîşandan. Ev jî rengek siyasî dide fîlm. Lê li gorî çavkanîyan, ev çîrok, çîrokeke civakîye. Dîsa, di dawîya çîroka resen de Xurşîd û Sîrmê herdu jî dimirin. Dibe ku ji ber vê yekê ev çîrok bûbe efsane û heta îro gihîştibe me. Lê di fîlm de tişteke wisa tune û herdu evîndar bi awayeke bextewar digihîjin hev.

Fîlma ***Doz*** a **Vîyan Mayî**yê bi sehneyekê dest pê dike, ku wekî sehneya vekirinê ya fîlma ***Mem û Zîn*** a **Ümit Elçi** ye, ku di 1991ê de hatibû kişandin; em dibînin ku keç û xort di şeva sersala kurdan a ***Newrozê*** de meşale di dest de di nav gund de digerin. Sehneya di dorê de jî li ser berdewamîya fîlmê de fikir dide mirovan. Dema ku yek ji lehengên sereke yên fîlmê **Xelîl Axa** (**Selah Rekanî**) di dîwana xwe de digel çend kesan rûdinê, pirs tên bihîstin, lê gundîyên ku dipirsin ne xuya ne. Piştî ku xulamekî wekî **Beko** ji axa re dibêje ku *'xelk li ser erdê te seyrana Newrozê dikin'* axa pir bi hêrs dikeve û zilamên xwe yên çekdar dişîne da ku bera gundîyan bidin. Keça axa **Sirme** (**Sibel Erdoğan**) û xulamê wî **Xurşîd** (**Dîyar**) jî di nav gundîyan de ne. Dema çekdarên axa êrişî gundîyan dikin, **Xurşîd** li dijî wan derdikeve û pev diçin. Li ser vê yekê gazî **Xurşîd** dikin ku derkeve pêşîya axa. Bi hevpeyvîna wan herduyan çarçoveya fîlmê jî tê xêz kirin; *serpêhatîyên balkêş ên di navbera axayekî xedar û gundîyên feqîr de*. Ku li senaryoya fîlmê were nihêrtin, tê dîtin ku ji çîrokeke klasîk hatiye stendin û ne afirînêr e. Ji ber ku stranbêjên wekî **Dîyar, Zozan** û **Sibel Erdoğan**, ku em ji fîlma ***Dol*** a **Hiner Saleem** dinasin û herweha **Selah Rekanî**, ku di warê sînemayê de ne xwedî rabuhurîyekê ye, gelek zor daye fîlmê. Jixwe, xuya ye ku senaryoya fîlmê li gor lehengê sereke hatiye nivîsandin. Her ji ber vê yekê di fîlmê de şopên ***Yeşîlçam**** û ***Bollywoodê***** bi ber çavê mirov dikevin. Çawa ku di salên 1970yê de li Tirkiyeyê stranbêj di fîlman de lehengên sereke dilîstin... Bêhna vê yekê ji fîlma ***Doz*** tê. Nayê zanîn ka ji qestan weha hatiye kirin yan tesaduf e, lê belê rastîyeke weha aşkere ye. Di fîlmê de **Xurşîd** ciwanekî bêxwedî ye, ku xulamtîya axa dike. Lê belê helwêst, reftar û tevgerên wî ji kurekî malbateke arîstokrat cuda nîne. Ev yek jî nîşan dide, ka listîskvan çiqas ji karakter dûr e û ev yek jî vê helwêsta amatorî ji nîqaşê re vedike. Di fîlmê de **Sibel Erdoğan** wekî keça axa (**Sirme**) derdikeve pêşîya me. **Xurşîd** û **Sirme** du ciwanên dildarên hev in. Lê belê astenga herî mezin, ku li pêşîya wan e, sosyalîteya wan e. Yek keça axa ye, yê din jî xulamekî ber destê bavê wê ye. Di nav van nakokîyên civakî de, dema ku **Xurşîd** û **Sirme** têkilîya xwe berdewam dikin, rojekê kurê **Mîrê Acem,** ku heta wê gavê di filmê de behsa wî nayê kirin, derdikeve û diçe cem axa û jê re dibêje ku dilê wî di **Sirme**yê de ye û dixwaze pê re bizewice. Piştî ku du zilamên bi kostumên reş û kravat tên, em dibînin ku senaryoya fîlmê qut û belawela dibe. Derizîna cidî ya pêşîn bi vî awayî dest pê dike. Lê belê **Xelîl Axa**, ku di vê mijarê de dudil e, da ku rewşa xwe, ku diheje, hêzdartir bike pêşnîyareke bi vî rengî erênî dibîne. Her weha, rûspîyê li cem axa, **Mamê Şêxo**, ku li ber sikratê ye, wekî sehneyên klîşe yên ***Yeşîlçamê,*** ji **Xurşîd** re vedibêje, ku di rastîyê de ew kî ye. **Mamê Şêxo** ji **Xurşîd** re dibêje, ku **Xelîl Axa** birayê, bavê wî **Zîyedîn Axa** bûye û **Xelîl Axa** da ku bikeve şûna kekê xwe kuştiye. Li ser vê yekê **Xurşîd**, ku ji berê de bi axa re li hev nake, berê xwe dide çîyayan. Di fîlmê de sembola çîya û ên li ser çîyayan bi vegotineke şolî hatine behs kirin. Koma ku berê bi peyvên partîzan û serhildêr dihatin qal kirin, bi giştî nehatine nîşan dan. Gelo ew partîzan in yan komeke eşqîya ne, ku dijberîya axa dikin. Ev yek di fîlmê de pirsnîşanek e... **Xurşîd** jî tev li vê komê dibe. Me ev kom berê jî di rasthatina wan a digel çend xortan, ku ji ber axa derketibûn serê çîyê, dîtibû. Piştî ku **Xurşîd** li hespê xwe siwar dibe û ber bi çîyê ve dibezîne, em dibînin ku çefî (cemedanî) di serî de, çek di dest de wekî fermandarekî fermana dide. Ev yek jî rastîya fîlmê ji nîqaşê re vedike. Dema ku gundîyên asayî tev li vê komê dibin, tûşî pirsan dibin, xulamekî ku sewîya wî ya civakî li jêr gundîyan e, çawa dikare weha zû bibe fermandar û berpirsiyar û derdikeve pêşîya me. Ev yek di warê mantiqî de nîşan dide ka fîlm ji rastîya jîyanê çiqas dûr e. Bivê nevê temaşevan ji ber vê yekê dikeve nav şik û gumanan.

Peyamên siyasî yên dûrî estetîka hunerî

Sirme, bi hêrs dikeve ku **Xurşîd** bêyî xebera wê çûye, pêşnîyara kurê **Mîrê Acem** qebûl dike. Şeva dawetê **Xurşîd** ji nişkan ve tê û ji xizmetkara **Sirme**, Dadoyê (**Leyla Batki**) re her tiştî dibêje. **Dado**, ku karaktera fîlmên Yeşîlçamê ya ***'Arap Bacı'*** tîne bîra mirovan, ji **Sirme**yê re vedibêje û **Sirme** jî şeva dawetê ji malê direve û li dû **Xurşîd** diçe. Rêya dûr



a **Sirme**yê bi awayekî bê alaqe dikeve ***Êzîdxanê*** û li wê derê dibe mêvana mala **Mîr**. Mîr (**Kalê Zerdeşt**) û xanima wî (**Zozan**) bêkêmanî mazûvanîya **Sirme**yê dikin. Li vê derê di sehneyekê de kurê **Mîr** ji **Sirme**yê re behsa çand û bawerîya êzdî dike. Dema ku xanima Mîr dibîne kurê wê nêzî **Sirme**yê dibe, ji kurê xwe re dibêje ku Sirme mêvana wan e û heger tiştekî weha rû bide, ew dê wî bikuje. Bi vê gefxwarinê re derhenêr nêrîna xwe ya siyasî jî nîşan dide. Nirxên exlaqî, mêvanperwerî û welatparêzîya êzdîyan... Kurê Mîrê Acem jî pê dihese ku **Sirme** li ***Êzîdxanê*** ye, fikrên wî yên şerekî li dij wan bêhtir dibe. Piştî ku artêşa Acem êrişî Êzîdxanê dike, bi fermana Mîr her kesê ku dikare rahêje çek, li meydanê kom dibe. Mîr li vê derê dibêje ku Sirme ***'namûs e, welat e, şeref û Kurdistan e'*** û ew dê li dij artêşa **Acem** şer bikin. Xelkê li meydanê jî çek, dar û bivirên xwe rakidin û piştgirî didin. Lê belê têkilîya vê yekê bi rastîya kurdan ve nîne. Ev sehne bêhtir li ser şerekî serdema navîn a li Ewropayê ye. Ev sehne jî digel çendên din dîmeneke *pêkenîk û teatral* dide fîlmê. Paşê em dibînin ku komeke kesê birîndar ji şer vedigerin, lê belê tu dîmena şer nayê nîşandan û ev yek jî cidiyeta fîlmê qels dike. **Xurşîd** jî ji şer vedigere û dixwaze bi **Sirme**yê re vegere gundê xwe. Di rê de **Xurşîd** bi kurdîyeke dest û pê şikestî ji Sirme re dibêje ***'tu jineke azad î.'*** û bi vî awayî fîlm bi bextewarî bi dawî dibe.

Di dawîya fîlmê de aqûbeta **Xelîl Axa** nayê nîşan dan û listîkvanîya qels a **Dîyar** û **Sibel Erdoğan** û gotinên wan ên zordayî bandoreke neyînî li ser fîlmê dike. Herweha, herçend fîlm behsa demekê dike jî, por û cil û bergên listîkvanan modêla 2010ê ne. Xetayeke din a fîlmê jî derbarê bikaranîna zimên de ye. Nemaze, kurdîya xerab ku karakterên sereke jî tê de, listîkvan bi kar tînin. Aşkere ye ku, dema ku fîlma ***Doz*** di warê feodalîzm, neyartîya li dij kurdan û di şexsa civaka êzîdî de, pesnê elewî û asûrî û herweha hindikahîyên din ên li Kurdistanê dide, di warê sînematografîyê de gelek qels e û dûrî estetîzmê ye.

Jixwe, serpêhatî û peyamek dikare watedar be heger bi ziman û estetîka hunerî werin vegotin yan na berhemeke saxlem dernakeve holê. Heger senaryo ewqas were dirêj û tevlihev kirin xetayên mantîqî jî bêhemdî xwe peyda dibin. An ku ewqas ta'b li ber avê diçe. Hêvîdar im **Vîyan Mayî** di fîlmên xwe yên nû de van xetayan dubare neke û dîsa di tama ***'Kevoka Spî'*** de bi fîlmeke din derkeve pêşîya temaşevanên kurd û pêbawerbûna wan dubare ava bike.

Kunyeya Fîlmê

Nav: Doz
Derhenêr: Vîyan Mayî
Senaryo: Vîyan Mayî
Listîkvan: Dîyar Dêrsim, Sibel Erdoğan, Leyla Batki, Selah Rekanî, Zozan, Kalê Zerdeşt.
Kamera: Hawkar Farhad
Mawe: 80 deqîqe.
Sazkirin: 2011

* Sînemaya tirkî
** Sînemaya hindî

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya

'Di nav Kurdistana hov re'

PERWER YAŞ

Di Nav Kurdistana Hov re, ango bi navê wê yê orjinal ***"Durchs wilde Kurdistan".*** Nivîskarê oryantalîst yê alman **Karl May** (1842-1912) li gel ku Kurdistan nedîtiye, di vê romanê de qala hovîtîya li Kurdistanê dike. Pirtûk cara yekem di 1892yê de hate weşandin û yek ji berhamên herî giring a Karl May e. Her çendî zêdetirî 30 pirtûkên wî hebin jî, nivîskar ev sed sal in bi vê berhema xwe tê nasîn.

Herwiha dema li bajarê Hohenstein-Ernstthal, ku wekî "Bajarê Karl May" tê bi nav kirin û dikeve rojhilatê Almanyayê (ji paytext Berlînê nêzî 300 km dûr e), bûyereke hovane diqewime, çapemenîya herêmî hê jî sernîvîsên wekî ***"Qey ev der Kurdistana hov e?"*** bi kar tîne. Wekî mînak di dawîya sala 2010ê de li bajêr mirovekî ku hişê wî ne temam bû, ziyan dida erebayan û baz dida. Piştî zerardayina 50 hezar euroyan hate desteser kirin, çapemenîya herêmî gotina ***"Bajarê me êdî ne mîna Kurdistana hov e"*** bi kar anî. (1)

Le belê ***"Di Nav Kurdistana Hov re"*** ji ber çîrokên gerokên ewropî ku di Kurdistanê re derbas bûne, hatiye nivîsandin. Herwiha ev nêzîkî 100 salan e almanên ku dixwazin Kurdistanê nas bikin, bi vê pirtûkê dest pê dikin. Ev berhem wisa navdar e ku dema almanek bibihîse hûn kurd in, yekser dibêje ***"Ha tu ji Kurdistana Hov têyî".*** Ji ber ku bi çavên ewropîyan hejmara bûyerên li ser Kurdistanê ku wekî romanekê hatibin hûnandin, hingî tilîyên her du destan in û navê vê pirtûkê di hişê wan de maye. Ji bilî vê pirtûkê bi heman navî di sala 1965ê de fîlmek jî hate kişandin. Qehremanê fîlm **Kara Ben Nemsî** ye ku tê wateya *'Lawê almanê reş'*. Jixwe bi vî navî, mirov dikare bibîne ka Karl May romana xwe çiqas baş hûnandîye; ***'Kara'*** peyveke tirkî ye û tê wateya ***'reş', 'Ben Nemsî'*** jî di dîrokê de ereban bi wateya *'lawê alman'* bi kar dianîn û îro jî ji Awistiryayê re dibêjin Nemse. Rêya 'Kara Ben Nemsî' ketiye Mûsilê. Li ser hespê xwe yê boz e, çekê wî û seyê wî ***Dojan*** jî li gel wî ne.

Zînên hespên kurdan ku wekî bûkekê hatine xemilandin, xençerên zêrîn ên mîrên kurdan û **Kara Ben Nemsî** yê zerik û çavşîn fêrî kurdî bûye… Jixwe ew tê hawara kurdan, dixwaze lawê mîrê Amedîyê ku ji alîyê osmanîyan ve hatiye revandin, rizgar bike. Lê ew rastî mêvanperwerîya kurdan tê. Fîlm bi gotineke balkêş dest pê dike. Dema artêşa osmanî nêzî herêma kurdan dibe, serbazek ji wan wiha dibêje; *"Digotin Kurdistan hov e, lê heta niha tiştek nehate serê me."* Herwiha 'Kara Ben Nemsî' jî dema bi hespê xwe digêje çîyayên Kurdistanê wiha dibêje; *"Tî ax hingî vê xaka di bin piyê hespê min de, ne xwedî sir e."*

Fîlm di bin bandora klîşeyên *"sînemaya western"* de maye ku pîştî salên 1950yê li tevahîya cîhanê populer bû. Jixwe ji ber dengên tivingan, liv û tevgera kamerayê, ajotina hespan û dîyalogên leystikvanan mirov dibêje qey filmekî kowboyan e. Lê belê filmê me zêdetir ji *çanda "Italowestern"* ku salên di navbera 1960 û 1970yê dema wê ya zerîn bû, sûd wergirtiye. Jixwe *"Di Nav Kurdistana Hov re"* jî wekî gelek filmên 'Western' ên ewropî li Spanyayê hatiye kişandin. Lê belê mirov dibêje qey Kurdistan e. Çîya, deşt û zinarên wir pir dişibin yên Kurdistanê.

Ev fîlm ku produksîyona wê ji alîyê Almanya û Îspanya ve hate kirin di sala 2010ê de wekî DVD hate belav kirin. Lê belê fîlm cara yekemîn, di 28ê Îlona 1965ê de, li bajarê Almanyayê li Hannoverê hate nîşan dan. Roja dî rojnameyên herêmî bi van gotinan pesnê film dane; *"Di Nav Kurdistana Hov re'* yek ji rêzefilmên **Karl May** e. Lê belê aksîyona vî fîlmî ji yên dî zêdetir e û tijî mîzah e." (2) Ji hêleke din ve, hin bispor jî rexne li fîlm digirin û dibêjin; *"Romantîka filmên Karl May di vî filmî de tuneye"* (3)

Li gel van rexneyan jî film xwedî giringîyeke bêhempa ye. Fîlm, di arşîva sînemaya navneteweyî de yek ji kêm filman e ku gotina 'Kurdistan'ê tê de derbas dibe. Piçek be jî dîroka sedsala 19ê a Kurdistanê; zilma artêşa osmanîyan ka çawa herêmên kurdan dagîr kiriye, nîşanî temaşevanên xwe dike.

1 Chemnitzer Morgenpost, 8.12.2010
2 Hannoversche Rundschau, 29.09.2010
3 Michael Petzel, Filmpirtûkên Karl May, 1998

www.kurdistanskurdi.org

Pirtûkên fêrbûna zimanê kurdî û xebatên rêzimanî

JAN BADA

Ji bo fêrbûna ziman, pirtûkên fêrbûnê yên cûrbicûr û pirtûkên rêzimanê (gramerê) pêwîst in. Pirtûkên rêzimanê bi gelemperî û bi hûrbûna li ser hin beşên rêzimanê li gor zimanzanîyê li gor her zimanî cuda tên amade kirin, lê bingeha lêkolîn û hunandinê, metodên bikarhatî ji hev ne dûr in. Pirsa pirtûkên fêrbûnê hîn bêtir kûrbînî û amadekarîyeke perwerdeyî dixwaze. Ji alîyê perwerdeyê ne bi tenê ziman herwiha helwest jî derdikevin holê. Bi taybetî jî, ger li ser zimanekî metirsî hebe, helwesta siyasî, çandî, perwerdeyî û neteweyî xwe dide pêş. Pirtûkeke çawa? Fêrbûneke çawa?

Pirtûkên fêrbûna zimanekî hertim bi çanda wî zimanî û jîyana kesên bi wî zimanî dipeyivin ve girêdayî ne, nikarin ji edet û teqelîdên civaka wî zimanî bên cuda kirin. Perwerde xwedî du beşên girîng e: metod û naverok. Metodên perwerdeya zimanekî ji alîyê fêrbûna rêziman ûwd. wekhev in, lê ji alîyê çand û jîyana civakê cuda ne. Her ziman xwe bi çand û jîyana civaka xwe çêtir dide fêrkirinê, nikare ji wan bêpar perwerde û fêrbûneke zelal bixemilîne.

Gava em pirtûkên fêrbûn û zimanê kurdî yên di dîrokê de binirxînin, derdikeve holê ku di destê me de bi tenê Nûbara Ehmedê Xanî heye ku ji alîyê helwesta perwerdeyê ji alîyê kurdan hatiye nivîsandin. Pirtûkên ziman û hin jî yên fêrbûnê heta sedsala 19ê bi piranî ji alîyê kesên biyanî, kesên ji çand û jîyana kurdan dûr ve hatine nivîsandin; ev kes jî, di beşên xwe de zêde bispor nebûn. Hin ji wan mîsyoner û dîplomat û hin ji wan rêwîyên maceraperest bûn. Lê di nav wan de çend kesên zana û şareza yên mîna Justî, Mann, Minorsky jî hebûn.

Pirtûkên rêziman û hin beşên rêzimanê ji alîyê gelek nivîskarên kurd ve hatine nivîsandin û ev xebat hîn berdewam dike. Pirtûkên perwerdeya ziman û perwerdeyê bi gelemperî hîn gelek kêm in. Di van 15-20 salên dawî de hejmareke pirtûkên fêrbûna zimanê kurdî hatine çap kirin, lê hîn jî ji alîyê metodên perwerdeya fêrbûna ziman li gor çand û jîyana civakê û li gor temenê zarok û kesên fêr dibin, negihîştine zelalîya têrbûnê. Tecrûbeyên Swêdê û heta cîyekî tecrûbe û ceribandinên bajarên wek Bremen, Hannover û Dortmundê yên li ser dersdan û amadekarîya materyalên alîkar ji bo dibistana seretayî, hêjayê pesnê ne. Derfetên salên 80-90ê li Swêdê rê li ber hejmareke xebatên afirandêrîya materyalên perwerdeya dibistanê vekirine û ev yek ji bo zarokên wê derê bûne alîkarîya fêrbûna zimanê dayikê. Lê ev tecrûbe hîn ne li ser bingeha çand û jîyana civaka Kurdistanê ne, ji ber ku li welat zarok ne xwedîyên derfetên zarokên li Ewropayê ne û hîn nikarin ji wan materyalan sûd werbigirin.

Fêrbûna zimanê kurdî bi gelemperî ji alîyê berheman ve hîn di destpêkê de ye, lê rê vebûye, berhem tên amade kirin. Herçiqas li Kurdistanê bi rêya şaredarîyan hin xebatên nû tên amade kirin jî, rewşa siyaseta rojane hîn rê nade perwerdeya zimanê kurdî, ev yek jî xebat û berheman di çarçoveyeke teng û kesane de dihêle; nebûye xwedîyê coşa sazîyên domdar. Pirtûkên fêrbûna zimanê kurdî bi piranî wisa tên amade kirin ku bê mamoste nikarin bên fêhm kirin û mixabin ev pirtûk nikarin di sazî û dibistanên perwerdeyî de bên ceribandin daku hin nirxandin li ser bên kirin û bi rexneyan rê ji bo berhemên nû bên vekirin. Xebat û berhemên heyî hîn jî bi piranî bi derfetên kêm ên kesan tên amade kirin; ev kesên ku wek şowalyeyên çand û zimanê kurdî ne, rewşa ziman û berhemên fêrbûna zimanê kurdî gihîştandine vê rewşê û hîn çend kesên mâyî jî, karên xwe berdewam dikin, lê di rastîyê de ev êdî karê takekesane nîne, pêwîstî bi sazîyên beşane, komên xebatên kolektîv heye. Kurd êdî xwedî dewlet in, plansazîya amadekirina pirtûk û berhemên ziman, dikare ji alîyê sazîyên dewletî ve bê bi rê ve birin; ev rê li ber xebata kesan nagire, vedike.

Li tenişta plansazî û rêveberîya dewlet û sazîyên şaredarîyê, hin kurdên xwedîderfet dikarin pêşengîya însîyatifên sîvîl jî bikin: li her deverên cihanê dewlemend sponsorî dikin û weqif û sazîyên çandî, ji bo perwerde û gelek beşên jîyana rojane ava û fînanse dikin. Dewlemendên kurd jî dikarin berê xwe bidin sponsorîyeke parastina çand û zimanê kurdî daku hîn zêde berhemên bi rêkûpêktir derkevin.

Li başûrê Kurdistanê fakulteyên zanîngehê yên ziman û perwerdeyê hene, ew dikarin di vî warî de wezîfedar bin û alîkarîya wezareta çand û perwerdeyê bikin; hikumet dikare derfetan berfirehtir bike û bêtir girîngî bide otonomîya sazîyên zanyarîyê û hemû akademîsyen û mamosteyên kurd aktîv bike; her çar parçe û belavbûna kurdan li seranserê cîhanê dikare wek derfeteke xurtkirina berhemdarîyê bê dîtin û ev yek ber bi Kurdistanê ve biherike.

Hertişt heye: Organîze pêwîst e, organîzeyeke rast û herikandina berheman ber bi hemû kurdan ve; ev dê rê li ber berhemên nû, afirandêrîya xurt û pêşketinê veke.

Jîyan bi kurdî xweş e!

NAVEROK

KANÛN 2011

Hîmên îdeolojîk ên nîjadkujîya Dêrsimê
MEHMET BAYRAK ▶ R. 1

Piştî dagîrkirina neh salan DYA welatekî çawa li paş xwe dihêle?
BIRGIT CERHA ▶ R. 1

Cûntayên sîvîl
SERGE HALIMI ▶ R. 1

Îsmet Şerîf Wanlî…
HOŞENG SEBRÎ ▶ R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ ▶ R. 2

Erdheja jeopolîtîk li Rojhilatê Navîn
ALAIN GRESH ▶ R. 5

Yewnanistan wê ji alozîya îro çawa rizgar bibe?
NOËLLE BURGI ▶ R. 6

Li Lîbyayê di şer de kî bi ser ket?
PATRICK HAIMZADEH ▶ R. 7

Li ser kaşkaşoka krîza ewrûpî
FRÉDÉRIC LORDON ▶ R. 8

Ji Romayê heta Stenbolê, ji bo têgihîştina cîhanê, fikirîna li ser împaratorîyê
JANE BURBANK Û FREDERICK COOPER ▶ R. 10

Şer derbasî Kurdistanê dibe
MICHEL VERRIER ▶ R. 12

"Em mîrasgirên çar û sovyetan in"
NINA BACHKATOV ▶ R. 14

Serpêhatîyên ukraynî
ANDREÏ KOURKOV ▶ R. 16

Berlusconîzm, dewam yan dawî?
PIERRE MUSSO ▶ R. 17

Li Cocoyoc, Başûr temsîla ekolojî û yeksanîyê dikir
PHILIPPE BAQUE ▶ R. 18

Tezmînkirina karbonê, dara ku daristanekê vedişêre
ANNE VIGNA ▶ R. 19

Utopyaya ku ji alîyê Komunê ve hatiye fikirîn
CHRISTOPHE VOILLIOT ▶ R. 20

Xemxwarên jinparêzîye
MONA CHOLLET ▶ R. 21

Gelo liyaqet nirxeke rêşaşîyane ye?
ANGÉLIQUE DEL REY ▶ R. 21

Dengên demê
EDUARDO GALEANO ▶ R. 22

ÇAND Û HUNER ▶ R. 23

Forma Abonetiyê

Nav: Name

Navnîşan: Address

Koda Postayê: Postcode Bajar: City

Telefon:

E-Mail:

Abonetiya salane (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB